



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YAAMEDÊ

Kovara Dumehane
Hejmar - 24
Rêbendan - Reşemî 2009

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran:
Semra OZBEY

Editor:
Enise Şirin ÇAGER - Azad ZAL

Sererastkirin:
Semra OZBEY - Serwet DENİZ

Mizanpaj û Berg
Enstîtuya Kurdî yaAMEDÊ

Wêneyê Berga Pêşin:
Hûsamettin BAHÇE

Wêneyê Berga Paşin:
Ahmet Bilge

Şêwirmendê Hiqûqê:
Av. Muharrem Erbey

Çapxane:
Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan:
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR

Tlf:
(0412) 237 43 16

E-Mail:
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB:
www.kovaraw.com

Şertên Abonetiye:
Nava Welat, salek: 25 YTL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê:
Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52

Nimroya Hesabê PTT'ê:
Semra Ozbey - 5426215

■ *Nivîsên ku ji bo weşanê
ji kovarê re tên şandin,
li xwediyên wan nayên
vegerandin.*

■ *Her nivîskar ji nivîsa
xwe berpirsiyar e.*

NAVEROK

■ Ji Editor.....	2
■ Xwendineke cihê li ser “Ez ê yekî bikujim” / <i>Receb DILDAR</i>	3
■ Hingura Kardoxyayê / <i>Dilawer ZERAQ</i>	7
■ Mêvana min / <i>Reyhan SARHAN</i>	10
■ Çiroka çirokê / <i>Arjen ARI</i>	11
■ Kuçeçirok / <i>Ronî WAR</i>	13
■ Vê şevê / <i>Şêrko</i>	14
■ Pisikên bêderpî / <i>Ferzan ŞÊR</i>	15
■ Bila bîmîne / <i>Şengul UGUR</i>	17
■ Heke ez jî bêm kuştin / <i>Behlûl ZELAL</i>	19
■ Ji bo te / <i>Xelîl GUNÊŞ</i>	21
■ Go wesar bêro / <i>Nesrîn NAVDAR</i>	22
■ Bajar / <i>Rodî ZINAR</i>	23
■ Zîman û çarîn / <i>Murad DILDAR</i>	24
■ Bûka ducanî / <i>Selmet GULER</i>	25
■ Hespê esil / <i>Beşîr MELE</i>	26
■ Du kurteçirok: Neynik, Evîn / <i>Evdile KOÇER</i>	27
■ Xaniyê dilopkirî / <i>Şevger ÇIYA</i>	29
■ Rexneya wêjeyê / <i>Adar JIYAN</i>	31
■ Panela Mela Ehmedê Xasî / <i>Mahmûd NÊŞÎTE</i>	33
■ Derencam / <i>Bediuzzeman SEÎDÊ KURDÎ</i>	35
■ Ferhenga koçeriyê -II- / <i>Bahadîn ROBAR</i>	7

■ **Dosye:** Beşek ji me êzîdî û ola êzîdîtiyê / Husamettin Bahçe / 42

■ Guldesteyek helbest / <i>Mizgîn RONAK</i>	57
■ Tu (Bo dilê min) / <i>Omer DILSOZ</i>	59
■ Tu û ez / <i>Ayhan ERKMEN</i>	62
■ Derman tê ji xaka welat / <i>Sîpan XIZAN</i>	63
■ Gemiya jiyanê / <i>Abdulrahman Seyid Îsa</i>	64
■ Ezop (Aisopos) / <i>Amed Çeko JIYAN</i>	67
■ Êş / <i>Feratê DENGİZİ</i>	70
■ Hunermenda stran û nasnameya qedexê / <i>Aram GERNAS</i>	71
■ Dengbêjek û starnek: Evdilkerimê Şemo / <i>Hilmi AKYOL</i>	75
■ Pirtûkxane	77
■ Xêz / <i>Ahmet BİLGE</i>	80

Ji edîtor...

Xwendevanên hêja û delal,

Sala 2008'an qediya sala 2009'an hat. Em hêvîdar in ku bi saleke nû re hêvî û daxwazên gelê kurd jî geştir bibin...

Kovara W(e) jî bi destpêka sala nû re dîsa li pêşberê we ye. Lê bi çend rojan be jî bi derengî digihîje ber destê we. Ji ber vê derengmayînê em lêborîna xwe ji xwendevanên xwe dixwazin.

Dîsa jî ber ku dawîya salê hinek karên me zêde ketin ser hev û em tengijîn dosyeya ku me yê di vê hejmarê de amade bikira negihîşt û di şûna wê de me dosyeyeke li ber dest weşand. Lê xebatên me yên jî bo wê dosyeyê jî didomin. Em hêvîdar in ku em ê di hejmara 25'an de ji we re pêşkêş bikin.

Di vê hejmarê de dosyeya me li ser beşek ji civaka kurd êzîdî û ola êzîdîtiyê ye. Her çiqas beşeke girîng a civaka me bin jî bi awayekî giştî zêde nayên nasîn. Mîrov dikare bibêje çiqas nêz in ewqas jî dûr in. Lê divê ne wiha bûya. Me di vê dosyeya xwe de bi fotograf û kurtenivîsekê xwest vê beşa civaka xwe bi awayekî dokumenterî bi xwînerên xwe baştir bidin nasandin. Fotograf jî aliyê Hûsamettin Bahçe ve di encama xebateke bi qasî du salan de hatine kişandin û ev fotograf di sala 2008'an de li Amedê û çend cihên din wek pêşangeh hatine nîşandan.

Xwendevanên hêja,

Bi taybetî kovarên ku em ji aboneyên xwe yê girtîgehan re dişînin paşve tên. Em dixwazin di vê mijarê de aboneyên me şîyar bin û me agahdar bikin. Yê ku kovarên wan nagihîjin destê wan bila bi nameyan li rewşê bipirsin û yê ku navnîşana wan diguhere jî ji kerema xwe re bila navnîşana xwe ya nû ji me re ragihînin. Lewre li gor nameyên ku gihîştine destê me li hinek girtîgehan Kovara Wyê nadin aboneyan û ji aliyê lijneya perwerdehiyê ve tê qedexekirin.

Ji girtîgehan gelek name ji me re tên. Dem dest nade ku em van nameyan bibersivînin. Lê heta ku ji destê me tê em daxwaza wan bi cih tinin. Em spasî û silavên xwe yê jidil ji tevan re dişînin û em hêvîdar in wê li me biborin.

Heta hejmareke din bimînin di xweşî û şadiyê de....

Xwendineke cihê li ser “Ez ê yekî bikujim”

Receb DILDAR



“Ez ê yekî bikujim” navê romana Firat Cewerî ya nû ye. Piştî romana “Payiza dereng,” “Ez ê yekî bikujim” romana wî ya duyemîn e. Roman di sala 2008’an de ji aliyê Weşanxaneya Avestayê ve hatiye çapkirin. Roman ji du beşan pêk tê û bi tevayî 151 rûpel e.

Wek ku tê zanîn Firat Cewerî di Kovara Nûdemê de ji bo zimanê kurdî xebatên hêja kirine. Him bi xwe çîrokên dinivîse him jî wek xizmeteke mezin kitêba “Antolojiya çîrokên kurdî” amade kiriye.

Her çiqas navê romanê li kitêba xwe kiribe jî, kitêb ji du çîrokên dirêj pêk hatiye. Ev her du çîrok di kitêbê de wek du beşên cihê cî girtine û bi tayîkên xav bi hev ve hatine girêdan.

Di romanê de sê lehengên sereke hene: Lehengên ku “ji bo rizgariya miletekî rabûbûn” di cihokên cihê de diherikin. Yek jê dikeve hepsê, yek derdikeve çiya û yek jî direve Ewropayê. Rojekê destê sibê li bajarekî mezin rêyên hersiyan digihîjin hevdu.

Çîroka beşa yekê:

Çîroka beşa yekê bi devê Temo hatiye gotin. Temo, di maleke feqîr de mezin dibe. Ji ber ku aboriya malbatê ne baş e nikare bixwîne. Hesreta xwendinê pê re dimîne. Piştî ku digihîje şoreşgeran vê birçîbûna xwe têr

dike. Hîna di biçûkatîya xwe de lawikekî ecêb e. Xewnên wî rast derdikevin. Rojekê dibêje wê xalê min bimire. Xalê wî di gavê de dimire. Dîsa rojekê xewnekê dibîne û ji diya xwe re dibêje ez ê ji bo pazdeh salan têkevî hepsê. Ew jî rast derdikeve. Piştî pazdeh salan gava ji hepsê derdikeve, bûye yekî şîzofren û li keda xwe poşman bûye. Bûye dijminê bajar û însanên xwe.

Temo wilo difikire: “Ez pazdeh salan di nav çar dîwaran de razame. Dibe jî dizanin lê ji xwe re nakin xem. Min bikaribûya bajar bikuştî digel ku heta niha min gêrikek jî neêşandiye, min ê texsîr nekira. ... Neron ew mîrxasî kir, agir bi zîrecêba Romayê xist...” (rûpel-31)

Temo ji bo keç û jinan jî baş nafikire, dibêje “ez ji bo rizgariya warê wan pazdeh salan di hepsan de mame; nayên bi destên min nagirin, di ber dilê min nadin, dilên xwe naspêrin dilê min û laşên xwe yên bedew pêşkêşî min nakin.” (rûpel-32)

Temoyê di nav vê psîkolojiyê de ye, piştî ku li malê meheke wî diqede, di xewna xwe de dibîne ku yekî dîkuje. Ji bo yekî bikuje derdikeve nêçîrê. Di vê gerê de diçe pastaxaneyekê, li wir qehpîkekê nas dike. Ew û qehpîkê li hev dikin ku roja din li ciyekî din hevdu bibînin û rihet bipeyivin.

Ji bo festîvalê hevalekî Temo yê nivîskar hatiye bajarê wî û wê kitêba xwe îmze bike. Dixwaze biçe li wî guhdar bike. Bi rê de erebeyek li wî diqelibe û dimire.

Çîroka beşa duyem:

Çîroka beşa duyem bi devê nivîskar hatiye gotin.

Nivîskar ji Swedê hatiye. Ew ê li ser zimanê kurdî semînerekê pêşkêş bike. Gava ji bo semînerê ji otelê derdikeve, texsiya wan li merivekî dixê. Ew meriv Temo ye. Di nav destê Temoyê mirî de kaxizek heye. Di kaxiz de ji bo hevdiînekê navê cafeyekê û tarîx hatiye nivîsîn. Nivîskar diçe cafeyê, li wir wê qehpikê dibîne û qehpik çîroka xwe jê re dibêje.

Dîana (navê qehpikê ye) ji Almanyayê, ji bo welatê xwe rizgar bike tev li gerîlayan dibe. Êsîr dikeve. Yuzbaşî wê serbest berdide lê paşê dikeve destê korucuyan. Ew jî wê teslîmî qontrayan dikan. Kesên qontra “li vî bajarî” wê wek qehpik didin xebitandin. Dîana pêşiyê ji Temo, paşê jî ji nivîskar daxwaz dike ku wê ji vî rewşê rizgar bikin. Nivîskar ji bo Dîanayê rizgar bike dikeve nav hewldanan lê Temoyê ku miribû melûn dibe û tê keçikê dakuje.

Çend pirs:

- Dîana dibêje “min di warê siyasî û civakî de xwe baş gihand.” (rûpel-120) Nivîskar dibêje “Dîana pir zana û bîaqil bû.” (rûpel-106) Telefona wê ya destan heye. (Rûpel-79) Haya wê ji komeleya mafên mirovan heye. (rûpel-77) Sal 2004 e. Komele û şaredariya bajar di bin kontrola hevalên wê de ne. Dikare here li cafeyan bi saetan rûne lê vî keça “zana û bîaqil” nikare li texsiyekê siwar bibe û li deriyê komeleyekê yan partiyekê bixe û bibêje min jî vî rewşê rizgar bikin. Dîanaya ku “di warê siyasî û civakî de xwe baş gihandiye” jî ber ku di çavên wî de “dostaniyê dibîne” jî zilamekî ku ji bo bazde ser wê û paşê wê bikuje lava dike ku wê ji vî rewşê rizgar bike. El însaf!.. Tewş nivîsandin, lê ew qas?..

- “Dîana dibêje “hejmara ên wek min bi sedan in.” (rûpel-75) Gorayî romanê bi sedan

keçên gerîla bûne qehpik û li bajaran laşê xwe difiroşin. Îzahkirina vî hevokê gelek zehmet e. Hişê meriv ditevizîne. Nivîskar behsa welatekî xeyalî nake. Behsa Amed, Batman û Wanê dike. Pêşiyên me gotine “Di ziman de hestî tune ye.” Wilo xuya ye ku di qelemê de jî hestî nemaye.

- Gerîlayek esîr dikeve, dilê yuzbaşî pê dişewite û wê serbest berdide. Dêmek rewşa welat ji Ewrûpa wilo xuya dike? Ji bo cih û warên hevalên wê tespît bikin ew gerîla bi rojan belkî bi mehan di îşkenceyan re derbas dibe. Yuzbaşî bi serê xwe nikarin kesî berdin, paşê diya wan gadidin. Jixwe nivîskar ji bo dewletê du sembol afirandine: Yek yuzbaşî ye, dewleta fermî temsîl dike. Yek jî satilmîş e ku dewleta kûr (nepenî) temsîl dike. Gelo başkirina dewleta fermî ji hinek ciyan re mesajek e? Dibe ku mesajek ji bo xwendevanên tirk be jî. Çimkî romana pêşîn jî di demeke kin de ji bo tirkên hatibû çapkirin. Dibe ku xerabkirina hepsî û gerîla jî ji ber vî sebebê be. Kî dizane?

Sembol:

Di romanê de meriv dikare, her lehengekî/ê wek semboleke sîyasî bixwîne:

Temo: “Ji bo rizgariya vî bajarî” ketiye hepsê. Hepsîyan temsîl dike. Dîn bûye. Dixwaze bazde ser jinên “vî bajarî” û wek Neron bajar ji binî ve bişewitîne. Têk çûye.

Dîana: “Ji bo rizgariya vî welatî” derketiye çiya. Gerîla temsîl dike. Ketiyê, bûye qehpik. Têk çûye.

Nivîskar: Hevalê Temo ye, lê neketiye hepsê, reviyaye Swedê. Ewrûpayîyan temsîl dike. Li wir bûye nivîskar. Di rola rizgarkar de ye.

Yuzbaşî: Dewletê temsîl dike. Pirsgirêkên biçûk hebin jî dewlet baş e. Keçika gerîla esîr digire lê wê serbest berdide.

Satilmîş: Dewleta kûr temsîl dike. Yên ne baş ew in. Wî gerîlaya keç kiriye qehpik.

Cih:

Çîroka pêşîn li bajarekî dest pê dike û li wir

diqede ku nivîskar di romanê de her tim wî wek “vî bajarî,” bi nav dike. Nivîskar navê bajarên wek Batman û Wanê (rûpel-73) di romanê de derbas dike lê meriv nizane çima nivîskar navê wî “bajarê polîtîk”(rûpel-67) bilêv nake. Ku nivîskar gelek caran xwe spartiyê mezinahiya wî û li ser dikên wî qureti kiriye.

Meriv dikare ji naveroka kitêbê navê “vî bajarî” derxe. Çimkî li “vî bajarî” rojên edebiyatê hatine lidarxistin û du navdarên kurd beşdarî wê bûne. Temo li otêlê Celîlê Celîl û Îzeddîn Mistefa Resûl (rûpel-54-55) dibîne. Em dizanin ku rojên edebiyatê li Amedê tîne lidarxistin û her du nivîskarên navdar beşdarî 2’yemîn Rojên Edebiyatê ya Amedê bûbûn. Ya duduyan jî ev e ku nivîskar Temo û Mehdi Zana di hepisxaneyekê de dide razandin. Mehdi Zana li ser vê cografayê! li Amedê di zîndanê de mabû. Em ji van her du bûyeran fam dikin ku navê “vî bajarî” Amed e.

Çîroka beşa duyem jî li Almanyayê dest pê dike, li çiyayan didome û li Amedê bi dawî dibe.

Dem:

Dîsa em ji rojên edebiyatê ya duyemîn derdixin ku dema ku çîrok bi dawî dibe sala 2004’an, hefteya pêşîn a meha dozdehê ye. Çimkî rojên edebiyatê di nav 30’ê meha çirriya paşîn (yazdemîn) û 6’ê meha kanûna pêşîn (dozdemîn) de tîne lidarxistin.

Di sala 2004’an de Temo 42 salî ye. (*Digel çilûdusaliya xwe...* rûpel-28) Gava em pazdeh salên hepsê (*Heke em pazdeh salên girtîgehê jî wek demeke nexweş...* rûpel-18) jî 42’yê derxin, demek Temo di 27 saliya xwe de ketiye hepsê. Dîsa em ji

sala 2004’an 15 salên hepsê derxin, demek Temo di sala 1989’an de ketiye hepsê.

Şaşiyên teknîkî:

- Temo mehek e ji hepsê derketiye. Tu heval û dostên wî li “vî bajarî” tune ne. Ew û diya xwe bi serê xwe dijîn. Gora Temo dibêje haya nivîskar jî jê tune ye. Lê meriv nizane ku Temoyê ku tim li malê bi dermanan ji xwe ve diçû, çawa dibe ku haya wî ji hatina nivîskar çêdibe û dibêje: “*Bi maqulên bajêr re rûdinê, bi serokê belediyê re araqê vedixwe û ji wan re behsa edebiyatê dike.*” Temoyê ku bi tenê carekê, ew jî ji bo wî bibin nexweşxaneyê ji malê derketiye çawa bi hezaran kitêb dane ser hev? Belkî jî Temo ew di xewna xwe de dîtine?

- “*Berî ku bêm girtin porê min reş û riya min tune bû. Niha ... min riha xwe jî li ser çenê berdaye.*” Wek li jor jî me eşkere kir berî ku Temo bê girtin 27 salî ye, îcar çawa riya wî tune ye meriv nizane!...

- “*Piştî salekê, gava Leyla hat serdana Mehdi Zana, wê ji Mehdi Zana re got û Mehdi Zana jî ew xebera reş gihand min.*” Temo di sala 2004’an de ji hepsê derdikeve, li jor li ser meseleya rojên edebiyatê me ev hesibandibû. Gorayî 2004’an Temo di sala 1989’an de hatiye girtin. Îcar yekî ku di vê salê de ketibe hepsa Amedê wê tu carî Mehdi Zana li wir nebîne, çimkî salek berê Mehdi Zana sirgûnî Eskişehirê bûbû. Gava nivîskar behsa kesayetiyeke dîrokî kir, divê çîroka wî rast binivîse. Mafê wî tune ye ku Mehdi Zanayê di hepisxaneya Eskişehirê de ye li Amedê nîşan bide.

- “*...dixor jê re got ku min derbên mezin ji serê xwe xwarine, loma divê ew min rakin Enqerê û li wir filmê serê min ê*



magnetî bigirin.” Ji berî bûyerê bi kêmanî 15 sal berê filmên serî yê magnetî li Amedê jî dihatin girtin, kes jî bo vê filmê nedîçû Enqerê. Gava meriv bi çavên oryantalîstan li bajarekî binêre xeletiyên wilo biçûk! derdikevin holê.

- *“Digel ku havîn li ber xelasbûnê ye û êdî bêhna payîzê tê jî, dîsa dinya germ e.”* (rûpel-36) Li jor jî me dema rojên edebiyatê eşkere kiribû. Di nav dema ku nivîskar dibêje û dema rojên edebiyatê de tam demsalek heye. Çimkî Temo di rojên edebiyatê de derdikeve derve, di wê demê de jî payîz diqede û zivistan dest pê dike. Ji ber ku nivîskar mesele cidî negirtiye, bi rehetî dikare di ser demsalan re gav bavêje.

- *“Loma diya min, nanê sominî û kêra nên...”* Bi tevayî xelkê Amedê nanê sominî naxwîn, ew nanê vekirî yê tenik dixwîn. Nanê sominî mamûrên tirk û dibe ku kesên jî welatê derve tên dixwîn. Ev jî nenasiya bajarekî ye.

Ziman:

Firat Cewerî yek ji wan nivîskaran e ku serdestê kurmanciyê ye û ziman xweş bi kar tîne. Zimanê romanê, sade û rewan e. Kesên ku jî bo nexwînê dibêjin “zimanê aqademîk” bi rihetî dikarin Firat Cewerî bixwînin. Di warê gramerê de jî girêdana hevokên wî xurt xuya dike.

Bi tenê ez dixwazim li ser peyvekê bisekinim. Firat Cewerî jî bo cîgerciyên Amedê peyva *“kezebîroş”* (rûpel-40) bi kar aniye. Wilo xuya ye nivîskar ev peyv çêkiriye lê şûna peyva cîgercî nagire. Qertafa *“cî”* ne kurdî be jî di hinek peyvan de cih girtiye û bi tevayî tê bikaranîn. Wek qahwecî û henekçî (rûpel-90) ku peyva henekçî nivîskar bi xwe jî bi kar aniye. Bi ya min divê em peyva cîgercî jî bi rihetî bi kar bînin.

Encam:

Encam ew e ku di romanê de qehpekirina keça kurd bi Firat Cewerî dest pê nekiriye.

Nivîskarên tirk ên şovenîst û nivîskarên kurd ên ku xwestine xwe bi tirkan bidin qebûlkirin ev mijar nivîsîne. Ez ê navê çend romanên destnîşan bikim ku nivîskaran di van romanên de keça kurd li hember eskerên tirk çawa xistine bin lingan an kirine qehpik.

Mükerem Kamil Su, di romana bi navê *“Qewraş”* (Besleme) de ku roman di dema Serhildana Agiriyê de derbas dibe, keçeke kurd dike qewraş û bi dû eskerekî tirk dixê. (Müslüm Yücel-Türk Sinemasında Kürtler-Agora yayınları-2008)

Halide Edip Adıvar, di romana bi navê *“Kurê Zeyno”* (Zeynonun oğlu) de ku roman li Diyarbekirê derbas dibe, keçeke kurd diavêje nav tabûra eskeran. Esker wê wek *“xoxa kurd”* (kürt şeftalisi) bi nav dikin û henekên xwe bi keçên kurd dikin. (Müslüm Yücel-Türk Sinemasında Kürtler-Agora yayınları-2008)

Esat Mahmut Karakurt, di romana xwe ya bi navê *“Keça ku çiyayan diparêze”* (Dağları bekleyen kız) de ku roman di dema serhildana Dêrsimê de derbas dibe, şervana bi navê Zeynep bi dû sûbayekî tirk dixê û keç dev ji daw û doza xwe berdide. (Müslüm Yücel-Türk Sinemasında Kürtler-Agora yayınları-2008)

Mehmed Uzun jî wek Esat Mahmut Karakurt dike û di romana xwe ya bi navê *“Ronî mîna evînê tarî mîna mirinê”* de Kevoka gerîla bi dû sûbayekî tirk dixê û di vê rêzê de cihê xwe digire.

Em mêze dikin ku Firat Cewerî jî daye ser şopa wan û mesajan dide tirkan. Cewerî keçeke kurd avêtiye ber lingên sûbayên tirk û wê dike qehpik. Hem jî ne yeka bi tenê, bi sedan. Gelo jî bo nivîskarekî kurd xwe bi tirkan bide qebûlkirin rêyeke din tune ye? Ma rê di qehpik-kirina keçên kurd re derbas dibe? Çima bi taybetî ev mijar? Xwendevanên tirk li bendî te ne. Rêya te vekirî be Firat Cewerî!

Hingura Kardox- yayê

Dilawer ZERAQ

*"Û tu Yasîn, tu ji ku derê yî?"
"Ji Zexê, ji bajarekî hingurê"*

Romana ku di destê me de ye, yekem romana Şener Özmen a bi navê "Rojnivîska Spinoza" ye.* Şener Özmen, ligel ku ber û berhemên xwe di qada şewekariyê de dide jî, berdari û afirîneriya xwe bi vê qadê bi sinor nake û her wiha di qada 'hunera aktuel û wê-jeyê' de jî didomîne.

Min divê ez bêjim ku, gava ez pirtûka yekemîn a nivîskarekê/î hildidim dest, piçek be jî gumaneke pozîtîf di min de çêdibe. Lê piştî xwendin û qulibandina rûpelan ev guman an rengêkî negatîf digire yan jî pozîtîfiya wê ji gumanê xelas dibe. Ev roman jî her wisan. Piştî ku min li dû hev çend rûpel ji vê romanê quliband, ev gumana hanê zû ji serê min fûriya û çû. Ji ber vê yekê ez dikarim bêjim ku Rojnivîska Spinoza ji romana yekem bêhtir wek romana ku dê bibe berdewamiya destpêk û yekemînên dîtir ji xuya dike...

Çawan ku Baruch Spinoza ji bo çareserkirina kêşeyên felsefeyê, rê û rêbazên geometriyê, yanê bi navê xwe yî din, 'zimanê gerdûnê' sepandiye, ligel vê yekê jî têkiliyeke taybet bi ramana pirsyarker û hişê analîtîk re daniye û serê xwe li ser geometriya jiyana û xwezayê êşandiye, Şener Özmen jî, tevn û zimanê romana xwe bi heman şêwe û rê û rêbazê ava kiriye û em bi navê romanê neheyirandine...

Ger em piçekî bala xwe bidin taybetiya geometriyê em ê karibin bibêjin; ji du niqteyên hevşîp (hevêl, hevber) rastekek pêk tê, lê ji sê niqteyên nehevşîp jî sêkuj (sêgoşe) û ji



gelek niqteyên nehevşîp jî gelek şêwe û dirûv pêk tên. Her wiha pê re jî gelek tebeqeyên li-dûhev û liserhev ava dibin. Rojnivîska Spinoza jî, bi temamî bi ziman û tevneke bi vê geometriyê hatiye avakirin û wekî mijara serreke xwezaya Kardoxya û mirovên Kardox-yayê tîne zimên û ji vegotina wê zêdetir, hewl dide ku mijara ku hildaye dest watedartir bike.

Her wekî ku Stendhal jî ji bo romanê dibêje, "Tekane sedema heyîbûna romanê ew e ku tim hewlê dide ku nûneriya jiyana bike." Rojnivîska Spinoza, beş û qismên jiyana Kardoxiya a ku bûye çend parçe, -ji layê erdnîgariyê ve, ji layê zimên ve, ji layê polîtîk ve, ji layê desthilatdarî û birêvebirinê ve, ji layê biyanîbûna çandan ve û têkiliya bi endam û elementên van çandan re û wekî tevahîbûna van aliyan hemûyan, ji layê biyanîbûna hundirîn ve-, hildide dest û hewlê dide ku hê bêhtir darî çavan bike û perdeya nixumandinê ji ser rake û şelobûnê zelaltir bike. Ma ne ji ber vê yekê ye ku Schellinger jî dide dû Stendhal û wiha lê zêde dike, "roman, guncantirîn rê ye ji bo şayesandina jiyana modern."

Der heqê vê yekê de Roland Barthes bi bîra me dixîne û dibêje, "Hejmara astên ku tê pê-

şniyazkirin çî dibe bila bibe û ev ast çawan tên pênasekirin bila bên kirin, bêguman vegotin gehînekdarkirina astan e. Fêmkirina ji vegotînekê ne tenê şopandina jihev-veçirîna çîrokekê ye, di heman demê de, dîtina hebûna tebeqeyên vegotinê ye; û bi awayekî nixumandî teyisandina lêkdanên berwarî ya li tewere û koordînateke tîkane ye ku di xeta vegotinê de hene."**

Her wisan, vegotina romana Rojnivîska Spinoza, li ser bingeha gehînekdarkirina ast û sewiyeyên jiyane ava bûye û gava em hewlê didin ku pûş û nixama vegotinê ji ser rakîn û ligel jihev-veçirandina romanê têkevin nav tebeqeyên jiyana di romanê de, rastî van tebeqe û rasteqîniyên ku hatine bisîmgekîrin tên (*ne rastî û rasteqîniya jiyana heyî, lê belê rasteqîniya romanê ya hundirîn*).

Roman li gorî rasteqîniya hundirîn a romanê bi gelek hêman û elementan hatiye avakirin: Yasîne lehenge romanê; ku di navbera gelek Xelîl û Celîlan de diçe û tê û nizane ka kîjan dêrê yan jî mizgeftê hîlbijêre û lehengiya wî bi liv û tevgerên lehenge dîtir tê aşkerakirin û ew ji aliyekî ve jî û bi awayekî nixumandî dibe nelehenge (antihero) û gelek tiştên der heqê wî de guhnedêriya wî dinimîn. Peymana ku mêbûna xwe ya "jirêze" nade bi "jirêzederbûna" jinên dîtir û her wiha bêtî ku xwe bike endameke femînîstiya li gorî sisteman hatî îdeolojîzekirin, mêbûna xwe diparêze. Nûrşena dilketiya Yasîn ku di nav evîna xwe û xwe de maye. Helbesta ku jiyana wê bi likumandinê ava bûye. Silêmanê ku bi awayekî dijminane li hember çekdaran dixebite û dareke dîtir li darê kurman zêde dike. Mamoste Mûsayê ku ligel her tiştî bi karê welatparêziyê dadikeve. Balaya keça Azerî ku di nav behra evîna Simko û qehpîtiyê de hînî meleva-niyeke bêhempa bûye. Yil-mazê çepgir û sosyalîst ku ji xelkê Ergenekonên Enedoluyê ye û

dikare ji bo qîzekê jî hevraman û mutefîkê xwe (şoreşgerê kurd) bide dest (*helbet ne ji bo evîne*). Simkoyê ku ligel ku di evîniyê de tîk çûye jî, berevaniya bilindtîrkirina doza welatparêziyê dike, lê mixabin di evîngehê de dimire. Mamoste Semra ya dilketiya Yasîn a beriya Nûrşenê ku ji bo watedarkirina vegerê derdikeve pêş me. Firazê sertirûmbel, hevalê zarokatiya Yasîn ku ji bo ku em di kana jiyana Yasîn bigihîjin em pê diçin dema zarokatiya wî. Tûtiya pisîka Yasîn, celeb û nîşaneyêke dîtir a pevbêstî û ligelheviyê.

Her wiha du hêmanên din jî hene ku ji derveyî rasteqîniya romanê ne (Yek: *Ziraat Bankası ku navenda desthilatdariya aborî ya Bakur e, ya din jî Özdemiş İnce ku wek şairekî sembolîk e ji bo navenda neteweperestîya îdeolojîk a ku li ser bakuriyan tê meşandin*) ku qalkirina wan, ne wekî camid û bireserên vegotina romanê ye, lê ew bi hebûna xwe bi awayekî sembolîk awayê li dijî sekinîn û meşandina rêbaza sistêmê bi me didin hisandin.

M. Butor, ji bo ku bandor û jihev cudatiya rastî û raste-qîniya romanê û jiyana heyî bi me bide zanîn, dibêje, "Cîhana romanê, tîgihîştina me ya cîhana rastiyê pir karîger, no û kûr dike."***

Ji ber vê yekê ye ku Şener Özmen di romana Rojî-nîvîska Spinozayê de ji hewl-dayîna nivîsandina romana rasteqîniyê bêtir, lê xe-bitîye ku romaneke raste-qîn ava bike û di vê yekê de bi ser jî ketiye. Cîhana romanê ku di ser rasteqîniya heyî re hatiye afirandin, dibe alîkar ku em di sernixamtinê bigihîjin, di navbera tebeqeyên romanê de çûnûhatekê bikin da ku karibin jihevveçirîneke durîst pêk bînin.

Her wiha, em di ser şanîdana rewş û dirûvê mala Mamoste Mûsa re ku ji qîrêjê diçe, hay ji rade û dereceya pelosiyê dibin ku hê



Mûsa hay jê nîn e (an jî ji bo ku ji ramana welatparêziyê dûr nekeve û karê ku dike bi şûn de nekeve, girîngî pê nade). Helbet divê em li vê derê ji qirêj û gemarê jî wêdetir, ber û bala xwe bidin J. Kristeva ku dibêje, "... ji hêleke din ve jî, sedem û binyada pelosiyê bi zayendî, têkiliya bi zayendî û herikana ji ber wê ve vebestandî ye..."****

Û zimanê ku bi vê pelosiyê re tê bikaranîn; zimanê argo ye ku zimanê heyî ji hundir de dewlemendtir dike. Gava Mûsa çayê çêdike, qedehan tije dike û ji Yasîn re dibêje, "Lêborînê divê hevalê Yasîn, nizamim bê kevçî bi ku de çûne!" û Yasîn lê vedigerîne û dibêjiyê, "Heke mesele kevçî bin, hêsan e. Em ê bi kîrê xwe tevbidin!" (rûp:70), li vir ji ber ku kevçî tune ye (*kevçî: dirêj û tûj û alava tevdana şilaviyê. Dirêjî, tûjî û şilaviyên mezeloqî, sê sîmgeyên pelosiya zayendiyê*), zimanê argo wek serhildanekê digihîje hawara zimanê romanê û bersiva Yasîn careke din jî dibe sedem ku em bi zistî û pelosiya di jiyane de heyî, bînin ber çavan.

Romana Rojnivîska Spinoza, bi dayîna parçeyên ji tevahiya jiyana parçewesle û tevlihevbûyî (ango hatî tevlihevkirin) ya Kardoxiyan, dest pê dike; puxteyên hemû parçeyan di serî de tînin dayîn û bi pêdeçûna di romanê de jî, ligel ku têkiliyeke jidûrîheviyê pêkhatî di navbera wan de tê danîn jî, her parçe di hundirê xwe de tê firehkirin. Û ger ku em karibin bêjin postmodernî piçek jî lêkdan û lêkbûna parçeyên tîkelreng ku dûrî hev in û di heman demê de jî ew parçe dikarin tevahiyeke taybet di hundirê xwe de bihewînin pêk tê ye, romana Rojnivîska Spinoza gaweke wê di qada postmoderniyê de ye.

Ji ber ku hem ji aliyê şûn û mekanê, hem ji aliyê kesên ku wek parçeyekî romanê di romanê de bi cih bûne û hem jî ji aliyê zimên ve ku bi rengînî tînin bikaranîn (wek devokên cuda cuda yên kurdî, zimanê tirkî, azerîkî, elmanî), parçeyên rasteqîniya jiyane -helbet her yek di nav heqîqetên xwe de- hatine lêkdan.

Her wiha gava em ji awirekî dîtir ve bala xwe didin, ji aliyê şûn û mekanê ve jî veguhastineke muhayîle û hêza nîgaşkirinê heye di romanê de. Şûn mekan, (Zex, Zox, Da, Xo,

Deşa Kûr û Kardoxya), tenê ne şûn û mekan in, li gorî vegotina romanê û li gorî têkiliyên bi hev re yên endam û hêmanên ku di van şûn û mekanan de qala wan tê kirin, li hev tînin veguhastin. Her wiha tevahiya ji parçeyan pêkhatî di hundirê xwe de aloziyeke arizî xwe jî ava dike û ji bo ku em karibin di kêşeya esasî bigihîjin -her wekî R. Barthes jî gotî: Ji bo ku xwendina (an jî guhdarîkirina) vegotinekê bikin-, ne ku em ji peyvekê derbasî peyva din bibin, lê divê em ji astekê derbasî asta dîtir bibin.

Zimanê Rojnivîska Spinoza sert e (lê ne tûj e) û gava hewce kiriye nivîskêr xwe ji gotinên argoyî (yên wekî, jina tolik, qûnek û qûnhez...) nedaye alî û hin çêr û sixêfên ku hatine bikaranîn jî di hundirê romanê de hewiyane û awa û şeweyê vegotina romanê jî bi xweşîkî ew qebûl kirine.

Her wiha, em bi çend hevokên diyarker fêhmî dikin ku (wekî mînak: "Heke partî wan biqefêle dê wan tune bike", "jixwe karker jî avê li wan venaxwin"...) helwesta romanê helwesteke neteweyî ye; lê ji ber ku fikr û ramana nivîskêr di hundirê çanda xweser de modernîze bûye û ew retorîka kevneşopiyê bi kar nayîne, xwe bi dem û çaxên destpêkî û avakirina qada neteweyî ve girê nedaye, xwe ji rengê vegotina bi wî cureyî dûr hiştiye û neketiye nav kemîn û xetereya wê ya dîlkêş.

Romana Rojnivîska Spinoza romaneke politîk e. Û bi awa û şeweyekî postmodern, bi zimanekî fesîh û pircure, me dixê nav 'hingura Kardoxyayê' û em pê hay ji şêlobûn û tîkelrengiya jiyana Kardoxiyan dibin.

* Rojnivîska Spinoza, roman, Şener Özmen, Weşanên LîS, 2008, Amed

**Nivîs û şîrove, Roland Barthes, weşanên Metis.

*** Roman û Netew, Haşim Ahmedzade, Weşanên Pêrî.

**** Hêzên Tirsê, (Ceribandineke li ser pelosiyê) Julia Kristeva, Weşanên Ayrıntı.

Mêvana min

Reyhan SARHAN

Îşev tu mêvana min î, bi kilam û helbestên bêrîkirinê.

Bi pêlên bîranînan.

Bi xwendina pirtûkan.

Bi temaşekirina film û wêneyan.

Tu bi vana yek bi yek dibî mêvana min a rûmête...

De ka bêje ez kîjan kilamê û ji dengê kîjan hozanî diyarî dilê te bikim? Ji bo ku ez pir nebim deyndarê te dixwazim ku bi van diyariyan ez bidim ber dilê te û barê li ser milê xwe yê ku te ji bo min hişt sivik bikim. Ez ê arşîva hunermend û dengbêjan li nava hev bixim û kilamên ku te ji wan pir hes dikir yek bi yek bikim diyarî û ji dilê te yê piçûk û fikra te ya mezin re bişînim...

Mêvana dilê min a ji min nêziktir.

Bila îşev bibe şahiya bîranînên me. Em ê li ber wan dîlokan bibin serxweşên dîn! Û heta ku em karibin em ê şerbeta tiriyê reş vexwin! Li ber wê jî em ê bi hev re ji dengê xwe, bi hestên hevaltiyeke bê mînak, ji hunermêndên ku me ji stranên wan û dengê wan pir hes dikir bistrên... Di malên xwe yên piçûk de û bi dilên xwe yên zelal û mezin... Bila cîran jî bîr tevî civata me bibin û em çend heb jî ji bo wan bikin diyarî...

Ji stêrk û hîva çardehşevî...

Ji doz û baweriyên xwe yên şoresgerî...

Ji bo hêviyên xwe yên bihurî û yên ku bîr re em bibêjin kilama 'Merdana Min'. Çi straneke ku di tûrê bîranînên me de hebe em ê bi hev re wek koma qoroyê li ser dikê bi dengê bilind bistrên... Tevî kewan û tembûr û heta bi erbanê em ê li ber wan jî bo xew û şeva xwe bistrên mêvana min...

Mêvana min, gelo tu yê careke din di kîjan demsal û çaxa salê de bêtî?

Tu yê bi berfê re an jî bi baranê re bêtî?

Bila demsal di ser me re derbas nebin?


Ji bo hatinê careke din dereng nemîne, mêvana min a rûmête?

Hunermenda xewn û xeyalên min, careke din zû bêtî!?

Piştî hepsîtiya şeş heft rojan û pîrsa Mûsa Enter a di rêwitiyeke trêne de mişt gilî û gazinc 'ma tu jî lawo?' min biryar da ku telaqê 'Tirkiya' têxime dest û ta ebed wê berdim.

Çîroka çîrokê

Arjen ARÎ



Lê... Berdan, ne ev çend hêsan bû! Ketibû sala 13'an ku min û 'Tirkiya' serî datanî ser balgehekê.

Di van salên dûdirêj de hema bêje ez ji mîna çêlkewê ku tu di hembêza xwe de xwedî bikî, hînî pêsîrên wê bûbûm.

Hînbûyîn li hêlekê; her ku diçû, li xwe hay dibûm ku 'Tirkiya' min dişibîne 'peyrewên' xwe. Di kêlikên ku ditengijîm û bi derbekê re jê sil dibûm de 'Tirkiya' hemû helbestên bi zimanê xwe; ji Nalî bigire heta bigihê Ahmed Arîfê ku em dîkin ê xwe... yek bi yek dianîn bîra min û digot, 'ez li piştî te me, lawik... de ka birîna xwe bi zimanê min bilêvîne'

'Tirkiya' ji min bêhtir zanibû ku ji ku dera xwe birîndar im: Ez ê sêwîkê zimanekî ne dê û ne bav, li ber destê wê fêrî derbirîna dilê xwe bûbûm. Jixwe carinan mîna zindiyê li dû miriyan mayî ku min di ber xwe de dibiland û dînihurand, ew bû 'Tirkiya' ranedibû ser du tiliyan û li camcamkan nedida!

Lê min ê ew berda!

Soxî; di berêvareke ku leşkerên bi zimanê wê diaxivîn ez dam ber hurmizk û pehînan û

dev û bivêla min di gevzika xwînê de dan; ji ber têlên sînor ji texma Kanîkan tela tela, bi mirûzekî tîrş vegeyriyam malê...

Wê kêliyê pîrçîniya ku bi 'Tirkiya' ket û got, 'ooooxxx xweeş', kir ku telaqê wê têxim mistê!

Berdan ew berdan!

Piştî ku min sê kevîr xistin destan, her roj û her kêlî, 'Tirkiya'; Tirkiya telaqreş û berdayî bi zarê xwe yê henûn û xweş li dora min çû û hat û xwest 'mahrê' nû bike bi min re!

Di her çûn û hatinê de li kêleka min rûdinişt, destê xwe diavêt ser milê min, piştî min miz dida û digot, 'ehmeq, tu bi zimanê min lêdanê bixwî jî ez 'Tirkîka' te me... Binêr, bê min çiqasî bêriya te kiriye!

Ma min bêriya wê nedikir?

Lê çawa?!

Emma... Ji ber ku dîne min ê şedîd û hedîd weke hin ol û mezhebine din 'dujinîti' pesend nedikir, ez jî piştî 'Tirkiya' bi vê 'Kurdiya' porgijik û serî bi spî û bi rişk re mam!

Çîroka du serîyan

Pêşîyan gotine, ‘Du serî ne weke hev bin, naçin ser balgehekê’.

Sêrê min î ku hînî ber serê ‘Tirkiya’ bûbû, li ber yê ‘Kurdiya’ şûn nedigirt: diqilqilî û hema dikir firtefirt!

Kîjan danê rojê bûya, sihar êvar ferq nedikir; kurmê ‘Tirkiya’, yê ji yê cixareyê xerabtir, di ruhê min de, di her niquta xwîna min de... Welhasil di hemû şanên laşê min de digeriya.

Tew... Gava ku min radihişt qelemê û qelem ku çav li kaxiza çîmspî diket; hemû bêjeyên zarê ‘Tirkiya’ mîna zîpîka biharî bi ser min de dibariyan!

Di kêlîkên wisa de min jî radihişt serê xwe, di nav Baxçeyê Nafido re, ev co ye ev sermişar, di ber Xana Xelîlê Xançî re berwar û berwar, derdiketim ser rêya ku ji seriyekî ta seriyê din navçe dikir du tîş!

Di rojêke wisa de li wê navçeya weke zewaca min û ‘Kurdiya’, ku bi darê zorê me xwe xist stû û em li peravên wê bûn qereçî; serê min di ber min de rûyê ‘Tirkiya’ li ber çavên min, li texma Camiya Şêx Selman berî azana esrê bi hilmekê serê min û yê birayê ‘Kurdiya’ Seyidxanê Enter li hev ket.

Bi dû ku azan qediya, me hal û ehwal û zarok û eyal dane ber xwe û me berê xwe da Qehweya Ezîzê Kermêtî!

Ezîzo bi hatina me re, çaya ‘tewşan qanî’* bi me ve zeliqand û li halê me pirsî:

—Xortê kurdan, hûn naxuyên, lo!

Seyidxan, zanibû ku Ezîzo tinazê xwe bi

me dike. Bi vê pêjnê, bi nêrîneke di bin çavan re, ji serê tiliyan heta peleka guh bejna Ezîzo pîva û got, ‘Ezîzo... Karê me pîvana sûkan e, ne rûniştina li qehweya te’!

Ezîzo jî, mîna ku bixwaze tinazên xwe bidomîne, sifreya eynelî di nava her du destên xwe de bir û anî û weke ku li teplikê bide belîşî strana, ‘hey lê de hey lê, waweylê keçê hey lê’!

Bi rastî jî çaya vî Ezîzoyî ‘tewşan qanî’ bû.

Sorahiya binikên ferfûrî fecreke din didin bejna qedehên Diyarbekirî!

Lê ne bi tu, Seyidxan li min warqilî ku xulqê min teng bûye. Hima wisa bi diloanî got, ‘te xêr e... kê tu aciz kiriye?’

Piştî ku min qurta çayê daqurtand, min got, ‘ez ê çilo aciz nebim Seyidxan! Ez û vê ‘Kurdiya’ ji zimanê hev fam nakin, heyran’!

Seyidxan, mîna ku zanibe derdê min çî ye bişirî û got, tu li aciziya vî mêze, lo... kuro ew Q ye, ev Ê ye, ev X ye, ev jî W ye... tiştêkî din?’

Piştî vê sohbetê, ez bi ser zarê ‘Kurdiya’ vebûm.

Seyidxan, bi qasî min Xwedê ji te razî be!

26/07/08/Amed

* Sorê girtî.

I

Ez bala xwe didimê.... dibînim ku kuçeyek ber bi zarokaniya te ve diçe.

Kuçeçîrok

Ronî WAR

Wext ji wextan, ji wî wextê ku zarokaniya te beravêti bûbû û...

Di destê vê sibehê de, li vî bajarê biçûk zarokek di wê kuçeyê de ketiye rê û ber bi derekê ve dihere. Li her du hêlên kuçeyê xaniyên yekqat û serobin ku kêfa mirov ji xwe re tînin rêz bûne.

Destê vê sibê jin rabûne ber deriyên xwe avreşandî kirine û dimalin.

Vê sibeha havînê xaniyên kerpîç tevî erda tî ji destên jinên jêhatî avê vedixwin.

Xuya ye vî zarokê ku daye ser rê û di wê kuçeyê re dimeşe ji bo nîfqeyê xwe li gund çûye liqatê û wa ye niha jî tatliyan difiroşe. Piştî kêlîkekê vî zarokê ku temsîka wî ya tatliyan li ser serê wî ye tevî xeyalên xwe dimeşe, bang dike û dihere.

Ev zarok dirûvê te didê!..

II

Êvar e. Xortek ji rêyeke dûr hatiye û berê xwe daye kuçeyekê. Vî xortê ku ji xerîbiyê vegeyîyaye di kuçeya ku ber bi zarokaniya te ve dihere de dixwaze xortaniya te bilîze.

Êvarek payizê ye. Tarî ketiye erdê. Bayekî şil xwe li dîwaran radikişîne û li belika guhê wan dikeve. Kes li derve tune ye. Ji xeynî



kûçikan tu evdê Xwedê ne xuya ye. Kirasekî ku tirs jê dinizile li bejna vî bajarî kirine. Xof jê dikeve dilê wî xortê ku dixwaze ruh têkeve xortaniya te!

Zaroktî û xortanî li hev nakin!

Dûrî hev ketine!

Bajarê wan jî li hev nakin, li hevdu û mahneyan in. Hema bibêje xaniyên kerpîç nemane û apartmanên pîrقات dewsa wan dagirtine.

Li kuçeyan xortanî rastî zarokaniyê hatiye. Zarokê ku Teksas û Tomîks dixwend bûye xortekî ku rojname, kovar û pirtûkan dixwîne. Xortê ku ji karê giran vegeyîyaye hatiye bajarê zarokaniya xwe li zarokê tatliyan difroşe rast tê!

Ev zarok û ev xort her du jî dirûvê te didinê!

III

Kuçeya ku ew xort tê re dibihure piştî qonaxekê tê li deriyê kuçeyekê der dibe û ber bi zarokaniyakê ve diherike. Demsal, dem û dewran şolî ne. Lê di hest û hêviyên zarokaniyê de wextek dibeze. Piştî mij û aviya bi şev ketiye zarok kuvarkan berhev dike..

Li dora hewşokê ku pez tê de mexel dikirin

û didotin li behra kuvarkan rast tê. Li rojavayî gund li tenîştê çem xwe daye ser tahtên qîş. Kêfa wî li cih e.

Gund wenda dibe. Her der dibe erdê pembo û wî zarokî dîsa kuvark berhev kiriye û ber bi konê xwe ve tê. Îcar li ser pembo ne. Li xerîbiyê ne. Êvar e. Bav mêvan e. Nuh ji gundê xwe daye rê hatiye nav van konên karkeran.

Qismetê wî ew aniye vir?

Mirinê ew ber bi xwe ve kişandiye?

Bêrîkirinê ew pekandiye?

Zarok ne di ferqa van pirsan yekê de ye.

Şad e. Çimkî kuvark daye hev û şîvek ji nav lepên felekê revandiye!

Şev e.

Bi dengê vereşandina dê û bavê xwe bi xwe dihesê!

Bi nalîna xwehê çeng dibe ser xwe!

Xerîbî ye!

Xizanî û nezanî ye!

Zarok li gund e. Çavên wî li rê ye. Tiştin qewimîne. Toz ji rêya gund hiltê. Piştî texsiyan sê dolmîşên ku tabût li ser hatine şidandin tî û li ber mizgeftê disekinin.

Zarok destê xwe dide dolmîşê...

Bi dengê qorneya dolmîşê re destên xwe dide ber xwe. Şîfêr bi zorê ji ser diguherîne. Şîfêr dadikeve û xwe lê radikişîne lê kesên ku li derdorê ne nahêlin ku şîfêr xwe bigihîne wî. Ev bûyer di devê kuçeyekê de yan di dawiya kuçeyekê de diqewime nema dizane û lingên wî xwe li kuçeyekê ku xwe ji xortaniya wî ve ber bi navoseretiya wî ve radikişîne, dilezîne û dimeşe.

Hergî ji kuçeyekê direve li yeka din diqewime...

Ez û malbata xwe em tev li Kurdistanê di-

Wê şevê...

Şêrko

Wê şevê,
Wê şeva wek helbestan
Wê şêwra wek îbadetan
Li wê xana wek ziyaretan
Wenda bûm
Li nav pêlên deryayên
çavên te
Tu bû
Bêhna kulîlkên bihara bi-
huşta emrê min
Rengê keskesora asîmanê
dilê min
Wê şevê
Bêhna berfê dihat ji porê te
Tehma biharê di her pey-
vek te
Germa havînê li ser lêvên
te
Û
Wê pela weşiyayî
Ji nav payîza guliyên te
Her çar demsalan
Bi veşartokê dilîst
Li ser zimanê te
Wê şevê
Diricîfî dilê min
Li ber bişîrînên her du
çavên te...

10.12.08

Pisîkên bêderpî

Ferzan ŞÊR

jiyan. Bavê min, bavê bavê wî tev li wir... Em jî wekî piraniya kurdan bi êlitiyê (êşîrtî) li herema wan bi cih bûbûn. Êşîra pisîkan. Dîsa şer kuştin para kurdan ketibû, dişewitandin. Digotin Şêx bi rê ketiye ber bi Diyarbekirê ve diçe. Her diçû dema şoreşê nêzîktir dibû, her wiha zilma roma reş jî zêdetir dibû.

Sê roj berê ez li ber mala Şîro bûm, li ber derî. Deriyê ku her tim xwarin ji bo me dirijandin erdê, yê ku min û malbata xwe me li wir zik û çavên xwe têr dikir. Ev çend sal e em bi hev re wekî malbatekê ne; mala Şîro û em. Ew roj ji her rojê cihêtir tiştek li wê malê qewimî. Zarezara jinan, çûnûhatina zarokan, av germkirin filan û bêvan... Belê ew roj kurek ji zikê Şîro çavê xwe li serhildanê vekir. Belkî dê xwarina me kêmtir bibûya lê em jî bi hatina wî zarokî ku navê wî vêga nayê bîra min kêfxweş bûn.

Em li gundê Hergemo bûn. Gund bihuşteke ji perçeheyvê bû, lê me digot qey em di dojhê de ne. Şer bû, mirin, kuştin, tade û zilm dibariya li ser kurdan. Mirovên ku tevlî serhildanê dibûn zar û zêçên xwe li gund dihiştin û diçûn hawara Şêx. Leşkerên romî dihatin zar û zêç tevde kom dikirin û dibirin îşkenceyan. Her cureyê îşkenceyê bi wan dikirin. Lê di van rojan de hinek tade li me jî dikirin. Leşker dihatin gund û pisîkên gund didan hev. Dibirin qareqolan, em dixistin nav

derpiyên jinan... Kêm caran jin sax digirtin. Digotin bi sedan jinên kurd ji bo ku nekevin destê romiyan xwe davêjin hembêza çeman. Di nav avan de, bi hesreta aveke ji destê mêrên xwe, dixeniqîn. Lorîn yek ji van kesan bû ku cendekê wê li ser hespê anîbûn gund. Laşê wê tev bi herî bû lê nûreke Xwedayî jê diçû. Porê wê zerê şimayî, dirêj û pêl bi pêlî bû. Cendekê wê li ser piştê hespê, porê wê li pey hespê di erdê ve dikişiya. Destên wê hinekirî, lêvên wê werimîbûn. Lê dîsa jî delalî jê difûriya. Spî, spehî û paqij bû.

Piştî hatina cendekên binavmayî leşkeran dîsa xwe avêtibûn gund. Îro jî wan ez girtim wekî xwediye xaniyê me Şîro. Şîro bi zarok bû, zarokê wê di destê wê de em dane riya Diyarbekirê. Di rê de zilma ku li me dikirin ne kêmtî zilma li ermeniyan kiribûn bû. Ya rast divê ez xwe nexim navê, ji ber ku ez bixwe jî darê zilmê bûm, her çiqas wan bi zorê bi min didan kirin jî... Em davêtin nav derpiyan, derpiyên kebanîyan, kebanîyên ku her roj nan û xwarin didan me, me dikir qijînî û dixwest ku ji qulekê derkevin. Carna navranên wan birîndar dikirin da ku tehma xwînê were û em êrîş bikin xwînê. Diviyabû ku ez bireviyama, min bi xwedîya xwe Şîro û hevalên wê re xayîntî nekir. Lê ez ê ji nav qefeseke hesinî ya zengargirtî çawa bireviyama. Nedibû. Li ber çavê min bi qemçîyan li piştê jin, zarok û pîran dixistin, çi cihêti nedixistin navê. Çawa lê bihata.

Di rê de em gihîştin qereqoleke mezin. Qereqol li kêleka palekî bû. Ji bo bînvadanê diviyabû wê şevê li wir bimana. Serleşkerek li ber derî bû. Ew tev jimartin yeko yeko derbasî hundir kirin. Deh jin bûn, yek ji wan Şîro. Şîro di rêza sêyemîn de bû. Ji rêza yekemîn dest pê kirin. Jinek, bi her du destên wê bi dîwar ve girêdan. Derpiyê wê jî her du devdelîngan ve girêdan. Dişibiya çarmixa Îsa Mesîh. Çarmix ne çarmixa Îsa bû, lê zilma ku bi jinîka reben kirin ne kêmtî ya Îsa bû. Piştî destên wê girêdan jê pirsîn:

-Kocan nerde?*

-Bersiv neda. Mêrê wê tevlî şoreşa Şêx bûbû. Gihîştibûn ber Diyarbekirê, her diçû

hejmara wan zêde dibû. Jinikê rojên berê û sûtetê mêrê xwe anî ber çavên xwe. Ji dil xwe ve got mêrê wê û hevalbendê Şêx dê niha werin têkevin qerekolê û wê rizgar bikin. Her roj zarokên xwe bi hêviya rizgarkirina vê axê dilorand. Her şev, her şiv û her kêliyê bi bîr xist. Lê dengêkî jahîrî qîriya:

-Sana kocan nereda diyorum? Bu kediye görüyor musun? Sen bilirsin... **

Got û pisîk berdan nav derpiyê wê. Qarewara jinika reben û qîjewîja pisîkê tevli hev dibûn. Jinik wekî mirîşkan diperpitî. Pisîk wekî dûpişka nav xeleka agir li dora xwe diçû û dihat. Dûre sekinî. Devê pisîkê, pencika wê, çîp û ranê jinikê tev di xwîndê de mabûn. Jinik ji ser hişê xwe çû. Dema qîzîniya wê hat bîra wê. Cara yekem bi destê mêrê xwe girtibû. Ji xemla xwe ya spî xwe rizgar kiribû û xwe radeştî mêrê xwe kiribû. Destên xwe yê şermoke hêdî hêdî li ser piştê mêrê xwe dilebitand. Mêrê wê jî li ser singa wê hêdî hêdî bi nava jinikê ve diçû. Na ne jinik lê hingê qîzeke nûgihîştî bû. Her diçû jana di nav her du çîpan de zêde dibû. Cara ewil mêrê wê ew bixwîn xistibû. Her tişt dihat bîra wê. Her û her bi hawara xwe navê mêrê xwe digot. Dûre kete xeweke giran, wekî wê şeva zavatiyê; mêrê wê porê wê di nav tiliyên xwe de rast dikir, lorînan li guhê wê dida, ew wekî zarokan dida raketin.

Ew îşkence tev li ber jinên din çêbûn. Hawar û gazî bi tevan ketibû. Hinek ji wan li xenceran digeriyan da ku serê xwe li ber wan jê kin. Hinekan ji wan serê xwe li dîwaran didan, mêjiyên xwe li ber wan dirijandin.

Dor hatibû rêza duyemîn. Jinika di rêza duyemîn de nema ji cihê xwe radibû. Qîreqîr dikir. Bang û hawar ji mezinan, şêx, alim û pêxemberan dikir. Lê tu kes -bi gotinên wan zaliman xweda jî nikaribû ew xilas bikirandihat alîkariyê. Çawa bi du destên jinikê girtin, anîn ber "çarmixa Îsa" jinik ji ser hişê xwe çû. Jinik ji xewa zilmê rakirin, bi çarmixê ve kirin û bi heman awayî îşkence pê kirin.

Di her îškeceyê de, di her kêliyê de çavê Şîro li derî bû. Ne xwe dihetikand, ne jî qare-

war dikir. Li ber fersenda revê bû. Diviyabû here, ji destê romiyan bifilite. Muxtarê gund jî hatibû. Ew jî berdestiyê roma reş bû. Şîro lê nihêrî ku acizbûnek li ser rûyê muxtar tê xwendin. Ji rewşa ku tê de ye aciz e. Dibû ku jina wî jî li wir bûya. An dota wî... Şîroyê çav lê şikand da ku derî nîv-vekirî bihêle. Dema dor hat Şîroyê, ew ji cih rabû xemla xwe rast kir, terhiya xwe ya spî ya ku mêrê wê jê re ji bajêr anîbû li kurê xwe pêça. Porê xwe vekir û hêdî hêdî nêzikê çarmixê bû. Serbaz û leşkerên wir mat mabûn, jineke kurd ji halê xwe razî, bêtî zordarî hatibû ber çarmixê. Her kes bêdeng bû. Dikir biaxeve. Her kes li benda axaftina Şîroyê bû. Lê deng nekir tu tişt negot. Ji nişka ve bi kurê xwe girt, zarokê sê çar rojî li ser rûyê serleşkar da û reviya. Çawa ku xwe li derî da reviya leşker ketin pey şopa wê. Şev giran bû, ji şerma dinyayê heyvê rûyê xwe girtibû. Loma ji reva Şîroyê re alîkarek peyda bû. Şîro reviya di vê kêliyê de qereqol li hev ket her kesî da dû. Di vê bêkeysîyê de leşker piyê xwe li qefesê da û qefes vebû. Êdî ez jî ji îşkencekirinê xilas bûm. Min da pey şopa Şîroyê, bêhna wê hê jî li pozê min bû. Bêhna xwîdana wê dihat. Min xwe ji palê hevraz kir. Ez gihîştîm. Min ew di binê dahlê de girt. Ji palê ketibû, gindirîbû heta xwarê. Piştê xwe dabû tehtekî biçûk. Difikirî xwe bi xwe qal dikir. Tiştin digotin min jê fehm nedikir. Carna digot fatê bazde, ka bigihîje min, hinek leztir fatê fatê, fatêêê neçe. Carna jî bi darên nav dahlê re diaxifiya digot; mêro, mêrê dilê min pepûka serê te, ka tu li ku mayî. Te ez bi tenê hiştîm û tu çûyî. Min bêhndana te ya laşê min, di awirên xwe de vedijand lê tu tune bûyî. Wa ye tu hatî, ez qurbana te bim. Gelo te Şêx dît, canê min. Canê min, canê min, canêêê... hiş di serê wê de nemabû.

Roj hildihat, tav hêdî hêdî ji xewê radibû. Şev dikete xewê, tarî direviya ji tirêjan. Çavê min li berzika Şîroyê ket. Sor bû. Soreke hişkbûyî, reşkokî. Ez nêzikê wê bûm, min ew bêhn kir. Belê xwîn bû, xwîna wê. Xuya bû ku dema ji palê gindirîbû jêrê xwe birîndar kiribû. Gelek xwîn jê çûbû. Bi nêzikbûna min re, piyên min girt û ez hembêz kirim. Wê ez xistîm pêşîra xwe. Bi min re diaxivî, destê xwe li

ser mûyên min digerland, ez dipelandim.
Digot: Lawê min, delalîkê dilê min. Ka bavo.
De were kurê min megirî. Tu birçî bûyî digirî,
ka were pêşîra dayika xwe, ez te têr bikim ji
hesreta bavê te were. Wiha diaxivî. Dîsa ez ji
sing û zikê min zêft kirim û ez bi pêşîra xwe
de kişandim. Memikên xwe yên sergewez
derxist û xist devê min. "Vexwe kurê min, şîrê
diya te li te xwîn be vexwe, li te helal e" got û
dest bi lorandina straneke xemgîn a ku çiya û
lat dihelandin kir.

*"Wî de loy loy loylooy loylooy loy loy de loy-
loy.....de loloy loy Mihemedo hevalo
Wî de dayê bejna Mihemedê min nîşana serê
çiyân
Bejna delalê min nîşana serê çiyân
Wî de agir bikeve mala van romîyan
Derbeke li bejna Mihemedê min dane van ho-
viyan
De loy loy.... loy loy..... Mihemedo hevalo
Ax de loy loy.... gula cimatanoy loy loy
Destmala destê xortano loylooy.. de kelemê çavê
dijminano...
Wî de yadê diyara çiyayê Qerejdaxê bişewite
bi kevîr e
Wey xebardana xebere dibêjin eskerê Romê rêç
û dirbên Mihemedê min digire
Û em ê xebere bidin Diyarbekir û Siwêreka
xopan
Bira heyf û tola Mihamedê me bigire de loy-
loy... Mihemedo cano
Ax de loylooy... gula cimat...."
Got û dengê wê têr nekir. Serê wê bi ser serê
min ve ket. Lê hêj jî dengê wê li ser zinaran
bû. Çing dida, deng dida. Zinar jî ser zinaran
diketin, ewr û birûsk bi bergeha mirinê li hev
dikirin. Şîro bêdeng, erd û ezman di şîna wê
de man.*

16.06.2008, Batman

* Mêrê te li ku ye.

** Ji te re dibêjim mêrê te li ku ye. Tu vê pisîkê
dibînî? Tu zanî...

Bila bimîne

Şengul Ugur

Welat heyê

Wekî her şibakeyê bendawer

Û baran hene ên ji axê re biyan

Û kolan gav bi gav goristan

Çawa tê gotin nizam!

Xurexura tavên wînda hene

Di hebanên me de

Di destê me de kulên awirên me

Ma piyên xwas di zewiyên simbilên şil
bidim gelo?

Û keziyên xwe berdim li ber bayê?

Ku biçirînim tepê singa xwe ji hawaran re

Ku maçî bikim Mem û Zînê ji kêlên wan

Û xatiran bixwazim ji Bêko

Ji mîrên botan...

Helbet helbest e ev

Dê dil bimîne gotin

Li min negire a dilê min

Belkî rojekê ku zîl dan bihar

Ku xuşîyan çem û robar

Û hilat roja nû..!

26/10/2008

Nisêbîn



Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê



1- Ji Zargotina Kurdî ÇÎROKÊN GELÊRÎ

Rêza Zargotinê: 1
Berhevkirin: H. Akyol - Rojîn Zarg
Çapa Yekemîn: Kewçêr 2004
182 Rûpel

3- Hunera Axaftina Xweş û Nivîsandina Rind

Lêkolîn: 1
Nivîskar: Ayhan Meretowar
Çapa Yekemîn: Tîrmeh 2005
256 Rûpel

5- Ferheng

Ferheng: 1
Mustafa GAZÎ
Çapa Yekemîn: Tîrmeh 2006
Rûpel: 168

7- CÎNAV Di Zimanê Kurdî De

Rêziman: 2
Deham EBDULFETTAH
Çapa Duyemîn: Kewçêr 2006 -
Amed
96 Rûpel

9- Çîrokên Mala Zalê

Zargotin: 3
Berhevkar Hîlmî AKYOL
Çapa Yekemîn Sermawez 2006
144 Rûpel

11- Mewlîdî Dimilî (Zazakî)

Wêjeya Klasîk: 1
Osman Esad Efendî Muftiyê
Suregê
Çapa Yekemîn: Pûşper 2007
93 Rûpel

2- Ji Zargotina Kurdî PÊKENOKÊN KURDÎ

Rêza Zargotinê: 2
Brh: H. Akyol - Rojîn Zarg
Çapa Yekemîn: Kewçêr 2004
131 Rûpel

4- Mîr Bedirxan

Dîrok: 1
Wergerandin: Dr. Fadîl
BEDIRXANOGLU
Çapa Yekemîn: Tîrmeh 2006
96 Rûpel

6- NAV Di Zimanê Kurdî De

Rêziman: 1
Deham EBDULFETTAH
Çapa Duyemîn: Kewçêr 2006 -
Amed
128 Rûpel

8- Dastana GILGAMÊŞ



Mîtolojî: 1
Dastana Gilgamêş
Amadekirin: Deham
EBDULFETTAH
Çapa Duyemîn: Kewçêr 2006
128 Rûpel

10- Ji Dengbêj Fadîlê Kufragî Destanên Kurdî

Zargotin: 5
Hogîr BERBÎR
Çapa Yekemîn: Avrêl 2007
272 Rûpel

12- Kulîlkên Baxê Botan

Portre: 1
Abdulkadîr Bîngol
Çapa Yekem: Gulan 2008
300 Rûpel



Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê

EDUBBA
Sosyal Bilim Bilgi İletişim Merkezi
Basın Yayın Reklamcılık
Eğitim Sanayi ve Ticaret Limited Şirketi

Navnîşan:
Huzurevleri Mah. 63. Sokak No: 32 Kat: 4
Kayapınar / Dİ YARSAKIN
Tlf/Fax: (0412) 237 43 16
e-mail: enstituamed@hotmail.com

Her çiğas ku nivê meha payîza pêşîn bû ji
hîna gelek kes li serê banan radîketin. Ji meha

Heke ez jî bêm kuştin

Behlûl ZELAL

biharê ya dawîn, heta bi dawiya vê meha payîzî hewayaya vî bajarî germ bû. Lê ji ber bûyerên xedar ku piranî li vî bajarî û li hinek bajarên din ku ev serê salekê, du salan e dest pê kirine; dê û bavan nedihîştin zarokên wan bi şevê li serê banan rakevin. Mirin bi şev û rojê digeriya li nav kolan û taxên bajêr. Bi rojê, ro li nîv ro, di nîvê kolana herî mezin de, destên bidamançe pirî caran ji paş ve dirêji serê kurebavan dibûn, req req req!....

Diya Îsmet li ser bêm ji zû ve bi xew ve çûbû. Weke her carê cihê wî dernexistibû derve. Lê dema dît ku diya wî di xew re çûye, çû nivîna xwe anî li cem a diya xwe û birê xwe yê çardeh salî danî. Ligel ku bêxew bû ji çavên wî nedîçûn ser hev. Roj derbas nedibû ku mirovek nehata kuştin. Mirin ew qasî hêsa bû, ew qasî erzan bû li vî bajarî. Heval, xizm, nas, yek bi yek dihatin kuştin. Bi hevalên xwe re, bi kesên ji wan mezintir re, li her derê û her gavê nîqaşa çareseriyê dikirin. Lê mirin û kuştin ew qasî bi lez diherikîn kesî nikaribû pêşiya vê karesatê bigirta.

Biryara çûna ji vî bajarî ne bi dilê wî bû. Derketina ji vî bajarî weke xiniyê didît. Ji şeveqê heta ku roj diçû ava, nola sîxurekî li her dera bajêr digeriya. Damancêya xwe carna di paşila xwe de û carna di nav kîsên birinc, savar û nîskên dikanên nas de vedişart. Û bi

her kesî re diaxivî ku her tim û li her derê li xwe miqate bin. Digot, destvala dernekevin, tenê neçin cihekî. Bila agahiya kesên dora we hebe ji her tevger û karê we. Ku hûn mîna kîvroşkekê şiyar û mîna gurekî wêrek bin, ew zû bi zû bi ser we de nayên. Na na ev bêbav dê qira me bînin. Dê warê me li me bikin doje. Lê wî çiqasî li ber xwe dabû. Reco û Sîno qanih nekiribû ji bo mana li bajarê xwe. Her duyan gotibû; "Em her sê ji aşkera bûne. Wê me her sêyan jî bikujin nola ku mirîşkekê serjêkin. Êdî li vî bajarî kuştin bi qasî vexwarina piyalek av, hesanî û xweş e ji bo wan. Çavsor û zalim bûne yek. Her derfet li ber destê wan e û heta tu bêji bes, bihêz in. Êdî bi min, bi te û bi yê din çareserî ne pêkan e. Ji bo vê yekê tiştêkî din, hêzeke birêkûpêk divê. Ne pir, heta salekê, du salan em ji vir biçin, bê ka wê rewş çawa biguhere. Paşê dîsa em dikarin werin. Hatî hêsan e. Em neçin, em ê di avê de biçin. Em herin, belkî fêdeyeke me bigihê hinan."

Îsmet, derengî şevê diya xwe ji xewê şiyar kir, "Dayê, dibe ku ez şiyar nebim. Dema tu ji bo limêjê şiyar bûyî, min jî şiyar bike."

Diya wî çavlixew, bû imima wê, negot herê û negot na. Nîvexewî tiştin digotin, lê nedihatî têgihîştin. Îsmet xwesteka xwe bi dengêkî bilindtir ji diya xwe re dubare kir.

"Dayê, dayê, tu şiyar î, dengê min tê te? Mêze ke bi limêjê re tu min şiyar kî ha."

Vê carê dayik şiyar bûbû. Ma teqeteqa dengê çekên ku bi şev û rojê diteqîn, tîrsa di dilan de dihişt ku kes bi dilê xwe rakeve li vî bajarî. Pêşiyê çavên xwe bitirs vekirin. Paşê dît ku li serê bêm e û bédengiyê her der wergirtiye û yê li nik jî kurê wê Îsmet e, hate ser hişê xwe.

"Çima lawo? Ma gurên çiyayê vî welatî bi yek carê mirine, qey tu yê rabî limêjê?"

Îsmet nedixwest axaftinê dirêj bike û sedema zûrabûnê ji diya xwe re bibêje. Ev çend roj bûn ku her roja wan bi pevçûnê derbas dibû. Diya wî digot, "rojê berî roja din ji vê derê here. Here bajarên dûr. Hema tu rojê heqê nanê xwe derxîni jî bes e. Ez tu tiştî ji te naxwazim. Nesîbê min kurêkê biçûk li

Xwedê ye. Tu here, here ...” Heta hemû amadekariyên xwe biqedandana hê nû dê ji diya xwe re bigota ku wî, Sîno û Reco karek li bajarekî mezin dîtine û dê di demeke nêzik de biçin ser wî karî.

“Dayê tu zanî ku ez limêj nakim, tu wisan yariyên xwe bi min dikî. Lê tu zanibî ku min bizaniya wê fêda limêja ku ez bikim li te bibe, min ê rojê ne pênc caran, min ê rojê pêncî caran limêj bikira.”

Bi nîqaşên mîna ku her roj bêrawest dikirin di xew re çûn. Kesî nizanibû bê kê peyva dawîn got û çî got.

Diya wî berî ku destmêjê bigirê kurê xwe şiyar kir. Îsmet çavlixew lê bi tevgerên lezgînî ji nav lihêfê rabû. Piştî ku dest û riwê xwe şûştin, qutikê xwe yê nevekirî ku hevalekî wî dabûyê ji dolabê derxist zûka utî kir. Hîna qutikê xwe li xwe nekiribû, diya wî bi riwekî xemgîn û bi laşekî lerizî kete hundir:

“Li min qirikê, li min pepûkê, şevê din kekê Qasim kuştine. Qasimê xîzan, Qasimê reben û perîşan. Xwediyê komê kuflet. Ev xelk wê çî bike ji destê van kafiran, van bêbav û bêwîcdanan?!!!”

Ji nişkê ve utiya di destê Îsmetî de ket erdê. Li devê dêrî pantorê xwe bi xwe ve kişand û bi lez berê xwe da mala Apê Qasim ku ev zêdeyî bîst salan e cîranê wan bû. Deriyê xênî yê derve girtî bû. Berê xwe da goristana taxê. Tirb hatibû kolan, bi xemgînî û bêtî ku dengê ji kesî were ji xeynî giriyan xweh, keç û hevsera wî, Apê Qasim di gora kolayî de bi cih dikirin. Hat li ser gorê rawestiya, dilê wî dikeliya. Di zarokatiya xwe de, gelek caran Apê Qasim qewsik, xefikên çivîkan, pêlistokên ji têt û qabloyê ji wî û hevalên wî re çekiribûn. Ligel cîrantiyeke camêrane, piştî mirina bavê wî, Apê Qasim gelek carên ku diviyabû bavîtî jî ji wî û xweh û birayê wî re kiribû. Hemû rabirdû, nola filmekî di ber çavan re hat û çû. Her tişt weke xewnekê bû. Di wê kêliya ku tirba Apê Qasim girtibûn û ser tîrbê rast kiribûn û Îsmet bi hestîne ku ne dikarî bigirî û ne dikarî bi axive, kevirên biçûçankî li ser tîrbê rêz dikirin, ji kesên ku bi

wî re kevir rêz dikirin re, bi dengêkî nizim û tije keser, tenê ev peyv gotin:

“Heke ez jî bêm kuştin,”

Devê wî ziwa bû. Kelegirî bû. Peyv di devê wî de ma asê. Ji nû ve xwest hevoka xwe sergihayî bike.

“Heke ez jî van rojan mirim, ji kerema we, gora min jî li vir, li cem gora Apê Qasim bikolin.”

Deng ji tu kesî nehat. Koma mirovan ên ku bi tevgerên dilbitirs diliviyên zûka belav bû. Her kes çû mala xwe. Çend kalemêr û pîrejin, bi milê hevsera wî, xweh û keça wî girtin û ber bi mala wan ve çûn. Îsmet, tavilê li saetê nihêrî û bi lez berê xwe da nav sûkê, cihê ku duh wî û Reco civan dabûn hev. Dê Reco biçûya Amedê. Dê têteliya xwe bi karsaziya pirtûkfiroşiyê bibiriya ku ev serê çend salan e her du di vê karsaziyê de dixebitîn û Îsmet berî bi çend mehan dev ji vî karî berdabû. Hevalê wan Sîno jî bêkar bû. Piştî ku Reco ji Amedê vegeriya dê di nava du sê rojan de her sê heval biçûna bajarê mezin bi hev re di karekî de dixebitîna.

Li serê kolanê tûşî bavê Sîno bû. Bavê Sîno got, “vê şevê çî karê te heye li vir Îsmet? Tu ji her kesî re dibêjî tenê negerin lê di vê kêliya ku kolan ji mirovan xalî ne, bi tena serê xwe digirî.”

Îsmet tavilê got:

“Apê Helîm, Reco dê biçê Amedê. Ez ê wî bi rê kim. Duh bi zorê min ew qanih kir ku bi tena serê xwe neçe termîna Amedê. Min gotiyê ku divê ez bi te re werim.”

De zûka wî bi rê ke û here Sîno şiyar ke, ew pir hez ji xewê dike. Da berî ku hûn biçin bexçeyê me bikolin.”

Apê Helîm ber bi dikana xwe ya saetan ve çû. Îsmet û Reco li dehma Keleha Zembîlfiroş gihan hev. Ku di her axaftin û nîqaşên bi hevalên xwe re, Îsmet digot, divê mirovên warê Zembîlfiroş jî nola wî rast û bi xîret bin. Na na çî wateya mirovahiyê heye. Bi gavên lezê ber bi termîna Amedê ve çûn. Hîna Apê Helîm derabeyên dikana xwe vedikirin,

dengê teqînekê hat. Teq teq! Tenê du caran. Deng ji nêzîk ve hatibû. Apê Helîm di cî de sekinî, tavi lê derabeya ku vekiribû bêrawestan anî xwarê û berê xwe da riya ku diçû termîna Amedê.

Her du hevalên ku berî bi kêliyê, li rex hev bi rê ve diçûn; di dawiya tirimbêleke zer de, li nik hev dirêj kirî, bêliv, ber bi Amedê ve diçûn. Îsmet, te digot ji her kesî xeyîdiye. Dîsa tu kesî bi gotina wî nekiriye û wî jî bi xeyd berê xwe ji her kesî guhertiye. Reco, car caran hewl dida ku dest û lingê xwe yê çepê bilîvîne lê bêtaqet mabû.

Reco, sê rojan li ber xwe da. Roja çaran çavê xwe vekirin. Hişê wî tevîhev bûbû. Dest û lingê rastê nola dest û lingê bûka baranê ku dema baran nedibari, Apê Qasim ji wan re ji hejîk û cilên kevn çêdikir û mal bi mal digerandin, bêcan bû. Savar, birinc, helaw, penêr û xwarinên din ku berhev dikirin dibirin Keleha Zembîlfiros, li wir dixwarin.

Pişti sê mehan, devê Reco liviya û hin peyv

ji devê wî derdiketin. Peyva pêşîn ku ji devê wî filitî; 'Îsmet' bû. Lê hemû hevalan gotina xwe kiribûne yek, Sîno tavi lê got:

"Îsmet em xapandin Reco, got, hûn herin ez nikarim bêm bajarên mezin. Hewya min li wan deran nayê. Ê ew çû Reco, min kir û nekir wî bi ya min nekir."

Nola ku bipirse, 'Îsmet çû ku derê?' Lê Sîno xwe ji her tiştî re amade kiribû:

"Ew çû cem hevalên me yên ku tev çûn. Reşat, Serdar, Serkan, Merwan, Farqîn..."

Riwê wî rê nedida ku bi tiqeti bikene, hêla rastê yê laşê wî bi ya wî nedikir. Bişirîneke jidil li ser riwê wî belav dibû lê çavên wî dibiriqîn û heta hêz di wan de hebû dikenîyan...

11.12.2008-Amed

Go wesar bêro

Ji bo te

Xelîl GUNEŞ

Rûbarekî dîn im di nava dilê te de
Dilopek xwîn im di hêstirên çavên te de
Ji bo evîna te qîrîneke bê kes û bê deng im
Li ser zimanê te yê serfiraz
Ji te bêhtir tu kes nikare fêr bike
Sêwî-tiya min

Gulan 2001

Nesrîn NAVDAR

Hewa cemednaye bi!
Tute di camê helmin û şiktî de
xeyalê xun xêznayne...
Hetê teberî ra lembay kuçî
vare esteran yarê çim şiknayne.
Destêke ya destê bay yade bi hergav,
destê bînî de balone bî yewreyan,
yan zî çiqolate xêznayne.
Teberde vewre sipeye,
aşme nîmecete kerebnayne.
Tûte waştêne destê bay xun ê bînîde
poşetê nanî bixêzno...
Hameyne cay şiktî de xeyalê ya visyayne!
Û di cay visnahîde
gîşte ya wa barîkeke
biryayne!
Zerede sobayke şiktî
hêviye dekerdişî...
Day tûte bi tane lornahîşê xun
bebikê zerey bêşinge kerdêne hana.
û bermayne...
Gîşte tûte birnahî şîne fekê ya,
hesrê ya cemed girê dayne
û
zege xişike
heb bi hebe
gunayne zere yaro
dicnayne!
Hewa cemednaye bi teberde,
zere serdin!
Dûrde bi bay tûte
halê îne nêvînayne...
tûte qice bî,
xeyalê ya pîlî!
Go bay min bêro vatêne!
Go wesar bêro kê ma zî...
Kam zano belkî zî nîzd bi aw roc
Îne zî bexçey jiyanê xun de
gul û darî bidîne.

10/12/2008

Ez vî bajarî nas dikim; zikakên wî, bedenên wî, kevnaretiya wî... Tu tişt mîna zikakên vî bajarî hişê min ji serê min nabe. Dema ku ez li vî bajarî digirim, mîna ku ez li erdeke pîroz

Bajar

Rodî ZINAR

digerim û her ku ez gavekê davêjim û bi gavê re her ku dihere gunehên min paqij dibin.

Ez vî bajarî nas dikim. Ev qas şênî ragirtine, ev qas şaristanî li ser wî ava bûne bi tevahî di nava dilê wî de hatine û çûne... Êdî dem û dewran bi ser wî de hilweşiyaye. Her roj hêleke wî birîndar dibe, lê nikare binale bi ser wan birînen xwe de.

Ez ji vî bajarî hes dikim. Çiqas lehî rabe jî, kevnarebûna xwe di rûyên kevirên xwe yên reş de diparêze û di nava rûpelên xwe de vedişêre. Perwerdehiya min a hezar salan e.

Ez ji vî bajarî hes dikim. Çi dibe bila bibe evîniyê bernade û naçe. Cardin qîzeke lêvsor ji nava lêvên xwe derdixe û ji xortên çalak re dibêje:

“Ez hes dikim ji te!”

Çalakî wê demê hem wateya xwe û hem jî rengê xwe derdixe holê.

Ez ji vî bajarî hes dikim. Zû bi zû xwe nade ber destê dijminê xwe û bê dagirkirin jî; ew xwe diparêze di nava dilê xwe de û xwe bi xwe dijî. Ew tu caran jiyana dagirkeran najî...

Dema ku ez di nava dilê vî bajarî de, di ber malan re derbas dibim, dengê jin û mêran di şibakeyan re dertê derve. Hinek mîna te her dem li ser evînê diaxivin, nivîskarên ku pênuşa wan xurt û dijwar e fedî dikirin, çima wêjeya min teng dimîne li ber vî wêneyê...

Hinek jê jî şerê cîhanê yê nû didin destpêkirin. Dê weledê xwe davêje û bi ser de êrîş dike. Di vî şerî de wê kî bi ser bikeve ne diyar e. Lê xuya ye ku wê dinya xerq bibe.

Lêhilandina min mîna rûnê nîvhişk bikele û bi dizî diçû mêvaniya wan; gelo ew ê min di nava çî xwarinê de bine ser sifreyê? Dibe ku xanima malê bêkêr be û min birijîne erdê. Di pey re, pê li min bike û ez li ber lingan herim. Gelo ew ê bikaribe min mîna sî û sê diranan û xwarina sî û sê celeban bide ber hevdu û ew ê bine ser sifreyê...

Lê zarokên malê ji ber şer û pevçûnê ji xew radibe û dide girî. Yê şeş salî ji yê çar salî re dibêje:

“Na na nede girî, ew ê a niha ev şer biqedê.”

Lê naqede û kezeba min ranagire ji wê derê didime rê û berê xwe bidim ku derê û hêrsa min ew ê çawa dakeve, ew ê min di kîjan çiyayî re wer bike ne diyar e.

Li zikaka Melîk Ehmedê polêsek li pêxwasekî dide. Rêberê min êrîşê dibe ser polês û dibêje:

“Tu fedî nakî, tu li vî zaroyî didî!” û hevdu zîtî erdê dikin. Ez jî ji polêsên tirk ditirsim, lê xîretê dev ji min berneda û ez ketim navbera wan û min ew ji hevdu veqetandin.

Pêxwasê bixîret ku her dem alîkarê mexdûran e, ji bo mexdûriyê qet ne difikirî û bi ser mirinê de diçû. Ji ber ku metirsê mirinê bû li hember neheqîyan bû her dem bi dilrihetî dijiya...

Kêra xwe bi erdê dixist, çirûskên agir ji ber kêra wî diçirîsîn. Silav li min kir û got:

“Ez qurban tu bi tenê yî? Ji bo ewlehiyê ez bi te re bigerim” û bejna xwe heta navê ditewand.

Destê xwe danî ser singa xwe û bi rêzdarî sekinî. Mîna rêberekî dibistanên seyrangêhê qedandibe û pisporiya xwe giştik di der heqê rêberiyê de bi dest xistibe bi zanistî dida pêşîya min. Û ev zikak a min, a dinê ya te û bi min re di digeriya.

Pêxwasê birûmet berê xwe dide min û dibêje:

“Şaristaniyên ku li vî bajarî kon vegirtine; ev bajar ji xwe re kirine paytexta bazirganiyê

û navenda biryargehiyê."

Kevnariya bajêr di zikakên wî de veşartî ye. Mîna çanda gelên wê di kûrahiyê de xwe diparêze; derdikeve derve û di rûyê keviran de li mirovan dinihêre. Ji bo xwendina keviran pisporî divê, ango divê tu bi zimanê keviran bizanibî.

Di heft deriyan de tu dikarî têkevî bajêr?

Çarên mezin;

Deriyê Çiyê,

Deriyê Ruhayê,

Deriyê Mêrdînê,

Deriyê Serê,

Sê deriyên biçûk;

Deriyê Nû,

Deriyê Yekçavî,

Deriyê Duçavî,

Dirêjbûna bedena wî pênc hezar mîtro ye. Bilindiya bedena wî deh û duwazdeh mîtro ye. Firehiya bedena wî sê û pênc mîtro ye. Heştê û du bircên wî hene. Xanên wî, serayên wî û kevnariya wî...

Tê xwestin ku dewlemendiya wî li ber lingan here. Xîretê xwe veşartî û alîkarên kêmketiyên bi ser wan de dimeşin. Dilên kerr û kwîran (kor) diêşîne mîna wêneyên Fevzî Bilge bédeng e, lê bahoze di himbêza xwe de vedişêre.

Çend tofan û çend talan li me rabûn. Êdî hîn bûne zikakên kevîrên reş, xuya nake êş û elem li rûyên tarî. Vedişêre êş û elemê di xwe de... û li mirovan dilrihetiyê parî dike. Bi lêvên bişîrînî li perên bajêr bixêrhatinê dide.

Ez vî bajarî nas dikim. Ku her dem ew ê hêjayiyek ji min re veşartî hiştibe, dema ku min dibîne hêjayiya xwe derdixe der û min dildarî xwe dike, mîna zarokekî li pey xwe digêrîne. Û wa ye dîsa wiha kir... Digerim bê serî û hespê min dê li ku avê vexwe nizamim...

Hedya, bûka dusalî, du salan li ser hev du zarokan tîne. Lê belê her du jî bi heftikê dimirin. Biharê dema zoma wan ji çiyayên Mêrdînê dîsa vedigere zozanên Serhedê di

Ziman û çarîn

Murad DILDAR

-1-

Li ber ziman bê qîmet in, barê zêran
Ziman e, yê te dike bihêz wek şêran
Ên zimanê dê fêrî zarokan nakin
Jê dîkin zimanên gedê xwe bi kêran

-2-

Dîrok û nasnameya meriv e ziman
Eşq û evîn, huner û jiyan e ziman
Ên dibên ziman amûr e ne pêwîst e
Nizanin ku hebûna meriv e ziman

-3-

Dewlemend e û xweş e zimanê kurdî
Ên nezan û bêfam ji wî dîkin fedî
Bo neçilmise vê gulistana rengîn
Divê em lê bibin sermiyan û xwedî

Buka ducanî

Selmet GULER

rêvegerê de Hedya bi zaroka xwe ya sêyemîn xwe ducanî his dike. Dema Hedya bi hemla xwe dihise pêşiyê pir kêfa wê tê, lê paşê di-tirse. Çunkî dibêjê "ev jî wekî her du zarokên min ên din wê bimire."

Roj bi roj zikê Hedyayê girs dibe lê bi girs-bûna zikê wê re tirs û hêviyên wê jî girs û mezin dibin. Lewra bi rojan li xwe û li halê xwe digirî, lê wekî zikê xwe hêstirên xwe jî ji der û dorên xwe vedişêre. Lê belê rojekê pê li tirsê xwe dike û hemla xwe ji xesûya xwe re vedibêjê. Dema digihîjin sînore navçeya Kercosê xesûya wê bi çembilê Hedyayê digirê û wê dibe ber ziyareta Seyîd Bîlal, mişayîxê di dilê kesên herêmê de yê herî mezin û navdar. Hedya, her du destên xwe ber bi quba kesk î mezin û ew çendî jî bilind ve dike. Ne ji xwe re lê ji zaroka zikê xwe re duayan dike. Her ku diçe rimiya agirê mirazên dilê Hedyayê yê neçar geş dibe, loma xwestekên wê di lêvên wê yên ku wekî perîkên pîtokan dilerizîn lezgîntir dibin. Lê dîsa têhna wê naşikê loma, gewdê wê yê zirav û ew çend jî taze ber bi gora Seyîd Bîlal rêbirê di serê wê de pêltir dibe, destên wê tevli bazinên bûkaniyê yên di zendên wê de, ber bi xwedayê di dilê wê de bilindtir dibin -û Hedya bûka apê, jinhevala kurê apê ya ku nedikarî bar û piştîyê zomê û eşîrê hilînê, ya ku di bin barê zarokanîna xelkê çiyayî de digerize û mîna darhejên nava pêtên

agir di nava xwe de diqijqije, dizûre û dikûze... Hedya, zaroka zikê xwe wê şevê li wir radizîne. Berê sibê xewnekê dibîne Hedya. Di xewnê de ji kurê xwe re bûkekê tîne lê, bûkeke biyanî, ne ji zomê. Bi berbanga sibê re ji xew radiibe. Piştî destnimêja sibê dîsa vedigere hundirê qubê. Piştî du rekaetên nimêja sibê du rekaet sinet ji merqeda Seyîd Bîlal re jî bexş dike, Paşê dîsa destan vedike û sê gavan ber bi gorê yanê ber bi hêviyên xwe ve diçe. Hedya, hemd û şikra xwe ji Xwedê re tîne, lê ji bilî wê kes nizane ne şikra xwe ji hemla xwe re tîne ne jî ji xewna xwe re. Lê berî ku Hedya ji hundirê qubê derkeve berxekî hilîkî koçerî ji Seyîd Bîlal, kalê di serê xwe re bexş dike.

Sala din dema rê û rêçikên koçerî berê zomê dîsa didin çêriya çiyayên Mêrdînê, keçeke bi navê Zelal li ser destê Hedya bûka sê salî dixuyê. Lewra xesûya Hedya ya bi navê Emşa xwe li hemberî ziyareta Seyîd Bîlal deyndar his dike. Lê, rê dût in û kinerê jî çiya asêgehên nebirbiwar in ji bo birêveçûnê. Êvareke ku ez li kozmala wan bûbûm mêvan, Xaltiya Emşa bi awayekî stûxwar bêçaretîya xwe ji min re got. Piştî bédengbûneke nedirêj Xaltiya Emşa "tu dikarî bi tirimpêla xwe me bibî ziyareta Seyîd Bîlal?" got. Nizanim çima lê hew min dît ku min gotibû "ji me her sêyan dê kî qurbanê serjê bike û ji çerm bike?" Xaltiya Emşa, bi lêvlepteke pir lezgîn dema gotibû "yan ez an jî tu" dîmena vî fotoxrafi di serê min de hatibû pê. Nizanim çima lê zimanê min ji lepta lêvên xaltiya Emşa di devê min de lezgîntir liviyabû û bi awayekî bêyî xwe "Xaltiya Emşa sibê xwe amade bikin em ê biçin" min gotibû. Wê gavê ji xesûyê bêhtir belekên çavên Hedyaya bûka ducanî li ber şewqa donê gazê, ronîya zenûn mîna du stêran di quncikekî nîvreşî de çirisibûn û biriqîbûn.

Danepenzeke biharî dema em gihîştibûn Gundê Bêcirman nava darên ziyareta Seyîd Bîlal, pişê me yê herî pêşîn bû derxistina berxê di bagaja tirimpêlê de. Xaltiya Emşa piştî ku sê lingên berxikê salê (du ye pêş yekî paş) bi benekî pan î koçerî girêdan rabû ser xwe û yekawir li min nihêrî û got "tê serê berxê jê bikî

û ji eyar bikî” Bi îfadeyeke ku min nedikaribû serê berx jê bikim min serî hejand û min got; “ez nikarim”. Bi awayekî giran wê got “di ola me de dema mêr hazir bin serjêkirina serê pez li jinan nakeve”. Min bi tinaz bersiv da û got “Xaltiya Emşa, heta ku em li vir bin tu nikarî min ji mêran nehesibînî? Xaltiya Emşa, pêşiyê li fotoxrafkêşa milê min paşê li çavên min kûr nihêrîbû û bi bişirîn “ez derdê te zanim” got. Xaltiya Emşa jina sivik, kevaniya malmesin li xwe zivirî û hêdî hêdî destê xwe dirêjî tûrê nava milê xwe, kêra kalanî ya mîna xencerekê tûj kir.

Nîsan 2008 /

Nisêbîn

Bavê min berî bîst rojan mir.

Pepûka diya min bi destê xwe cendekê wî şûşt û veşûşt.



Hespên esîl...

Beşîr MELE

Dibên di dehlekê de li giravekê pir Hesp hebûn, berî ku kedî bibin, mirovan nikaribû ew bigirtina. Pêşniyara berbêj (kahînekî), bû sedema girtin û kedîkirina wan hespan. Pîlan ev bû: Agir bi dehlê xînin ji sê hawirdoran wê dorpêç bibin. Aliyek agir, aliyek çiyayê bikelem û rût û aliyê dîtir jî derya. Hin di nêv agir de mirin, hinan xwe di behrê werkirin, hinan xwe li şax û kelemên çiyayan xistin û hin man, serê xwe xistin singa hev, rû bi rû ji tî û birçînan li benda mirinê man. Berî ku hesp navokutka dawîn bikin kahînan femana danîna cuher û berçavkan da. Hespên birçî û çavgiştî tenê derdê wan ma cuher. Ên mirin ji xwe bûn rejî û dûman û hin ji wan bûn xwarina masî û lawirên behrê û yên bi çiya ketin reseniya hespîtiya xwe parastin û bûn sembola... yên man jî çawa xwe ji metirsiya mirinê rizgarkirin, azadiya xwe winda kirin, rişme ket serê wan û di bin destê mirovan de man!?

Bedkar û hêzên tarî, di vê derbarê de lêkolînan dikin dixwazin siyaseta *kahîni* ya kedîkirina hespan li ser gelê kurd pêk bînin. Weha bêhna vê pirojeyê tê, ku gelê kurd têxin koşeyên teng û bi kotekî koletiyê pê bidin pejiwandin; mîna hespên li giravê. Dibe ku kurd kedî bibin ji bo parastina jiyana xwe, jixwe hin jî bi çiyayan ketine asîmîleya naveroka reseniya netewa xwe dikin û hin jî ji bêkarî û birçînan bi deriyan ketine. Lê ji reseniya xwe danagerin, amede ne koletiya qenc û hêja bikin û mirovetiya durist jî hilgirin û bi cîran û hogiran re wek bira bijîn. Di pêşerojê û serdema nû de kurdan ji bilî hevkarîyê tu zirar nedane netewên cîran, gorî û kedên mezin di damizrandina dewletbûna wan de terxan kirine. Ma nayê pirsîn: Wê kurd heta kengî zilindara aramiya bindestiyê daqurtînin, kewar û çalên jan û keseran di giyanê kurdan de tijî bûne!...

Du kurteçîrok: Neynik, Evîn

Evdile KOÇER

Dema ku me ew xist bin axa sar, diayên xwe yên herî spehî wekî kulîlkên ji dilê xwe lê barand.

Ji wê rojê û pê ve, ev nozdeh roj e diya min weke keçikeke hijdeh salî ji ber neynikê ranabe.

Soravên herî delal li xwe dide; wekî çivîka çardehê nîsanê hermetê di ber re carna stranên jî dibêje.

Yê ku nizanibe, dê sedîsed bibêje qey diya min dil berdaye yekî.

Ma ez ê çî derewan bikim; min xwe negirt û jê pirsî.

Bi henekî got, "Xwezîîî..."

Lê dû re barê xemgîniyeke veşartî ket ser rûyê gotinên wê:

"Berî sî û heşt salan dema ku min dil berdabû bavê te ez dîsa dihatim ber vê neynikê û wekî niha min xwe ji bo wî xweşik û delal dikir. Lê nenihêre ku ez niha hewl didim dîsa bistrêm, hingê kurê min... hingê stranên herî xweşik diketin ser lêvên min. Lê va ye ev nozdeh roj e, strana dilê min mir û ket bin vê axa sar. Ez dizanim beredayî ye, ez dizanim ev qe-dera reş neynika xwe dide rûyê me gişan... lê.. -diya min di vir de, destê xwe weke ku bi ser guliyên bavê min de bîne, bi delalî bi ser neynikê de dibe û tîne...- lê li ber vê neynikê ez wan rojên xwe dîsa dixwazim şîn bikim. Ez dibêjim qey ev neynik jî, ji wan rojên evîndariya me çend dîmenên nemir tîne û diyariyî min dike... Xwezî vê neynikê bikaribûya bavê te ji nû ve sax jî bikira... Axxx... ezîzê min dev



ji min berde. Ma nexwe ez ê çawa bikim kurê min, bi vî awayî ez dikarim hinekî bêrîkirina dilê xwe honik bikim... axxxx..."

Evîn

Keçika ku min dil berdabûyê, ma min çî dizanibû ku dê piştî du salên din ji min re bibêje ku di kerxaneyê de jî kar dikir. Min jê re got; "Te ev yek çima ji min veşart, delala min..."

Wiha li min vegerand, "Ez ditirsiyam ku te dev ji min berda, ditirsiyam ku evîna me weke stêrkeke bêlomeyî birijîya ser bextê me û têk biçûya..."

"Lê tu çima niha dibêjî..."

"Ez dizanim ku tu êdî dev ji min bernadî, ez dizanim ku êdî tu tişt nikare evîna me xera bike..."

Piştî ku sê çar hêsirên xwe paqij kirin, wiha berdewam kir: "Li min negire, ez mecbûr bûm ku min karekî wisa bikira, nexwe min nedikaribû ew pirtûka ku kêfa te gelekî jê re dihat çap bikira..."

Çip! Çip! Çip! Dilop tîn li orta malê dikevin. Kirêkerên malê li orta malê sekinîne bi aramiyeke weke bê dilê xwe li filmekî temêşa bikin, bi rûyên bêîfade dilopan dişopînin. Her dilop jî jor heta bê bikeve elbê, dişopînin. Yek, du, sê...

Yek ji wan rabû ber bi mala xwediyê malê

JI WEŞANXANEYA LÎSê 5 berhemên nû...



Li pirtûkfiroşan...



*Si Bi Rojê Xweşik e
Welat Diken*



*Sêv ji Me Dikujin
Mizgîn Ronak*



*Şev û Deng
Jan Dêran*



*Taşlar Şahit (2. Baskı)
Şeyhmus Diken*



*Zevahîz Ömrün Sürgünü
Mehmed Uzun*

PIRTÛKXANEYA | LÎS | KÎTABEVÎ /// Kooperatîf Mah. Akkoyunlu 4. Sokak Feza Apt. 1/1 İç Ofis Diyarbakır
0 412 228 97 76 www.wesanenlis.com - wesanenlis@yahoo.com

Xaniyê dilopkirî

Sevger CIYA

ve çû. Mala xwediyê malê li heman taxê sê çar mal ji wan wêdetir e. Jina mêrik deriyê malê vekir. Kekê Îsmet ê ku xwediyê malê ye li mal nîn e. Heta dotira rojê dê karê wî bidome. Karê kekê Îsmet! Wax mala min kekê Îsmet jî bûye xwediyê kar! Hela ji xwe re mêze bikin! Kekê Îsmet ku xelkê wê taxê ji wî re dibêje faîzçî, vê mala xwe bi kirê daye çar xortên karker. Ji van karkeran jî her yek xwediyê çîrokeke balkeş û cuda ye lê divê pêşiya her tiştî em behsa kekê Îsmet bikin. Kekê Îsmet ê ku bi eslê xwe ji Mêrdînê ye, ji vir û bîst sal berê mala xwe ji Mêrdînê bar kiriye aniye Stenbolê. Kekê Îsmet ê ku bîst sal berê bi peyveke tirkî nizanibûye, niha tu wî bikujî peyveke kurdî ji devê wî dernakeve. Bi sê telaqê jinberdanê sond dixwe dibêjê min kurdî ji bîr kiriye. Car heye wexta di cemaetê de kurd tune bin, dibêje ez ji tirkên Mêrdînê me. Tê gotin rojekê dîsa wexta wiha gotiye, ji gundê wan yek di nava cemaetê de hebûye, her çiqas Îsmet ew nas nekiriye jî, wî Îsmet nas kiriye û heta ji kenan miriye keniye dawiyê jî gotiye rast e, ez vî ciwanmêrî nas dikim ji gundê me ye, tirkekî heşayî hizûra we diya wî nepixandibû, ji ber vê yekê ew tirk e. Îsmet ê ku fêr kiribû cemaet bi piranî ji kurdan pêk tê serê xwe kiribû ber xwe tişteke negotibû û dûr ketibû. Vî ciwanmêrî bi devê xwe digot xwendina min tune lê çi karê dewletê hebûya dikaribû bi hêsanî safî bike. Salekê wexta hîlbijartinan bû berendam, xelkê jî dizanibû bi rastî mêrikekî jêhatî ye, ew hîlbijart. Beriya hîlbijartinan sond dixwar digot ez ji bo karê muxtariyê ji we tiştêkî naxwazim û nexwest jî, lê heta pere neketa berîka wî kesî/ê nikaribû belgeyekê jî ji wî bistîne. Hezar astengî derdixist pêşiya milletê, milletê fêr kir ku merivêkî wisa ye çûn giliyê wî ji qeymeqem re kirin, qeymeqam bangî wî kir, hat bi qeymeqem re xeber da qeymeqem got rast e, tiştêkî ku keya

şaş kiriye nîn e. Li her derê karên keyatiyê wiha dereng çêdibin, wan jî piştî stûyê xwe firikand û vegeyriyan malên xwe, sond xwarin ku careke din wî nekin keya. Ew jî ji xwe careke din nebû berendam.

Cewat vegeyriya malê, hevalên wî li hundir li hêviya wî bûn, got Îsmet naxuyê. Dotira rojê dê bê her hal. Her çar hevalan dîsa li wê derê dilop temaşe kirin. Çip! Çip! Çip! Ehmed got kuro wiha nabe divê em çareseriyekê bibînin. Cewat got, “ka şonikekî bide min ez biçim sifirneyan bikutim, nizamim qeysê bangeran li ku derê ye, divê em hinekî xanî bigerin.” Bû pişkepişka wan hemû keniyan. Ehmed got kuro ev çi bikutim mikutima te ye. Eyb e lo, qe nebe bibêje bêmane. Dîsa bû pişkepişka wan. Di vê navberê de Ehsan hinekî xwe tûjomûjo kir (her tim beriya ku dest bi xebirdanê bikira xwe wiha tûjomûjo dikir her çiqas pêşiyê hevalên wî pê keniya bûn jî niha ew jî hewisibûn). Dest bi peyivînê kir “kuro, ev Îsmet e, çi quzilqurt e, yekî hîlebaz e. Îro min mêrikek nas kir qala wî kir, ez şaş mam. Dibêjin xortek ku çûye leşkeriyê bike, xort parî yekî gêjo ye lê dewletê gotiye qey dixwaze me bixapîne, xwe li gêjotiyê datîne. Dewletê ev lawik nexweşxane bi nexweşxane gerandiye, lawik li wê derê hinekî din jî dîn bûye, nayê zanîn çi kiriye lê ew avêtine zindanê. Paşê ew ji zindanê derxistine, cara dawîn wê demê bi malbata xwe re xeber daye û paşê malbatê ji kurê xwe salix negirtiye. Werhasilêkelam lawik winda bûye. Malbat çûye ku derê gotine yekî wisa li ba me tune. Ev Îsmet ji xwediyên lawik re dibêje ez dikarim lawê we bibînim, lê divê hûn pere bidin min. Malbat jî bêgav dipejirîne, ev mêrik diçe du sê nasên xwe digire, bi hev re diçin partiyê. Digot îcar li partiyê çawan diaxivîya, “ev kurê me winda bûye, heke hatibe kuştin bila termê wî bidin me, em jî kurd in. Ji ber vê yekê vana tînin serê me. Qey kurê me jî ji yên serê çiyayan biqîmetir nîn e. Ez qurbana bejn û bala wî bim. Wa ye dewleta zilimkar, şêr kirine qefesê. Qey dê qatê zarokên me be. Lê em jî kurd in heke miribe bila goreke me hebe.” Piştî parti ketiye nav hewldanan, ÎHD ketiye dewrê, cendekê lawik dîtine. Îsmet jî pere avêtiye berîka xwe. Ev mêrik pir çavekirî ye, yekî pir fêlbaz e. Yekî ji wan got, “de wê de lo we Îsmetê qûnbigû jî anî li serê me kir çavekirî.” Ehmed got “erê erê yekî qûnbigû tu yî yek jî Îsmet e.”

Tariyê xwe berda ser bajêr, di malan de sobe hatin pêxistin, dûxanekê ser bajêr girt. Ev dûxan hilma mirovan diçikîne, qirika mirovan dişewitîne. Her çar heval di nav xaniyê dilopkirî, paceyên nesazkirî yên tên girtin lê di ber çardera wan re qasî ku ji Xwedê bixwazî ba tê hundirê malê, bê pejir sekinîne. Weke mirîşka ber baranê serê wan gijomîjo bûye, xwe kişandine hev, diricifin, dilerizin. Ehmed dest bi axaftinê kir “ew Îsmetê bênamûs wexta xanî bi kirê da me, hezar pesnê xaniyê xwe da, hezar carî gef li me xwar heke tiştek bi xanî bibe dê çi bike, hezar şîret li me kirin, me ji bêgavî dengê xwe nekir. Xanî maşelah mîna quzê diya wî, şîreşîra avê ye tê xwarê. “Emer bibişîrin “te quzê diya wî ditiye?” Mêze kir Ehmed pir hêrs bûye û yên din ketine tatêla sermayê, heneka xwe li wê derê birî. Ehmed weke ku bi xwe re xeber bide “çavekirî ye he!! Baş e, em ê sibê bibînin çî tê serê çavekiriyan, hela bila bikeve destê min ez dizanim çî tînim serê wî, qebrax! Bi çavê xêtirminndan li me dinihêre! Di malê de seg nikarin bijîn, serê sibê heta êvarê ax mala min û wax mala min. Ez ê mala te bi te nîşan bidim. Heke tu ji destê min filitîyî bila navê min jî Ehmed nebe, ez ê pîvazan bi goyê xwe ve bikim û mîna keran bizirim” Cewat ku ji pesn û dayînê aciz dibû got “ew xeberek heye dibêjin: Hespê bez, jina ku di nav malê de biçê bi lez, mêrê ku di nav cemaetê de bibêje ez, ji wan keremat çênabe.” Ehmed di ber xwe de got “em ê hev bibînin keramet çêdibe yan na.”

Xaniyê ku mehek berê kirê kiribûn, niha di nava avê de mabû, her dera xanî dilop dikir, wan jî dev ji elbdanîna ber dilopan berdabû. Hemû alav şilopilo bûbûn.

Dotira rojê.... Şeva dinê bi kurtasî dojeh bû. Heta berbangê baran bariya û heta berbangê xanî dilop kir. Heta serê sibê ev çar heval li hêviya roniyê man, heta serê sibê bi çaya qaçax bi sohbetê, bi dijûnên Îsmet, bi çîrokan, bi meselikan sekinîn. Niha wa ye sibe ye, her der ronî bû, her kes weke ku tiştek neqewimiye, wek rojeke asayî tevdigere. Zarok diçûn dibistanan, ên ku karên wan hebû diçûn karên xwe, hemû dikan vedibûn. Her çar heval li ber deriyê xwe sekinîbûn. Diviyabû biçin kar lê nedixwestin şeveke weke vê şevê careke din jî bijîn. Dawiyê biryardan, dido ji wan li malê man, dido çûn kar. Hemû di heman însaetê de dixebitîn, lewre dê ji

bo hevalê xwe jî karibûna destûr bigirtina. Ehmed û Cewat li malê man. Cewat li Ehmed nihêrî bişîrî “ez ji te re tiştekî bibêjim lê nexeyide. Li ba me dibêjin mîna segê ku ji binê guran bifilite, em jî di heman rewşê de ne.” Her du bi hev re kenîyan.

Dema taştê çûn li deriyê mala Îsmet xistin, jina Îsmet got hê nehatiye. Şerm kirin ji jinikê re qala xanî bikin, vegeriyan hatin mal. Du saet paşê dîsa çûn ber deriyê Îsmet, na hê jî nehatiye. Jinikê ji bin negot hûn çima lê digerin, weke ku tiştên wisa li ba wan asayî bin. Tenê derî vedikir digot “na li mal nîn e” dîsa derî fesal digirt. Her du heval ketin tatêla Îsmet. Heke îro jî nehata, nikaribûn şevê jî wiha derbas bikin. Sibê jî divê biçûna kar lewre dizanibûn neçin dê wan ji kar bavêjin. Ji aliyê din heke ew bixwe biçin hosta bînin û banî çêbikin wê demê jî bi ihtîmaleke mezin dê Îsmet xwe nede ber mesrefê.

Li ser xanî, xwe dabûn ber tava zivistanê, belê ev bajêr wiha ye di heman rojê de tav jî heye û berf jî heye. Tava niha nayê wê watê ku dê işev hewa sayî be. Li ber tavê hinekî ji xwe ve çûn, ponijîn. Qîrînek ji taxê bilind bû, herê ji aliyê mala Îsmet ev qîrîn dihat. Her du heval şaş bûn, bi aliyê mala Îsmet ve bazdan. Wexta gihîştin ber deriyê malê dengê lorandina jina Îsmet dihat. Xelk kom bûbû li ber derî. Her kes şaş bûbû, Li hev mêze dikirin. Di awiran de tenê pîrsek hebû. Erê, cendekê Îsmet hatibû dîtin. Gelo kê çima Îsmet kuştibû? Hinekan digotin partiyê ew kuştîye lewre ajantî dikir. Hinekan digotin Jîtemê ew kuştîye lewre xwestîye perê Jîtemê bixwe, hinekan digotin deynê mirovan nedaye ji ber vê yekê hatiye kuştin. Di belgeyê dewletê de kuştîyê qesasnediyar dihat nivîsandin.

Wêje, mijara zanîne ya herî girîng e. Pirsgerêka rexneya wêjeyê ya herî girîng pîrsgirêka pîvera (krîtera) rexneyê ye.

Ji bo ku mirov di wateya wêjeyê de bigihîje divê mirov aliyê wêjeyê yê ku wê ji zimanê devkî û yê axaftinê vediqetîne, derxe holê. Di zimanê devkî û axaftinê de ziman navgîn e. Û lêkera (kiryara) ku bikaranîna peyvên ber bi armancekê ve dike ye. Alava dahûrandina

Rexneya wê-jeyê

Adar JIYAN

rastiyê, derxistina wê ya holê û bargirê ragihandina wê bi xwe ye.

Gava ku behsa bizavên wêjeyî, tê kirin fikr û jiyana mirovan a ku di pêvajoya dîrokê de guhertin û veguhertinên kûr pêk tînin tîna mirov. Di her dem û domanên dîrokê de mirovan ji daneyên felsefî, zanyarî û her wiha rastiyên civakî, aborî bandor wergirtine û li dewsa fikr û hizrên kevn û paşmayî yên nû û nûjen pêk anîne. Wekî ku di dirûşma “her gav arasteyî başî, bedewî û rastiyê bibin” de jî tê gotin ku bi van pêngavan re nîrxên sincî (exlaqî) bedewkarî û zanyariyê derdikevin holê. Bizavên wêje û hunerê li gorî dem û serdema xwe diguherin û wekî pîvana nîrx û bedewkariyên demê tîna dîtin û pejiwandin.

Bizavên wêjeyî û hunerî, ber û berhemên neteweyî û navneteweyî yên zanistî, civakî, aborî, ramyarî, sincî û olî vediguhêzin nîfşên nû. Û di berdewma nîrxên dîrokê de li hemberî feraset an jî pergala huner û wêjeyê ya kevnar xislet û rewîşteke (kesayetiyê) şoreşger û serhildêr hildigire. Belê ev xisletên şoreşgerî, pîrê caran bi azîne û bi sepandina azîneyên wêjeyî û hunerî re xwe didin der.

Di wêjeya her civakê de, bizavên neteweyî û merhaleyên wê hene. Belê hin ji wan sînorên neteweyî derbas dikin û li nîrx û bergeh-dariyên navneteweyî dadigerin. Û peyre jî bandorê li ser wêje û hunera neteweyî dikin.

Ji berhemên nivîskî yên ku ji hêla naverok, awa û çawaniya xwe ve bi mebest û mexseda ku xwîner ji huner û bedewkariya nivîsê têr bibe, hatine/tîna nivîsandin re wêje tê gotin. Wêje, yek ji awayê vegotinê yê herî girîng û watedar e. Her wisa wêje, wekî hunera vegotîneke bi banador a ku hest û hizrên mirov derdibire jî tê ravekirin. Îcar, ji bo ku tekst/nî-

vîsar an jî gotarek wekî berhemeke wêjeyî were dîtin, divê pêşî nîrxê wê ya hunerî hebe. Ji bo ku nîrx û pileya berhemê were fêmkirin jî, divê cihêwaziyeke wê ya ji zimanê nivîskî û devkî yê ji rêzê hebe. Lewre ziman, di axaftin û pexşanê de ji bo bikaranîna peyv an sazkirina hevokan wekî navgînê tê xebitandin. Her wiha ziman, wekî navgîna ragihandinê ya ku piştî lêkolîn û derbirîna hest û hizrên mirov pêk tîna jî tê bikaranîn.

Peyv, di zimanê devkî de, bi axaftinê re peywira xwe bi cih tîna û ji holê radibin. A girîng bandora wan a ku li ser encamê hikum dike ye. Encam ango armanc, guherandina ku li ser guhdêr bandorê dihele ye. Belê di zimanê nivîskî an jî berhemên wêjeyî de piştî nivîsandinê jî peywira xwe didomîna.

Gelek caran mirov, ji bo bikaribe peyv û hevokên xwe yên ku jî hest û hizrên kûr der dibin, bi vegotîneke bedewkar bihûne û biedilîne, ditengijê. Wê gavê hawara xwe digihîne hunera wêjeyê û li rê û rêbazên hunerî digere. Ziman, rasterê mirov tîna pêşberî kes an jî heyberên ku di sêwr û nîgaşa xwe de bi wan re dipeyve (pêwendiyê datîne). Di zimanê nivîskî û devkî de peyv zebloq, zelal û aşkera ne. Hevok nehs, no, dilkoçer û gewzeger in. Ji nedîtî ve wîna dibin û diherin. Belê di zimanê wêje û helbestê de berevajî wê ziman ne navgîn, armanc bi xwe ye. Di wêje û helbestê de ziman, peyv û hevok li rengê tiştê dadigerin. Helbest, nakeve navbera mirov û mirovên din an jî ji bo fikr û tiştên din berde hev û din xwe aşkera nake. Wekî zimanê devkî û pexşanê tu carî nakevin rewşê gewgezer û kêfperest. Li nîrxên wêne peyker û muzîkê dadigerin.

Helbestkar, hevokê saz nake. Ew, ji peyv tiştên bedew ku qet nayên jibîrkirin diafirîne. Ji bo ku peyv bigihîjin ser hevdu hewcetî bi awayekî taybet ê ku mirov ber bi meyldariyên kûr û derûnî ve dike heye. Helbestkar, ji peyv sîndê wernagire. Ew sîndê dide peyvê. Wekî reng û dengê nû, wan dixê rengê zindî û li tiştê heyî yê jîndar dihesilîne. Helbestkar, pêşiyê ziman xera dike, belav dike, peyvyan diqurmişîne û dîsa wan dicebirîne û peyre jî wan di cîhana helbestê de dide rû-

nandin.

Şêwaza şêwandina peyvên a ku li biwêj, hevok û gotinên bitilsim û bedewkar dadigere, şêwazeke kevnar a helbestkariyê ye. Ji hêla din ve mirov dikare bibêje ku ziman li aliyekî, berî ku axaftin pêk were jî helbest û zimanê helbestê hebûye. Tê wê wateyê ku wêje berî ziman pêk hatiye. Belê dîsa jî, helbest û wêjeya herî têkûz piştî vedîtî û bikaranîna nivîsê pêş ve çûye. Di mijarên derveyî hunerê (polîtîka, hiqûq, ol, bîrdoz û hwd.) de jî tekstên nivîskî, destan, stran û dilokên dilînî yên nêzikî wêjeyê jî wekî berhemên heyberî/camîdî (tiştîyî) hatine nîrxandin.

Dê tekst çawa û bi çi awayî were rexnekirin. Ev jî teqez ji hêla wêjevanan ve tê dahûrandin. Li aliyê din jî, divê mijara ku tê rexnekirin wêjeyî an ne wêjeyî ye jî were rexnekirin.

Rexneya wêjeyê, gelek caran bi egera dahûrandina pîrsgirêkên wêjeyê û nîrxandina ber û berhemên wêjeyî tê kirin. Belê gava ku mirov vê têgehê bi awayekî dorfirehtir rave bike, dê mirov bibîne ku rexneya wêjeyê rasterê nîrxandin û şayesandina wêjeyê ya felsefî bi xwe ye.

Rexneya felsefî (an jî feylesofên rexnegir), her gav bi çavê ciwankarî û bedewkariyê li berhemên wêjeyî dinihêre. Û çawaniya berhemê jî ji aliyê wêjeyî û hunerî ve dinirxîne. Belê mixabin rexneya rojane ya ku îro tê kirin, sivik û bi ser re ye. Lewre jî çawaniya berhemê bêtir, pêşî bi nûser û peyr re jî ziman, awa û taybetmendiya berhemê eleqedar dibe. Rexneya berhemê ya bi vî awayî, rexneya rastîn (û bêlayan) a wêjeyî di bin pêşdarazî û hestiyariya rexnegir de dihêle.

Nêrîn û nêzikahîtdanên felsefî yên çawani û nîrxandina wêjeyê, cara pêşîn xwe di diyalogên Platon de didin der. Li gorî Eflatûn (Platon), cîhana daringî, ji dûmenên nîgaşî pêk hatiye. Hemû heyîn û heyber bi saya sehekîyên mirov hatine/têne hisandin. Dûmenên ku tîn dîtî hemû tiştên lasayî ne. Tiştên şênber bi hizrên razber re derdibin û têne dîtî. Hunermend jî rasteqîniyê bêtir, bi dûmen û nî-

gariyên ku bi sehekîyan re derdibin, mijûl dibe.

Hunermend an jî wêjevan, ji hincet û spar-tekan wêdetir bi sehekî û xuyaniyan mijûl dibe. Li gorî Platon huner, lasayîkirina xwezayê ye. Helbestkar û wêjevanê/a ku lasayîya lasayiyê (teqlîda teqlîdê) dike jî mirov ji rasteqîniyê bi dûr dixe.

Li gorî nêrîna Arîstoteles, ku wekî teorîsyenê wêjeya bipergalê tê dîtî û pejirandin jî huner, lasayîkirin bi xwe ye. Belê helbestkar, kirûyeke jî rêzê ya yekaniyê (tekane) teqlîd nake; ew, pergala gerdûnê ya ku xwezayê di xwe de dihêwirîne bi xwe teqlîd dike. Peywireke hunermend û wêjevanên ku lasayîkeriya xwezayê dikin a hêvojer (hîndeker) û şerdeker heye. Bo nimûne, trajedyaya bi xwîner an jî temşavanan re, pêşiyê tirs û xofekê der dike û peyre jî wan li gorî rê û rêbazên xwe ji pelikandinên sawdar û qilqaldar diparêze û pak dike.

Di serdema navîn de rexnegiriya wêjeyê, li ser azîneyên şîrovekirin û ravekirina nivîsarên pîroz hûr dibû. Di wê demê de, digel bikaranîna hunera wêjeyî, bandora dozîneya retorîk (xweşbêjî, xweşpeyvîn, xîtabet rewanbêjî, belaxet) jî hebû.

Di serdema ronîdariyê (ronesansê) de çavkaniyên Yewnana kevnar û Romayê pîr qîmetdar bûn. Rexnegirên demê, ji bo peydandin û bidestxistina rêbazên wêjeyê yên neguherbar, ketin nav lêgerîna helbest û berhemên şanoyê yên kevnar. Digel wê, ev lêgerîn û peytandinên nû, bûn destpêka wêjeyeke nûjen. Û wêjeya nûjen a wê demê, hin bi hin ji bin bandora olê kişiya û ber bi awa û şêwazeke resen û serbixwe ve bû.

Beledîyeya Şaristanê Girdî yê Dîyarbekirî samedê aşma remezanî yew programê rêzepanelan viraştî.

No programê panc panelan ra ame bi viraştî. Panela yewine şeşê aşma êlule de dest pê kerd û tarîxê a peyênê zî 21ê aşma êlule bî. Nê panelî pêro Salona Tîyatroyê Beledîyeya Şaristanê Girdî yê Dîyarbekirî de viraştî.

Nê panc panelî pêro zî bi ziwanê kurdî bî.

Panela Mela Ehmedê Xasî

Mehmûd NÊŞITE

Çar panelê ewilî bi lehçeya kurmanckî, panela peyêne bi lehçeya kirmanckî (zazakî) bî.

Babetê nê panela pêro edebîyatê kurdî û edîbanê kurdan ser o bî.

Panela peyêne roja 21.09.2008 saete 14.00 de dest pêkerd û saete 16.30 de qedîya. Babeta na panele edebîyatê lehçeya kirmanckî (zazakî) ser o bî. Panele de Mehmûd Nêşiteyî moderatorî kerde. Panelîstan ra Malmîsanîjî destpêkerdişê edebîyatê kirmanckî yê nuşteki ser o qalî kerd. M. Heylanî mewlidî tê ver nay û Mewlidê Xasî ser o fikrê xo va. Mela Mehmedê Kavari zî hem mewlidê Mela Ehmedê Xasî û mewlidê Usman Esat Efendîyê Babijî ra çend beytî wendî hem zî di şîrê xo wendî.

Salona girde bibî pir. Wina aseno ke merdim renc û kede bido kamcîn kar, a renc û kede veng ra nêşina. Şarê ma êdî erjanê xo yê neteweyîyan rê wayîr vejîyêno. Na panele de zî no fehm îspat bî. Çünke seba ke şarê ma bêro na panele, verê verkan xebatêka rinde virazîyabî: Şar agahdar bibi. Teberê Dîyarbekir ra, mavajî Sêwregî ra zî şar amebi. Ma fehm kerd ke na ked û rence badilhewa nêşîya.

Akerdişî ra dima Malmîsanîjî dest bi qiseykerdişê xo kerd. Malmîsanîjî verê behsê edebîyatî kerd û va: “Edebîyat, hunerêk (senetêk) o ke bi çeku û vateyan virazîyêno. . . Hunermendî (senetkarî)

leza-lez û bi asanî peyda nêbenê. Hunermendî asmên ra nînê war. Erdî ser o pîl benê û kemiliyênê.” Dima dewam kerd û va: “Kitabo ke tewr verî lehçeya kirmanckî de ameyo nuştiş kitabê Mela Ehmedê Xasî yo. . . Heme miletan de pêşengî estê. Ehmedê Xasî zî no war de pêşeng o. Gama verêne ey eştâ. Şima zanî, gama verêne muhîm a, gama verêne dima gamê bînî erzîyenê. Naye ra, qîymetê ey ma het zaf o. Lazim o merdim rûmetê ey bizano.” Dima derheqê Xasî de agahdarî dê.

Qalê xo, rewşa ê demî (wextî) ser o domnê: “O wextî zî kurdan ser o zulm û neheqî bî. Kurdî o wext zî feqîr bî. Kurdî heqanê xo yê netewîyan ra bêpare bî. Kurdan 1898 de bi nameyê Kurdîstanî yew rojname vet. Sultan Evdilhemîdî qedexe (yasax) kerd. 1894 de qaymeqamê Motkî yew ferhenga kurdki nuştî. Evdilhemîdî no ferheng zî qedexe kerdbi. . . Na yew ecêba giran a! Dewleta Usmanîyan goya (qaşo) dewleta şerîetî bî. Kurdî zî zafane misilman bî labelê zîwanê înan qedexe kerdinî. Mavajî ziwanê ereban, ruman, cihudan (yahudîyan) û armenîyan o wext yasax nêkerdinî.

Goreyê tayê çimeyan, Mela Ehmedê Xasî, Kurdîzade Ehmet Ramiz û Mela Selimê Gonîgîjî Kürt Azm-i Kavi Cemiyeti de ca girewto. Nê heme hîrê zî kurdê kirmanc (zaza) î. Ehmed Ramizî nameyê Kurdîzade nayo xo ra.

Serra 1909 de, Dîyarbekir de yew grûba kurdan tepîşenê benê Dîwanê Herb ê Îstanbûlî de mehkeme kenê û înan şawenê Rodos,



surgun kenê. Ehmedê Xasî zî înan'ra yew o. . . Goreyê zanayîşê mi, Mewlidê Ehmedê Xasî, Kurdîstan de kitabo kurdî yo tewr verên o ke çap biyo. Nê mewlidî ra ver Kurdîstan de kitabo kurdî çap nêbiyo."

Dima, qalê nuştexanê bînan ê kirmanckî kerd. Behsê mewlidê Usman Efendîye Babijî, Beyatnameyê Şêx Selahedînî û nuştexanê nê serranê peyênan kerd.

Qalanê Malmîsanijî ra dima Mela Mehemedê Kavari şîrêk wende. Şîre ra dima zî M. Heylanî dest bi bi qalanê xo kerd. Verê va: "Seba ke, bi no program alim û melayê ma amey naskerdiş, ez wayirê nê pragramî, Serekê Beledîyeya Şaristanê Girdî birêz Osman Baydemîrî rê sipas kena. Ça ra çewt o, lazim o ma uca ra tepîşê û raşt kerê. Ewro çewtî ha ziwanê kurdî de û beledîye zî uca ra girewto û raşt kerdo."

Dima derheqê xeberdayîşê babeta xo de yew şema pêşkêşê goştaritoxan kerde û babeta qalanê xo rêz kerde. Dima zî ê mewlidê ke hetanî ewro ameyê nuştîş derheqê înan de fikrê xo va: "Kelîmeya mewlidî, bîyayîşê Hezretî Muhemedî e.w.s o. Edetê nuştîşê mewlidî 1000 serr ver ra mîyanê misilmanan de esto. . . Mewlidê Melayê Batî zî mîyanê kurdan de meşhur o. Wexto ke mewlidê kirmanckî (zazakî) nêamebi nuştîş no mewlidê Batî, mîyanê kirmancan (zazayan) de zî ameyo wendiş. Zaf erey bo zî şeş-hewt mewlidî bi kirmanckî ameyê nuştîş. Mewlidê Ehmedê Xasî hem mewlidê ma yo tewr verên o û hem zî tewr hîra yo. . . Etya de meselê ma naskerdişê Hezretî Muhemedî yo. . . Vatê mewlidan vatê qelb û eşqan o. meselê mewlidî meselê zerrî ya meselê dilî ya. . . Yew sofî wexto ke dest eşt pey goşê xo yew nêşkeno ey ra naz û mubelaxa tepîşo. Naz û mubelaxa karê aşiqan o. . . Melayê Xasî wexto behsê Hesên û Husênî kerd, mewlidê ey metih bi. Ma zereyê felsefê Xasî de arif û aşiqan vînenê."

M. Heylanî, dima behsê mewlidê Xasî kerd û namê 13 mebhesanê mewlidê ey hûmarit. Mewlidê Xasî ra babeta qeleme ser o vindert û va: "Ma eşkenî vajî mewlidê Xasî de îsapatk-

erdişê qeleme esto. No mewlid nê rayîrî ser o eserêko tena yo. Bi lehçeya kirdkî ameyo nuştîş û vengê mewlidî vengêko xerîb û newe yo. Rîyê nînan ra ma eşkenî vajî Mewlidê kirdkî moneno çîmanê hûrîyan. . ." Dima zî derheqê nê mebhesan de kilm-kilm agahî dê.

Dewam kerd, wina va: "Mela Ehmedê Xasî bi manaya bîsmîllah mewlidê xo akeno. No xusus ma mewlidê bînan de ca nêkerd. Ma tena mewlidê Xasî de vînenî. Melayê Xasî tay behsî Melayê Cizîrî ra girewtî. Gere ma gurê xo bi qeleme bikerî. . . Miletê ma zaf bi qeleme meşxul nîyo. Aye ra ziwanê ma xorî nêbiyo û aver nêşîyo. Xasî yew eser ardo meydon ma eşkenî ey ra feyz bigîrî. . ." Û pesndayîşê qeleme ser o çend beytî wendî.

Dima va: "Tesbîtê ma gore, çend mewlidî kirdkî yê ke yê Mela Ehmedê Xasî ra dima nusîyê tesîrê înan lokal bî. Mavajî mewlidê Usman Efendîye Babijî derûdorê sêwregî de yeno şînasnayîş labelê derûdorê Çewlîgî de nîno şînasnayîş. Mewlidê Xasî heme min-tiqayan de ameyo wendiş û mela zî mewlidê xo reyde ameyo şînasnayîş."

Peynî de zî va: "Mileto kurd biwazo zî nêşkeno irqçîtî bikerî. . ."

M. Heylanî ra dima Mela Mehemedê Kavari, Mela Ehmedê xasî ra û Mela Usman Efendîye Babijî ra qasî vîst beytî wendî. Gama dore amîye wendişê mewlidê Esat Usman Efendîye Babijî ser o, panelistî derheqê nuştîş û çapkerdişê mewlidê Usman Efendî ra, tay agahî day goştaritoxan.

Peynî de, tayê goşdaritoxan persî pers kerdî. Goştaritoxan ra torna Mela Ehmedê Xasî zî heqê qale girewt û keyfweşîya xo îfade kerde. Bi çepikan peynîya panele amê.

Ey kurdên şêr ên ku di dema cîhangîriya Asurî û Keyaniyan de pêşdar û leşkerên wan ên qehreman bûn! Bes e, hûn pêncsed sal e razan. Êdî hişyar bin, sibeh e. Yan na wehşet û xeflet di çolistanên wehşetê de dê we perîşan bikin.

Hîkmeta îlahî ya ku damezrînerê qanûnên nûranî yê îlahî ye wek makîneya nîzama alemê û wek tîlên telgirafê dirêjî hemû alemê

Derencam

*Ez di vir de ji hevregêzên xwe
re çend gotinan nebêjim behs
netemam dimîne**

Bediuzzaman SEÎDÊ KURDÎ


bûye û li ser hemû alemê dabeş bûye ji asoyên ezel de pêçiya qederê bilind kiriye û li we ferman dike:

Wê hemiyet û hêza we ya ku bi tefrîqayê wek ava ku dilop bi dilop ziwa bûye bi fikra miliyetê re bikin yek, wek cazîbeya cuziya zerreyan cazîbeyeke umûmî ya milî çêbikin her wiha girseya mezin a wek kurd mîna stêrkeke ronîdar li dora roja mezin a Îslamî û Ûsmanî bizivirînin û bi îtibaya vê cazîbeyê muwazene û ahenga umûmî biparêzin.

Hem jî azadiya ku mîna çiyayên Sîpan û Agiriyê ye, li serê lutkeyê çiyayê paşerojê* rabûye piyan; ketina bin esereta nefsê qedexe dike û destûr nade êrîş li kesekî bê kirin. Ew sultanê azadiyê ku xwe spartiyê şerîetê, bi dengê bilind bi qewmekî mîna we ku di newalên herî kûr ên pêşerojê de xafil û belawela mane ferman dike: Ji bo êrîşbirina ser nezanî û xizaniyê dest bavêjin fen û huner û çek, herne pêş!

Hem jî heqîqeta ku wek muxbîrê rastiyan, bi rakirin û mehfkirina tebeqeya zordestiyê û bi sivikbûna tebeqeya nezanî û xefletê ku li ser pêlê wî ye ji bin tebeqeyên veşartî û girtî rabûye û ji her aliyê ve xeber dide we û dibêje: Ew îstîdada ku bi destê qederê di mahiyeta we de hatiye raçandin û ew taybetmendiyên we yê ku di mahiyeta qewmî ya we de hatiye veşartin û paşeroja we derdixe meydana bi ava heyatê ya perwerdeyê av bidin. Yan na, ya dê hişk bibe yan jî dê pûç bibe û biçê.

Hem jî îhtiyaca ku bavê medeniyetê ye û damezrînerê pêşketinê ye destê sîleya xwe ra-



kiriye û bi hukm ji we re dibêje: Ya hûn ê jiyan û azadiya xwe di vê çolistana wehşetê de bidin talanê ya jî di meydana medeniyetê de hûn ê li şîmendîfer û balona fen û hunerê siwar bibin û paşerojê pêşwazî bikin û wan demên jidestçûyî hûn ê bi dest bixin û ber bi kabeya kemalatê ve bazdin.

Hem jî miliyeta we ku wek malbetekê, di newalên pêşerojê û çolistanan niha û çiyayên paşerojê de di bin konekî de bi rûniştvan û qehremanên dahî yê wek Rustemê Zal û Selehedînê Eyûbî pêk hatiye û ew fikra milî ku her kesî bi heysiyet û şerefa yê din bişeref dike û kakila hîsiyatên bilind e, bi fermaneke qetî li we ferman dike: Her kesek ji we bila bibe wargeha jiyanê ya hemû milletê û bila bibe parêzvanê kamraniya milletê û bila bibe nîmûneyeke biçûk a hemû milletê. Belkî ne mîna şexsekî niha, hûn ê bi qasî miletekî mezin bibin. Lewra armanca mirov çiqas mezin bibe xîreta mirov jî pê re mezin dibe. û bi serhildana hemiyeta milî exlaqê mirov jî kamil û bilind dibe.

Hem jî meşrûtiyeta ku sebebê saadeta qewman e û meşrûtiyeta meşrûaya ku bi peydakirina serweriya milletê, cuzî îradeya ku buhara makîneya jiyanê ye ji vemirandina tehekuma zordestiyê rizgar kiriye, bi haveynê meşwereta şerî daye haveynkirin we dawetî meclîsa îmtîhanê dike. Dixwaze bibîne ku hûn

gihîştine salê buluxê û pêdiviya we bi wese-yeta kesên din nemaye. Xwe ji bo îmtîhanê amade bikin. Hebûna xwe bi yekîtiya xwe nîşan bidin. Bi hemiyeta xwe ya milî fikr û wijdana xwe ya şexsî wek qelb û eqilê muşterek ê mileta xwe nîşan bidin. An na di şûna bawernameya azadiyê de hûn ê sifirekê bi dest bixin.

Belê, ew meyla axatî û fikra xweseriyê û enaniyeta we ya ku di çolistanên pêşerojê de bû sebebê tevliheviya we, ji niha pê ve di saadet sareya medeniyeta paşerojê de dê vegere ser fikra îcadê û teşebbusa şexsî û fikra azadiyê. Heta ez dikarim bibêjim ku li hember medreseyên bédeng ên xelkên din medreseyên we yên biqîr mîna meclîsa mebûsan a îlmî ye. Û bi xwedîna fatîheya li pey îmam, bi vizvîzên asîmanî û ruhanîyên we, qeder îma û îşaret dike ku di mahiyeta qewm û medrese û mezhebê we de îstîdada meşrûtiyetê heye. “We en leyse lîl însanî illa ma sa’e” Ev ayet mirovan han dide bo teşebbusa şexsî.

Hem jî cesaret û namûsa milî ya ku parêzvan û damezrînerê hemû kemalatan e ferman dike: Çawa ku heta aniha we ji hiş bo dil rêyek vekir, we eqil bi hêzê têkel kir, her wiha çawa we bi devê tûj ê şûrê xwe zanîna xwe pêk hanî û hûn di wêrekiya madî de pêşve çûn; niha jî ji dil bo fikirê pencereyekê vekin, hêzê bişeyînin hawara eqil û hîsiyatê têxin pey fikrê, ta ku di meydana wêrekiya eqilî ya medenî de namûsa milî paymal nebe. Divê hûn şûrê xwe ji cewhera fen û hunerê çêbikin.

Hem jî zimanê zikmakî ku makesa tîrêjên hestên milî ye û dara berhemên edebî ye û coya ava heyatê ya perwerdeyê ye û pîvana edaleta qîmet û tekemula me ye û bi vekirina pencereyekê li beramber wijdana her kesî rasterast wekî qevda tîrêjan bandor çêdike. Zimanê we ku hinek şaxên wî hatine kutandin û tê de tevlihevî çêbûye her çend wek dara tûbayê mustaîdê teceliyê ye, ji ber ku wisa ziwa û perîşan maye, ji edebiyatê ku zimanê medeniyetê ye paşve maye, zimanê we bi zimanê gazincan we bi hemiyeta milî ya we gilî dike.

Di mirov de mohra qederê ziman e. Sûreta mirovahiyê di nav rûpelê ziman de xweşik û

ciwan xuya dibe. Zimanê zikmakî ji ber ku siruştî ye gotin bê zehmetî têne hişê mirov. Danûstendin tenê bi wateyê re dibe, ji ber wî hiş belawela nabe û tiştên ku mirov bi zimanê zikmakî fêr bibe wek nivîsa ku li ser berekî hatibe nexşkirin mayinde dibe. Û bi kirasê zimanê milî her çi xuya be bi mirov xweş tê. Va ye ez nimûneyeke ji hemiyeta milî pêşkêşî we dikim ku ew jî Xelîl Xeyalî Efendiyê Motkî ye. Weku di her şaxên hemiyeta milî de, di warê ziman de jî pêşevanî bi dest xistiye. Û bingeha zimanê me bi “elîfbêtk” û “serf û neh”a (rêziman) xwe daniye. Û heta ez dikarim bibêjim: Esra hemiyetê û xîret û fedakarî û parêzvaniya hejaran ketine nav hevûdu û wicûda wî ya manewî danîne. Bi rastî jî di jêderên Kurdistanê de bi rasthatina cewhera hemiyeteke wisa û cewherên mîna wî hêviyê dibexşînin û de paşeroja me ronî bikin.

Va ye vî ciwamêrî nimûneya hemiyetê nîşan daye ku hêjayê li pey çûnê ye û bingehek daniye bo zimanê me yê ku muhtacê tekemulê ye. Ez tawsiye dikim ku ehlê hemiyetê li pey berhemên wî biçin û li ser bingeha wî tiştên nû deynin.

(Wergêr: Zilkîf XWEŞHÊVÎ)

*Ev gotar li dawîya pirtûka “Îkî Mekteb-i Musibetin Şehadetnamesi” de hatiye bicikirin. Binêrin: İçtimai Dersler, Weşanên Zehrâyê, Rûpela 188 - 191’an.

*Di vê gotarê de pêşeroj di wateya “mazi”yê de paşeroj jî di wateya “mustaqbel”ê de hatiye bikaranîn.

MALBARKIRIN: Koçer ji meha nîsanê û pê de dest bi kar û barên malbarbarkirinê (kon, cil, pez, dewar û hemû navmal) dikin. Li gor mezinahiya malê û pîrbûna navmalê (firax, zad, nivîn, ben û werîs û hwd.) dewarên hespîn, ango hesp, mehîn û hêstir (qantir), ker dewarên reş, (ga, gamêş, çêlek û hwd) peyda dikirin û li gor hemû amûr û alavên malê rabikin tîrên cilan, ên eyaran, ên firaxan û yên din temam dikirin û tu kêmasî nedihîştin.

Bi amadekariya 4, 5 mehan a cilan, qût, firax, kurtan û pêdiviyên heywanan, ên meşk û şîraran û hemû hewcedariyên koçertiyê pêk

Ferhenga koçe- riyê -||-

Bahadîn ROBAR

dianîn û axê eşîrê an jî rûspiyeke eşîrê biryar digirt dê mal filan rojê bar bikin û ber bi zozanan ve biçin.

Roja ku bibêjin sibê dê mal bar bikin hê êvarî gel konên xwe berdidan (vedikirin xwarê) û dipêçan. Stûn û singên kon jî di nava pêçaka kon de dihat pêçandin. Axlebê firax dixistin têrekî, jixwe ard, savar, zadên din û hwd. her yek dixistin têreke din (têr dualî ne), cilên malbatê dixistin têra herî xweşik a nexşkirî û gilovandkirî. Heger ew mal malmezinek bûya hespekî kihêl an jî rewan bi zîn û mehrek dikirin û zîlamê malê lê siwar dibûn. Kon jî li hêstireke zexim dikirin û zerikeke xwarinçêkirinê wek serbar didanîn ser barê wê. Her têrek li dewarekî bar dikirin û hin koçeran çêlek û ga jî bar dikirin. Lê belê barên herî sivik li wan bar dikirin. Hema hema her malekê kerek an jî du sê ker hebûn. Bêhtirîn ker di nav pêz de alavên şivanan lê dihat barkirin û her dem bi pêz re bûn. Heger kerên malê zêde bûna dihiştin nav garanê û dema malbarkirinê barek sivik li wî jî dikirin.

Malbarkirinê di dema nimêja sibehî de dest pê dikir û ewilî ker û çêlek dihatin barkirin û li benda dewarên din nedihîştin û jî her malekê kesek duyan ew ker û çêlekên barkirî ber bi warê ku dê mal biçinê ve dibirin. Sedema vê yekê jî ew bû ker û çêlekan nedikarîn weke dewarên din bimeşin. Ji ber vê yekê ker û çêlekên xwe hê zû bi rê dixistin. Piştî ker û çêlek dihatin barkirin û birêkîrin dor digihiya dewarên hespîn, her dewarekî têrek lê bar dikirin û serbarek (ji bilî têrê tiştê ku li ser barê dewaran hatiye barkirin) jî didanîn ser barê wê û bi werîsên heçîkirî dihatin şidandin û girêdan.

Têrek nîvco li dewareke miskîn bar dikirin û heger hebûna her cemêkî (her aliyekî têrê) têrê zarokek ku nikare bi rê de biçê (bimeşe) dixistinê û yeke piçekî mezintir (6, 7 salî) li pişt zarokên ku di têrê de ne siwar dikirin û diya zarokan hevsarê wê dewarê dikişand. Ev kar hemû malên ku li zomê (konên ku mîna gundekî kes tê de dijîn) ne dikirin û bi vî awayî malan ji cihekî koç dikirin cihekî din. Her qonaxek li derdorê 15, 20km'yî bûn. Wexta nişûv û evraz diketin pêşiya rêzê serkêşê rêzê hê ne gihayî nişûvî an jî evrazî li deverê erdê wê rast rista malan a ku barkirî ye disekinand û her kesî barê dewarên xwe ji nû ve dişidandin û asê dikirin da ku barê dewarên wan li ser stû û bi ser paşiyê de neçe û nekeve. Bi vî lewnî mal digiyan warekî din.

Pezê xwe jî beriya malbarkirinê bi rojekê ber bi warê nû ve dibirin û heta mal digihiyan waran pêz jî digihiya waran. Dema rêza dewarên barkirî diket pey hev û dimeşiya hêjayî dîtîne bû. Malbarkirina koçeran a ji ciyekî ber bi ciyekî din ve bi vî awayî dihat kirin û 15, 20 rojan dom dikir. Di vegera ji zozanan de jî bi vî lewnî û bi van rêbazan dihat kirin.

FIRAR: Hemû cureyên spîtayiyê (ji şîr) yên hatine meyndin ango bûne penêr û cureyên weke penêr ên ji bo zivistanê tên hilandin û dixin eyar û derfan piştê jî wan derf û eyaran dixin têrên (bi ristina hiriya ku bûye ta û piştê bi riya tevne hatiye honandin û weke du tûrên herî mezin li hev û din ve bête dirûtin derê wan vekirî dimîne hemû cure alavên weke cil, xwarin, penêr û hwd. dikare bikevinê.) eyaran ji berî ku mal ji zozanan bar bikin bi awayekî karwanî hemû koçerên ku li zozanan cureyên penêr hilberandine dibin deverê ku tirimbêl (erebe, maşîn) bikaribin biçinê. Devera ku dê tirimbêl bikaribin biçinê û bi niştecihên wê re lihevhatin çêkirine, niştecihên wê derê bi berdêla pereyan xwedaniyê li wan eyaran dikin heta koçer qonax bi qonax xwe digihînin deştê. Navê vî kar û xebata hilanîn, birin û anîna eyaran li gor koçeran firar e. Kesên ku têrên eyaran ango firar radestî wan hatiye kirin berpirsiyar in ku wan eyaran her deh rojan carekê li ser aliyekî biqulibînin aliyê din da ku li ser yek aliyê xwe nerize.

Bi vî awayî koçeran di dema vegeê de barên dewarên xwe sivik dikirin û xwe amade dikirin. Piştî bicihkirina firaran koçeran hemû danûstendinên xwe yên li derdorê di ber çavan re derbas dikirin kêr û kasên xwe temam dikirin û vê carê jî ber bi deştê ve bar dikirin. Çawa ku zorbela diçûn zozanan dîsa ew qas zehmet û zorî diditin heta ku vedigeriyan deştê. Piştî digihan deştê jî eşîrê çend zîlam bi riya tirimbêlan diçûn devera ku firarên wan lê mane û tirimbêlên ku kirê kirine bar dikirin û dibirin wargehên xwe yên zivistanî ango dibirin deştê û heta dera ku tirimbêl bikaribûya biçûyanê didanîn xwarê û xwediyê firaran bi dewaran firarên xwe dibirin malên xwe.

QAJIKÇINÎN (Benîştçêkirin): Qajikçinîn ji bo koçeran ne karekî ji rêzê bû, ango karekî taybet û bicoş bû. Qajikên ku behsa qan tê kirin ji kerengên zozanan ên ku jê re kerengzer dihatin gotin dihatin çêkirin. Kerengzer jî cureyekî kerengên zozanan ên di destpêka biharê de şîn dibûn û axlebê li deverên bilind û li qûntara çiyayan şîn dibûn. Rengê wan zer û bejna wan heta pêncî şêst santîman dirêj dibûn û kurs didan, ango li ser yek rayê dikarîn çend kerengzer ajir bide û şîn bibe. Ev cureyê kerengan dihatin xwarin û tehmek pir xweş û şîrîn jê dihat. Qajik yanê benîşt jî vî cure kerengî dihat çêkirin. Kesên ku dixwestin qajikan çêbikin kolinek (tevrê du serî) dibir û diçû ciyê ku ew cure kereng lê hene.

Du cure kerengzer hebûn, yek nêr û yek jî mê bû. Ji kerengzerê nêr qajik çênabin jî ber ku şîrê wî cure kerengzerî tehl bû. Tenê kêrî tov dihat. Lê yê mê şitil nedida û hema li erdê dima, bê tov bû û şîrê wê pir û şîrîn bû. Qajikçin jî, ev baş nas dikirin û yên mê dikolan û heta 15, 20 santim dora rayê kerengê vedimalîn û kerengê ku sererdî ne jê dikirin û ax didan dora raya ku mayiye valahiyê de heta ku tijî ax bibe û di bin axê de winda bibe. Ji wî karî re tirşkirin dihat gotin. Piştî karê kolan û tirşkirinê diqediya roja din qajikçin yanê kesê wî karî dikin hinek axa spî ya taybet peyda dikirin û ew ax li bêjîngê dikirin û axa ku binbêjîng bûye tijî çelteyekî jî wê axê, tevî kêreke tûj û kevçiyekî darîn an jî bafon gel xwe dibir-

rin û diçûn çinînê ango birîna qajikan. Dema diçûn ciyê kerengzeran ewil ew axa ku danîne ser rayan derdixistin û xweşik paqij dikirin heta ku rayê kerengzer baş derbikeve, tijî kevçiyekî ew axa spî ya ku bi xwe re anîne li ber binê rayê radixistin û xweşik tekûz dikirin û ew kêra ku li gor dilê xwe bi hesanan hêsûne pê rayê kerengê santîmekî jî zemîna erdê bilind dihat birîn û ew şîrê ku jê dihat dirijîya ser wê axa spî û dima welê heta hişk dibû û rojekê piştî dîsa ew ra di binî re serbijêr dibirî û dîsa ew şîr diherikî rex şîrê ku berê li wê derê hişk bûye. Her du caran şîr dibû yek cûm (qursika qajikî) û hevûdin digirtin. Rojekê ew şîrê ku ji raya kerengzerê hatiye dima dibû qajik û piştî qajikçin diçû ew qajik hemû radikirin.

Her piçeka qajikî bi qasî serê kevçiyê xwarinê mezin dihat. Bi vî rengî hin qajikçinan 200, 300 heta 500 qajik çêdikirin. Ev cure qajikê koçeran çêdikirin di nava gel de weke qajikê esîl dihat binavkirin. Ji her qajikekî re cûm an jî qursik dihat gotin.

CEJN: Cejn li koçertiyê xwediyê wateyeke girîng û payebilind e. Ji ber ku koçerên li herêmê tevahî ji ola îslamê bûn û girêdana wan a olî bibawerî û diwariyeke xurt bû. Lê zanîna koçeran a di der barê olî de ne ew qas pêşketî bû. Kêr kesên koçeran perwerdehiya olî diditin. Ji bo vê yekê jî mela û ulemayên koçeran di asta herî kêr de bûn. Koçeran ev kêmasiya xwe bi anîna melayên ji derveyî eşîrê temam dikirin. Sedema nexwendebûna koçeran jî ji ber karûbarên wan ên zêde û ne niştasihê warekî bûn.

Wextê cejn nêzîk dibû heyecaneke pir mezin diket nav koçeran, bi taybetî jî diket nav zarokan. Jixwe pezê koçeran zehf bû, hinan roja erîfê hinan jî di roja cejnê de pezek zexm û qelew serjê dikirin, hinan dipijandin û gazî zîlamên zomê dikirin bi hev re dixwarin, hinan jî hê xav dişandin ji kesên ku pez serjê nekirine re. Cur be cur xwarin ji goştî çêdikirin.

Nimêja cejnê bi tavê re dest pê dikir û kesên tevlî nimêjê dibûn kêr bûn ji ber ku hin şivan bûn hin gavan bûn hin berxvan bûn.

Karê koçeran ne wek ê bajariyan dikan û karxane bûn hema derê dikana xwe bigirin û biçin nimêja cejnê.

Roja cejnê hê serê sibehê bi tavderketinê re zarokên koçeran radibûn û li nava zomê li cejnê digeriyan, lê gera zarokan ne ji ber ku bêriya xizmên xwe kirine zêdetirîn ji ber şekirok û xemîrokan ji xwe re berhev bikin diçûn destê mezinên xwe maçî dikirin. Lê mixabin koçeran xemîrok û şekirok kêr didan zarokan, sedema vê yeke jî ji ber ku bajar pir dûr bûn û peydakirina xemîrok û şekirokan zehmet bû para gelek koçeran di şûna xemîrok û şekirokan de nokên kelandî, hêjîrên hişk, mewîj, goz (gûz) û hwd. didan zarokan. Jixwe cejna koçeran ji bo zarokan danek, ji bo mezinan jî rojek bû.

Cilkirîn ne ew qas girîng bû hema çî cilên wan ên di boxçikan de hilandî hebûna spehî dişûştin û werdigirtin. Yên cilên wan ên hilandî tune bûna cilên xwe yê kevî û qetiyayî pîne dikirin û werdigirtin. Roja duduyê cejnê jî jin diçûn malbavê û mala bavê wan jî ji wan re xelatên cur be cur dikirîn û dilê wan xweş dikirin.

KODE: Kirêkirina çêreya erdê zozanan an jî koza ku zivistanan wek îmê pêz bi pêz tê çêrandin a xwediyê kerî û garan a demsalane ye. Kodekirin bi riya rûspî an jî axayê eşîrê yê ku xwediyê kerî û celeban in bi xwediyê çêregeh, zozan û kozan re tê pêkanîn, tê kirin. Li gor mezinahî, bijonî (têrçêre), rihetiya erdê ku tê kodekirin heqê kodê tê diyarkirin û ji ber pereyan de jî li gor hesabê tekûz pez tê dayîn. Her zozanekî ku ji aliyê koçeran ve tê kodekirin nêzikî 20, 25 keriyên her yekî jî 500 heta 1000 pezan û ji garaneke mezin pêk tê. Kodeya ku ji aliyê koçeran ve dihat dayîn ji aliyê eşîr an jî eşîrên ku xwediyê erdê ne ve dihat parvekirin. Ev kar li deşt û zozanan bi heman rêbazê dihat kirin lê li deştê zom belav dibûn û her du, sê malan li gundekî ji ajalên xwe re koz, zevî û çêregeh kode dikirin.

BI ÇAVÊ MÊRAN JIN BI ÇAVÊ JINAN MÊR: Di koçertiyê de karê jin û mêran ji hev cuda bûn û di heman demê de ne mêran karê jinan dikirin ne jî jinan karê mêran dikirin.

Jixwe dema mêrekî qaşo karê jinekî bikira dê cihê wî li wê zomê nemabûya. Li gor edet û kevneşopiyên bav û kalan karê jinan zarokanîn, xwarinçêkirin, cilşûştin, firaxşûştin, îm û alifdayîna ajalan, kox û gov, kozik û axur paqijkirin hwd. bûn. Karê mêran jî şivanî, gavanî, cotkirin, kirîn û firotin, reîstiya (malxwê) malê û hemû biryarên ji pêşeroj û paşeroja malbatê bûn. Qedera jinan hema hema bêje hemû di destê mêran de bû. Mêrekî bixwesta keça xwe bide kê ne diya keçê ne jî keçikê bi xwe nedikarî li pêşberî vê biryarê derbikeve û bibêje erê an jî na. Dema jinek li pêşberî biryara zilamê xwe an jî zilamekî ji malbatê derbikeve wey li halê wê jinê. Zilamî bi daran, bi kêzman (darê bi qasî metroyekî û ser û bin mîna hev) bi gobalan li wan dixistin û cur be cur wesle wan dişkênandin. Ew jina ku lêdan dixwar li ber çavê êlê kêr diket û mîr jî li ber çavê mêrên weke xwe de payebilind dibû.

Wexta mêrekî bixwesta ji mêrekî din re bibêje tu pîsemêr î, newêrek î an jî derewker î, digot tu ji jina xwe pîstir î, an jî digot tu weke jinekê dev biçewçew î. An jî dema mêrekî îdîayekê bi axaviya digot heçî filan tiştî bi vî awayî neke ji jina xwe xerabtir be. Gotinên jina çiqas di cih de bûna û çiqas rast û binirx û pêwîst bûna jî dawîya dawîn digotin ma em ê bi gotina jîniyê beaqil bikin. Bila karê ku ne karê wê be neke û mêran rezil û riswa neke, şûnve xelkê derbarê me de bêje filankes bi ya jina xwe kir. Heger hin kesan bixwestina bi gotina jinekê bikin jî ji tirsê gotegotan nediwêribûn bi ya wan bikin.

DERAV: Di jiyana koçertiyê de ji ber ku mirov di konan de dijîyan, ne serşo û ne jî ji bo şûştinê ava germ hebû. Mirovan zêde pêwîstî jî bi şûştinê tune bûn. Heftiyek du heftiyên carekê dayikan cilên ku rêvîn bûne berhev dikirin û tevahiya roja xwe jî şûştinê û veşûştinê re vediqetandin. Wê rojê dayikê zarokên xwe şîret dikir da ku bi tu deveran ve neçin û xwe ji malê dûr nexin. Roja ku dê derav bê kirin hê serê sibehê bi dema pezdotinê re dayik diçû doleke avê ya ku ji zomê nependî. Zerik, qûçxane, teşt û alavên avgermkirinê ên din bi xwe re dibirin. Li ber aveka ku diherike li ciyekî rast û tekûz kuçikekî (tifik) çêdikin û zerika xwe di-

danin ser wê kuçikê û tijî av dikin û di bin de êgir pêdixin. Dema av germ dibe dayik ewil serê zarokên xwe yeko yeko dişo û cilên wan ên rêvin ji wan dike û destek cilên paqij li wan dike. Dema serşûştina zarokan diqediya zarok diçûn malê dest bi karûbarên xwe yên rojane dikirin û dayikê jî dest bi cilşûştinê dikir. Cil welê hêsanî nediqediyan ji ber ku ew cil yên du sê hefteyan bûn û pir biqirêj bûn. Tenê ne malbatekê an jî jinekê ji êlê, şeş heft malbatan bi hev re biryar digirtin û bi hev re diçûn dera-viyê (balavî, cilşûştin). Piştî cilşûştin diqedan-din jinan li wê derê xwe ji hev re dikirin hemet (parastina bedenê ji dîtînê, nixumandin) û xwe jî dişûştin.

Dema ku jinan balavî dikirin ji zarokan yekî/ê li deverêke bilind a ku li pêşberî dera-viyan xuya dikir notirvanî (nobedarî) dikir da ku tu kes bi taybetî jî tu zilam di wir re neşin û jinan di dema bê hemet de nebînin.

Roja deravê rojê wek a cejnêkê ya wê malbatê bû. Lê zilaman ango mêran kêman caran xwe bi ava germ dişûştin. Dema zilam gemarî dibûn hema li ku deverê aveke ku di-herike bidîtina xwe dixistin û bi vî awayî xwe dişûştin, carina sabûn jî bi xwe nedidan.

TÊKILIYÊN DI NAVBERA EŞÎRAN DE:

Li gor min di nav hemû qewm, millet û nija-dên li cîhanê dijîn de yên ku herî zêde li kev-neşopî û edetên bav û kalan xwedî derdikevin eşîrên koçeran in. Ew kevneşopî çî qenc û çî xirab be jî bo eşîra ne gelek girîng e û edetên eşîran jî bo wan zagona herî bingeşîn e. Mînak: Wexta endamê eşîrê bi devoka eşîreke din biaxive li gor eşîra xwe eybeke pir mezin dike. Eşîr çiqas xwedî hejmareke mezin be bila bibe bi rêzê ve endamê malê, pismam û pisê pismaman, bavik (babik) eşîr û eşîrên yekra, (yek kok) lêzim û wek birayê hev dihatin qe-bûlkin an jî welê diviyabû. Kî li kîjan deverê bi yek endamê eşîrê re pevbiçûya jî wê eşîrê kî li wê derê be dê alîkariyê bidaba yê ku en-damê eşîra wî/ê ye û wî kesî qet pêwîstiya ka ev şer ji ber çî ye û kî mafdar e kî neheq e ne-didît. Dema endamê eşîrê be mafê her kesî heye ku li yê ne endamê eşîrê ye bixe. Heger lê nexê jî di nava eşîrê de kesê herî tirsonek ew

kes e. Kurtasî endamên eşîrê mecbûr bûn ku piştevaniya hevûdin bikin.

Eşîrên koçer di dema çûna zozanan de di ser koz û zeviyên eşîrên niştecih re derbas dibûn û di vê derbasbûyînê de koz, zevî û çê-regêhên wan dihatin çêrandin û ev jî dibû se-dema şer û pevçûnê. Bi taybetî eşîrê sertixûbên hev gelek caran şer dikirin û van şeran bi salan dom dikirin û di encama van şeran de bi dehan kes dimiriyan û birîndar dibûn. Terş û talanên hev dibirin û hevûdin li ber çavê civakê rezîl û riswa dikirin. Hemû eşîran xwe ji eşîrên din mezintir, wêrektir, za-natir, dewlementir û pêşengtir didîtin.

Kêman caran eşîran keç didan hev ew jî bi awayê berdêlê çêdikirin ango keçek didan ku-rekî wan, wan jî keça xwe didan kurê wê eşîra din. Ji bilî berdêlê hema hema tu kesî keç ne-dida endamên eşîrên biyanî. Lê gava eşîrek diket tengasiyê eşîrên din ji bo navê xwe mezin û bilind bikin çî alîkariya jî wan bihata dikirin.

LEYÎSTOK:

Qilanê: Li koçertiyê (qîl) gog ji kincên ku kevn in dihat çêkirin. Gog di navbera du koman de dihat lîstin. Ji her du koman komek sersêrek yek jî binsêrek bû. Ji koma ku sersê-rek bû du kesan yekî qîl (gog) li ber yê din bi-lind dikir û yê din jî bi çovê (darê gogê) ku di destê wî de ye lê dixist û heta jê bihata dûr diavêt. Wexta gog li hewa jî aliyê koma din ve bihata girtin hejmarek bi dest dixistin û ew kom sersêrek dibûn koma din binsêrek dibû. Lê ger qîl li erdê biketa koma ku binsêrek e qîl li koma ku sersêrek wer dikir û dema qîl jî komê li yekî biketa koman ciyê xwe diguher-tin. Lê ger li wan neketa koma ku sersêrek e sersêrekiya xwe dewam dikir û hejmarek qe-zenc dikir. Lîstikê bi vî awayî dom dikir.

Berdeqê: Ev leyîstik li deverêke rast û tekûz jî aliyê du komên lîstikvan ve tê lîstin. Ekîbekê lîstikvanekî xwe weke bûkê bi nav dikir û heta ew lîstikvan li ser yek lingê derbasî aliyê din bibûna berdewan dikir.

Her du koman ewil cilên xwe ji xwe dixistin û tenê pişjeme li xwe dihiştin û piyê xwe yê cepê

bi destê xwe yê rastê şûnve digirtin û bi destê çepê hevûdin dehf didan heta ku aliyekî aliyê din hemû bixistina xwarê û destê wan ji piyê wan vebûna û listikvanê ku qaşo bûk e ji aliyê xwe derbasî aliyê din bibûya dom dikir û bi vî awayî aliyekî zafera xwe îlan dikir.

Birgê: Birgê ji aliyê du komên wekhev ve li qadeke rast û tekûz dihat listin. Komek sersêrek yek ji bînsêrek bû, ya sersêrek li dora kevîrekî mezin ê ku ji aliyê listikvanan ve hatiye danîn kom dibûn û koma bînsêrek jî li derdorê belav dibûn. Piştî çend deqîqeyan koma ku li ber sêrek li koma din digeriya û destê xwe li kîjanî ji wan bidana ew ji listikê diket. Lê dema ji koma belavbûyî yekî xwe bigihanda sêrek hê kesî destê xwe lênedaya bi dengê digot birkêêê û destê xwe li sêrek dixist û hema yekî jî ji koma bînsêrek destê xwe li sêrek bixista koman ciyê xwe vediguhertin ê ku destê xwe li sêrek dane hejmarek qezenc dikirin. Lê ger ji koma bînsêrek tu kesî destê xwe li sêrek neda hejmar ji koma sersêrek re dihat hesabandin.

Kêlanê: Ev listik ji aliyê du koman ve bi keviran dihat listin. Her komek ji du kesan heta deh, duwanzdeh kesan pêk dihat. Her komekê li aliyê xwe sê kevirên bi qasî pêlaveke mezinan dirêj û pehn û bi qasî 30, 35 metroyan (jê re kêl dihat gotin) ji hev dûr vedigirtin û bi dorê ji komê her yekî kevîrek dadanî kêlan. Heçî kevir li kêlekî bixista mafê avêtina kevîrekî din jî bi dest dixist. Dema aliyekî dora xwe diqedand dor digihiya aliyê din û wan jî heman tişt dikirin. Xistina kêlekî mafê avêtina kevîrekî, ya du kêlan mafê avêtina du kevîrên zêde bi dest dixist. Bi vî awayî kîjan aliyî beriya aliyê din sê caran her sê kêlên koma pêşber bixista ew bi ser diketin. Carina bi şert dileyîstin û her hejmarekê cilên yekî jê dixistin heta carinan tenê derpê kurt lê dima ango tazî dikirin. Carinan jî koma serkeftî pêdiberdan koma têkçûyî û kîjan ji wan hê negihîyayî aliyê pêşber bigirtina li gor listikê dikirin bûk û ew dianîn aliyê xwe. Carinan jî aliyekî bi vî rêbazê aliyê din hemû dianîn aliyê xwe û listik diqediya.

Kabanê: Ev listik bi kabên pez û dewaran

(ajal) û di navbera çend kom an jî kesan de tê listin. Her listikvanekî bi dehan kabên wî hene. Kesên ku dê bilîzin hin kuçan weke tifika êgir didin dora hev û navê wê weke “haçik” lê dikin. Her listikvanekî kab jî dûrî haçikê 10,12 metroyan rêz dikirin û kabên xwe yên taybet ê her du aliyên wî bi qîrê û risasan tijîkirî û bûyî xwediyê giraniyekî û jê re deq dihat gotin ji rexa kabên rêzkirî diavêtin nava haçikê. Heçiyê deqê wan diçû dawîya haçikê ew dibû yekemînê listikê û cara yekem wî deq diavêt kabên ku rêzkirî ne. Deqê wî li çend kaban biketa ew digiyan wî û careke din jî mafê listinê bi dest dixist xwe li deverê ewle bi cih dikir. Bi dorê hemû listikvanan deqên xwe diavêtin kabên ku ji rêza kaban mane. Yê ku piştî dilîze deqê xwe li deqê kê bida ew kabên ku berê wî birine digihiya yê ku deqê xwe li deqê li yê din dayî û ew ji listikê jî diket. Bi vî awayî dihat listin heta ku yekî hemû listikvan ji listikê dixist dom dikir. Kabên ku hatibûn rêzkerin digihêne kesê maye dawiyê yê ku tu kesî deqê xwe li deqê wî nexistiye. Ev listik dubare bi dubare tê listin.

Bi dehan listikên koçeran ên bi coş û kêf hene. Weke *dûrbînê*, *gurîpezgê*, *berê germgerm-mok*, *bêtkubêt*, *xaranê*, *şûto*, *devzergê*, *tilî-qongê*, *pîrka veşartinê*, *gilçanê*, *qendûşanê* û hwd.

“Di baweriya êzîdîtiyê de hezar û yek navên Xwedê hene. Ji van navan yek Ezda ye. Di wateya “Min da”, “Min afirand” de ye. Ez(i)dî jî di wateya “Min dît”, “Min bawer kir” de ye. Ji ber vê yekê ji me re ÊZÎDÎ ango ên ku bi baweriya wan Xwedê afirînerê xwe yetê gotin. (Şêx Berkat)

Der barê êzîdiyan de zanîna herî çewt ew e ku dibêjin; “Êzîdî melekê xirabiyê ku şeytan e dihebînin”. Di rastiya xwe de êzîdî Xwedê dihebînin. Du cudahî di navbera êzîdî û olên din de hene. Yek jê ev rewşa Melekê Tawus e. Di olên din de Melekê Tawus bingeha hemû nebaşî û xirabîyan tê dîtin; lê di êzîdîtiyê de bingeha başiyê jî ya xirabiyê jî yek e. Tu bandora Melekê Tawus li ser vê yekê tune ye. Ya din jî êzîdî dibêjin ji ber ku Melekê Tawus pir ji Xwedê hez dikir ji Adem re secde nekir û li hember Xwedê rabûye. Ji bo ku Melekê Tawus ji Adem re secde nekiriye û li hember Xwedê rabûye ji aliyê Xwedê ve hatiye

Dosye:

Beşek ji me êzîdî û ola êzîdîtiyê *

Wênekêş: Hüsametî Bahçe

cezakin lê di dawiyê de hatiye efûkirin.

Li gorî hemû olên din mirovahî ji Adem û Hewa zêde bûye; li gorî baweriya êzîdîyan mirovahî ji Adem û Hewa ye lê Êzîdî ji Adem û Hewa nîn in. Ji ber ku temsîla mukemeliyetê ne ji Şehîd binî Car in. Êzîdî ji aliyê Xwedê ve wekî qewmê bi-jarte hatine destnîşankirin.

Pêxemberê êzîdîyan Şêx Adî ye. Ji bo ku ev ol bê îlankirin Melekê Tawus hatiye peywirdarkirin. Ew nivîskarê Kitêba Cilwe ye. Mishefa Reş jî ji aliyê Şêx Hesên ve hatiye nivisandin.

Kitêba Cilwe (Kitaba Wahiyê) fermanên Melekê Tawus vedibêje; Mishefa Reş jî rêzik û rêgezên vê olê û avabûna dinyayê, bingeha mirovahiyê, çî-roka Adem û Hewayê vedibêje.

Reenkarnasyon bingeha ola êzîdîtiyê ye. Êzîdî rojê sê caran berê xwe didin rojê û duayên taybet dikin.

Di nava êzîdîyan de pergala kastê heye û dişibe pergala Hindistanê. Şêx, pîr û murîd hene. Ji kastekê (çîn) derbasbûna kasteke din ne pêkan e.

Hejmara kesên ku li ser baweriya êzîdîtiyê ne bi tevahî neyê zanîn jî li gorî texmînan 800 hezar in. Êzîdî li Tirkîyeyê, Sûriyeyê, Iraqê, Îranê, Azerbeycanê, Gurcistanê, Ermenistanê û li Ewropayê (Almanya, Belçîka û Fransa) dijîn. Zêdetir li başûrê Kurdistanê li bajarên wekî Duhok û Şengalê ne.

KITÊBA CILWE

Melekê Tawus beriya her heyberê hat afirandin. Ji bo gelê xwe hişyar bike û ji şaşîyan dûr bigire, alîkarên xwe şand vê dinyayê; evdên xwe berê bi devkî hişyar kir, cara duduyan bi vê pirtûkê ku; hat qedexekirin ku biyanî lê binêrin an jî bixwînin.

Beşa yekem

Ez ê ku hebûm, he me, heta dawiyê ez ê hebim; hikmê min li ser tevahiya tiştên ku hatine afirandin heye. Her bûyer û her tiştê girêdayî hebûnan bi fermana min pêk tên. Kî jî vê yekê bawer bike û dema ku pêdivî hebe gazî min bike, ez ê derhal bigihîjim wan, tu tişt bêyî min nayê fikirîn. Kesên ku min qebûl bikin, ji bo ku li gor daxwaza wan nîn e hemû bûyerên ku dibêjin xirab in, bi daxwaza min pêk tên. Wekîlekî rêveber ê her demê heye, wî ez hildibijêrim. Bi her nîşê re, serokê vê cihanê jî diguhere; serok bi dorê tên, peywîrên têkildarî dema xwe bi cih tînin. Ez sûcan li gor nirxên ku ji taybetmendiyên xulqiyetê tên, dibexşînim. Kî ku li hemberî vê derkeve, dê tengasî û êş jê kêm nebin. Wekî din tu Xwedayek, nikare têkilî karê min û tiştên ku ez dikim bibe. Ez çî biryarê bidim dê ew pêk bê.

Pirtûkên pîroz ên di destê biyaniyan de, ger ji aliyê pêxember û hewariyan ve hatibin nivîsîn jî, êdî ne derbasdar in. Ew ketine rewşeke serhildêr, xera bûne, vana hev diderewînin û himê hev pûç dikin. Cudahiya navbera rastî û şaşiyê, dê li gor mercên dema tê jiyîn bê destnîşankirin. Sozên ku min daye mirovan ez ê bînim cih. Di demên diyarkirî de li gor daraza wekîlên min ên bi aqil û hişyar ku min selahiyeta xwe dewrî wan kiriye, ez ê li gor peymanê di navbera xwe û evdên xwe de tevbigirim an jî tevne-gerim. Ez li hemberî pêşveçûna bûyeran baldar im; dema ku em tê de, ne çî tiştê bi fêde hebe ez pêk tînim. Kesên ku hîndekariya min dipejirînin, ez wan perwerde dikim û berê wan didim rastiyê. Ew bi guhdarîkirina min kêf û zewqên mezin ên giyanî dijîn.

Beşa Duyem:

Ez bi tevahiya rêbazên ku baş dizanim, xelat û ceza didim mirovan. Li rûyê erdê û binî erdê çî hebe, di kontrola min de ye. Ez alîkariya ji bo netewên din nagirim ser xwe, ji başiya ji bo wan jî dûr namînim. Ez alîkariyê ji civata xwe ya

* Wêneyên vê dosyeyê di sala 2008'an de wek pêşangeh bi alîkariya Federasyona Êzîdîyan / Almanya, Navenda Hunerê ya Diyarbakirê (Diyarbakır Sanat Merkezi) û Navenda Çandê ya Dicle Fîratê (Dicle Fîrat Kültür Derneği) li Amedê hatin pêşandan.

hilbijartî re û yên ku bi ya min kirine qet kêminakim. Ez kontrola selahiyeteke çalak didim mirovên ku min ew ceribandine. Ev mirov li gor îradeya min, di rewşên diyarkirî de, alîkarî dane kesên ku ji min bawer kirine. Yê ku dide jî ez im, yê distîne jî. Yê dewlemend jî dike ez im yê xizan jî dike ez. Yê bêhêvî dike jî ez im. Ev tev li gor derdorê û li gor demê pêk tên. Tu hêzek nikare têkilî karê min bibe û mirovekî/ê ji kontrola min derîne. Yên ku dixwazin ji min re astengiyê derînin ez êş û nexweşîyan bi ser wan de dibarînim. Kî li fermana min guhdar bike, wek kesên din namire. Ez tehemul nakim ku tu kes di vê dinyaya ketî de zêdetirî dema ku min jê re diyar kiriye bimîne; lê ku ez bixwazim wî/ê li vê dinyayê du car, sê car yan jî zêdetir paşve vegerînim, giyanê wî/ê têxim bedeneke din; ev zagonê gerdûnî ye

Beşa Sêyemîn

Ez, bê pirtûk jî dikarim dostên xwe û kesên ku di riya min de ne ramanên min dihesibînin, riya rast bi amûrên veşartî nîşanî wan didim; rêçikên ku ez dixwazim werin bicihanîn ne tengavker in, li gor demê û mercan hatine diyarkirin. Yên ku li hemberî zagonên min derên li dinyaya din didim cezakirin. Benî adem, tiştên ku divê bîn kirin nizanin, ji ber vê yekê timî dikevin nav şaştîyan. Ajalên li rûyê erdê û li asîman, masiyên di nav deryayan de, tev di bin rêveberî û venêrîna min de ne. Xezîneyên veşartî yên li dinyayê û tiştên din, bi agahiya min in. Ez derfet didim ku ew xezîne yeko yeko werin dîtin û stendin. Kesên ku bibin xwediye vana û kesên ku di demê de ji min daxwaz kirine, nîşaneyên xwe yên veşartî, mûcîzeyên xwe nîşan didim. Dijminahî û berxwedana ku biyanî li hember min û yên ku di şopa min de ne nîşan didin; encax zirarê bide xwediye xwe; lewre nizanin ku hêz û dewlemendî di destê min de ne û ez vana didim benî

ademên ku heq kirine. Rêveberiyên dinyayê, derbasbûna serdeman a li dû hev, guherîna wekilên min a di her serdemê de, heta dawiyê di bin kontrola min de ye. Kî ku; bi duristî ber bi wir ve nemeşe, ez, di demeke ku bi xwe diyar bikim de wê/i ceza dikim û wan dişînim cihê ku jê hatine.

Beşa Çaremîn



1) Roj ji bo êzidiyan pîroz e. Ew rojê sê caran berê xwe didin rojê û duayan dikin. Bi dayîna rojê re; nava rojê dema ku roj li nava ezman e; dema ku roj diçe ava bi duayan îbadeta xwe dikin. Li gorî hinek rîwayetan tê gotin ku rêberê êzidiyan ê ruhanî Şêx Adî dema ku wezan dide marek tê û li wî guhdarî dike. Ji ber vê yekê êzidî nexşê mar ê ku li ser deriyê perestgeha Lalişê ye pîroz dibînin.

Adar 2003 - Laliş

2) Feqîr herî zêde li herêma Şengalê dijîn. Feqîr "Şêrik û Kulik" didin serê xwe. kirasê spî li xwe dikin. Bi ser kiras de jî "Şêxanî"yê ku mildirêj e li xwe dikin û bi ser de jî xirçeyê li xwe dikin. Êzidiyên ku di cemaetê de ne milê rastê yê Feqîrê ku vê xirçeyê li xwe dike maç dikin û hurmetê nîşan didin.

Tilizêr/Şengal – Adar 2005



3) Rêberê Êzîdîyan Baba Çawîş û cîgirê wî Pîr Seyîd li perestgeha Lalişê ya mezin rûniştî ne. Rêberên olî yê Êzîdîyan ên cîlspî di xizmeta rêberê xwe yê ruhanî Şêx Adî û perestgeha pîroz Lalişê. Ji ber vê yekê jî tu caran nazewicîn.

Adar 2005 - Laliş

4) Ji bo bîranîna cemaeta ku cara pêşîn Şêx Adî aniye cem hev, rêberên olî yê Êzîdîyan roja Cejna Cemaiyê diçin gorên Geliyê Lalişê ziyaretê dikin. Êzîdî her sal diçin heca xwe li Geliyê Lalişê, ciyê ku gora Şêx Adî lê ye dikin. Ciyê ku bawerîya Êzîdîyatiyê cara pêşîn lê belav bûye Geliyê Lalişê yê li herêma Şêxanê ye. Li wê derê Lalişa Nûranî tê ziyaretîkirin.

Laliş - Kewçêr 2005

5) Êzîdî li hewşa perestgeha mezin a Lalişê agir bi fitîlan dixin, duayanê dikin û bi tililiyan Çarşema Sor (Şersal) pîrozê dikin. Di pîrozbahiyê de bi pêşevaniya Baba Şêx ji perestgeha mezin ber bi Sûqa Merîfetê (meydana pêşberî perestgehê) ve bi tililiyan dimeşin. Fitîlan datînin ser kevîrên meydanê. Rêberên olî wê şevê heta sibê ranakevin.

Laliş - Avrêl 2006

Çar demsal hene, hêman jî çar in; min ev, ji bo tiştên ku min afirandine pêdiviyên xwe pêk bînin, bexş kiriye. Pirtûkên pîrozên biyaniyan, encax bi qasî ku li gor zagonên min bin, li dijî min dernekevin; ji aliyê min ve tîn pejirandin. Dîsa vana, bi piranî ji rê derketine. Sê ji wan li dijî min in û ez ji sê navan nefret dikim. Ji bo yê ku razên min aşkera nekin, ez ê soza xwe ya der barê xelatan de bicih bînim. Yê ku di riya min de êşê dikişînin, bila guman tune be, ez ê wan di dinyayekê de xelat bikim. Yê ku di riya min de dimeşin bila li hemberî neyar û biyaniyan wek cemaetê bijîn. Hûn, ên ku li gor zagonên min tevdigerin, fikrên ku ji aliyê min ve nehatine ragihandin nekin hişê xwe. Wek ku biyanî dikin nebe nebe navê min an jî navên ku li min hatine danîn bi lêv nekin, an na hûn ê gunehkar bibin; lewre ev mijar ji derveyî têgihîştina we ne.

Beşa Pêncem

Hurmata xwe ji tişt û wêneyên ku min temsîlê dikin re pêşkêş bikin; lewre dê ew, helwestên we yê ne li gor zagonên min in bînin bîra we. Li gor fermana alîkarên min tevbigerin, guh bidin gotinên wan. Da ku agahiyên dinyaya din ên ku ji min girtine ragihînin we.

MISFEHA REŞ

Xwedê di destpêkê de ji cewherê xwe dura spî afirand; û çivîkek afirand ku navê wê Anfar bû. Û dur da ser piştê wê. Û li wir çil hezar salî ma. Roja destpêkê yanî roja yekşemê, melayîketê bi navê Azazîl afirand. Ew Melekê Tawus e yê ku serokê tevan e. Xwedê, roja duşemê, melayîketê bi navê Dardaîl afirand ku; ew Şêx Hesên e. Roja sêşemê, Îsrafil afirand ku ew Şêx Şems e. Roja çarşemê, yê bi navê Cibraîl afirand; ew jî Ebûbekir e. Roja

pêncşemê, Azraîl afirand ku ew Sacadîn e. Roja înnê, yê bi navê Şemnaîl afirand ku ew Nasirudîn e. Roja şemiyê, yê bi navê Nûraîl afirand ku ew (...) Melekê Tawus kir serokê wan. Piştî wê Xwedê, heft tebeq asîman, erd, roj û heyv afirand (...) Mirov, çivîk û tevahiya ajalan afirand û ew di valahiya pelerînê de bi cih kirin û ew jî ji ser durê hat xwarê, melayîket jî li balê bûn. Dûre bi dengê bilind li durê qîriya, ew jî ji cihê xwe ket û bû çar perçe, ji nava wê av peşîki û bû derya. Dinya gilover bû, derz lê tune bû. Dûre Xwedê, Cebraîl di şeklê çivîkekê de afirand û rêveberiya çar kenaran emanetî wî kir. Dûre keştiyek afirand û sî hezar sal di nav gemiyê de ma, dûre hat Lalişê û li wir bi cih bû. Ji nav dinyayê qîriya û bi giraniyê derya afirî û dinya bû rûyê erdê û lerizîna wan berdewam kir. Dûre ferman da Cebraîl ku her du perçeyên Dura Spî bîne, perçeyek xist binê erdê, yê din jî wek derî danî ber asîman. Dûre roj û heyv di navbera wan de bi cih kir, ji hûrikên wan jî stêrk afirandin û ew wek xemlê bi asîman ve daliqandin. Her wiha ji bo xemilandina rûyê erdê; darên fêkiyan, giya û çiya afirandin. Li ser xaliyê Text afirand. Dûre, got ku Xwedayê mezin got: "Ey melayîketan, ez ê Adem û Hewayê biafirînim, wan bikim mirov û ji her duyan, ji piştî Adem dê Şehîd bîn Car were dinyayê û ji wî dê li rûyê erdê gelek tenê zêde bibe. Ev gel, gelê Azazîl ango Melekê Tawus, gelê êzîdî ye. Dûre ez ê Şêx Adî bîn Misafir ji Sûriyeyê bişînim û ew ê were li Lalişê bimîne."

Xwedê dûre, hat welatê pîroz û ferman da Cebraîl ku ji çar aliyên dinyayê axê bîne: Ax, hewa, agir û av. Bi wan mirovek çêkir; û ji ruhê xwe, ruhek jê re bexîşand.



6) Hefteyêkê piştî Cejna Sersalê (Çarşema Sor) ku di hefteya pêşîn a meha avrêlê de tê pîrozkirin li Başîkê gora Şêx Mahamed bi girseyî tê ziyaretkirin. Başîk – Avrêl 2005

7) Li Verdeyê bi awayê berê gêleya genim tê kirin. Li herêma gel bi piranî bi çandiniyê debara xwe dike. Carina jî Neteweyên Yekbûyî alîkariya xurekan dide wan. Verde, Şengal - Gelawêj - 2005





9



10



11

9) Li navenda çandê ya êzîdîyan koroya ku ji deh şagirtan pêk tê di dersê de ye. Başîk - Avrêl 2006

10) Êzîdîyên Lalişê hurmeta xwe pêşkêşî rêberê xwe yê ruhanî Baba Şêx dikin. Baba Şêx ji bo ku civînên olî li dar bixe û bi rê ve bibe salê du caran li gundên êzîdîyan digere; pirsgrêkên wan çareser dike, li mirovan guhdarî dike û şîretan li wan dike.

Laliş - Adar 2005

Dûre ji Cebraîl re got Adem di cenetê de bi cih bike, li wira jê re hat gotin ku dikare fêkî û tevahiya giyayên hêşîn bixwe; lê xwarina genim jê re qedexeyê. Piştî sed salan Melekê Tawus ji Xwedê re got "Adem dê li ku bijî û çawa zêde bibe?" Xwedê jê re got: "Ez di vê mijarê de serahiyet û rêveberiyê dewrî te dikim". Wê demê Melekê Tawus, çû ji Adem pirsî got: "Te qet genim xwariye?" Wî jî got: "Na, lewre Xwedê ev yek li min qedexeyê kir, got divê tu ji wî nexwî." Melekê Tawus jê re wiha got: "Ku tu bixwî dê ji bo te pir baş be". Lê piştî ku Adem genim xwar, zikê wî werimî û Melekê Tawus ew ji cenetê derxist û danî rûyê erdê û derket asîman. Wê demê Adem ji ber werma zikê xwe êş kişand û nikaribû di cihê xwe de bisekine, lewre di canê wî de dereke vekirî tune bû. Lê Xwedê çivîkek şand, çivîkê di bedena Adem de qulek vekir, bi vî awayî Adem rihet bû. Û Cebraîl sed salan xwe nîşanî wî neda û ew bêhêvî bû, giriya. Wê demê Xwedê ferman da Cebraîl û Cebraîl hat, ji bin milê çepê yê Adem Hewa afirand. Dûre Melekê Tawus -ez dixwazim bibêjim ku; ji bo alîkariya êzîdîyên ku êşê dikişînin- hat rûyê erdê û li ba Asûrên kevn, kralêk ji me re destnîşan kir. Kralên Asûr Nesruk (ku ew, Nasirudîn e) û Kamûş (ew jî Sultan Faxrudîn e) û Artîmûs (ku; Sultan Şemsudîn e). Piştî vê jî aliyê du kralan ve em hatin birêvebirin. Rêveberiya kralên bi navê Şahpûrê yekemîn û duyemîn sed û pêncî sal berdewam kir û Emîrên me yên ku ji nîjada wan dihatin, heta îro em bi rê ve birine û em bûne çar qebîle. Ji me re xwarina xasê (marul) hatiye qedexekirin, lewre xas navê jinê (pêxember) bi bîr dixê; fasûlyeyên hişk jî heram in; bikaranîna rengê şînê girtî jî

qedexe ye. Ji bo em ji Pêxember Yûnus re bêrêziyê nekin, xwarina masiyan ji bo me heram e; xezalan jî nexwin, lewre ew bûne keriyê pêxemberekî me. Her wiha şêx û mirîdên wî, ji bo hûn ji çûka Tawus re bêhurmetiyê nekin goştê dîk jî nexwin. Lewre çûka Tawus yek ji heft Xwedayên ku berê navê wan hatiye gotin e û dirûvê dîk pê dikeve. Dîsa şêx û murîdên wî, ji xwarina kundir dûr bisekinin, angon nexwin. Ji derveyî vana, li piya mîztin an jî rûniştî lixwekirina cilan an jî wek ku misilman dîkin li tuwaletê taretgirtin an jî li serşoyên wan xuslgirtin, ji me re hatiye qedexekirin. Her wiha, bilêv-kirina navê ku Xwedayê me ye an jî gotinên wek Kitan, Şar, Şat û peyvên wek Melûn (...) Nal ên ku wî tînin hişê mirovan qedexe ye. Pêşiyê (...) ji dînê me re gotin pûtperestî û cihû, xiristîyan, misilman û îranî ji dînê me dûr sekinin. Kral Ahab û Arman ji me bûn; wisa bû ku Ahab Belzebûb ê ku me wek Pîr-bûb bi nav dikir ji Xwedayê xwe alîkarî dixwest. Li Babilê bi navê Bukti-Nosser (Nabûkadnezar) kralekî me hebû. Li Îranê Ahesuerus, li Stenbolê Agrîkalûs jî ji me bû. Beriya ku erd û asîman çêbibin Xwedê, li ser avê di keştiyekê de bû. Dûre jî dura ku afirandibû xeyîdî, ew ji xwe dûr xist. Ji şikîna durê çiya, ji çingîniya wê girên qûmê, ji dûmana wê jî asîman çêbûn. Dû re Xwedê derket asîman û asîman zêde bû û bêyî ku tişteki deyne binî wan ew li hewa bi cih kirin, listeya navê tevahiya tiştên ku afirandine nivîsî. Ji cewher û nûra xwe Şêş Xweda afirandin ku; afirandina wan wek bi lambeyekê pêxistina lambeyeke din bû. Dûre Xwedayê pêşîn, ji Xwedayê duyemîn re got: "Min asîman afirandin; tu here wira û tiştina biafirîne." Û ew, dema



12) Li nêzî ziyareta Şerafedîn jin ji bo miriyên xwe xwarinê belav dîkin. Li herêma Şengalê jin "kofi" ya heft metreyî didin serê xwe. Li herêma Lalişê kirasê ku tê lixwekirin rengin e, lê li vir bi tenê spî ye. Bi ser de jî êlegê reş e bi navê "kutik" tê lixwekirin.

Şerafedîn/Şengal- Gelawêj 2005

13) Roja îne ya piştî Çarşema Sor (sersal) pîrozbahiyên Tewafê pêk tên. Pîrozbahî bi dadana bixurê û beytên ku ligel def û bilûrê tên gotin dest pê dike.

Bahzan - Avrêl 2006

14) Êzîdiyên ku tên ser ziyareta Şêx Adî jî odeya ku jê re dibêjin xezîneya Şêx Adî nanê teberik digirin û bi xwe re dibin.

Laliş - Kewçêr 2006





15



16



17

15) Portreyên Ebû Cokî û Elyas Yûnis. Êzîdiyên ku li nêzî herêmên ereban dijîn ji bo ku zorî û zextên ereban li ser xwe nebinin cil û bergên ereban li xwe dikin.

Rambusî – Gelawêj 2005

16) Li mucemeha Tilizêrê ya Şengalê êzîdî hatine cem hev hem bi korikê dilîzin û hem ji sohbet dikin.

Tilizêr/Şengal–Rezber 2005

17) Li herêma Şengalê êzîdiyên ku di mucemehê de dijîn ji ber ku alavên wekî din tune ne xaniyên xwe bi ker-pîçan ava dikin.

Tilizêr/Şengal – Gelawêj 2005

derket asîmanan, roj çêbû. Ji Xwedayê piştî xwe re got “derkeve” û hîv hat afirandin. Û xwedayê dû wî, asîman bi ger xist; Xwedayê dû wî, stêrk afirandin; Yê ku di dû wî re hat, el-Kuragh ango Stêrka Sibehê afirand û her tişt wiha hat afirandin.

Rêberên ola êzîdîtiyê

Mîrê Şêxan:

Nûneriya saziya mîrîtiyê ji aliyê kesên ku ji malbata Şêx Adî ne ve tê kirin. Ji hoza Kataniyan in. Ji malbata Ebûbekir in. Rayeya wî ya hîlbijartina Babê Şêx heye. Gera Tawus bê destûr û biryara Mîr pêk nayê. Bi kurtasî Mîr ber-pirsiyariya tevahiya karan digire ser milên xwe. Mîrov dikare bi-bêje ku Mîr serokê tevahiya Êzîdiyan e.

Pêywîrên Wî ev in:

Ji tevahiya Êzîdiyên cîhanê re serokatîyê dike û nûneriya wan dike.

Ciyên pîroz ava û nû dike, bexşên ku ji bo Laliş û Tawus tînin kirin, li hev datîne û ji bo ciyên pîroz bi kar tîne.

Bi kesên xizan û hewcedar re dibe alîkar.

Pirsgirêk û nexweşîyan çareser dike.

Babê Şêx:

Ev kes serokê ruhanî ye. Alîkarê Mîr e. Divê ku ji malbata Êzdîne-mîrê lawê Şêx Fexredîn be.

Pêywîrên Wî ev in:

Divê salê du caran li gundên êzîdiyan bigere û pirsgirêkên wan çareser bike, ji guhdarkirin, şiyar-kirin û hwd. berpirsiyar e.

Destnîşankirin û peywirdar-ki-rina peywirdarên olî.

Girtina Rojiya Çilê Havînê û Çilê Zivistanê.

Ji lidarxistina cejn û serlêdanên Perestgeha Lalişê, peytandin û birêvebirina merasîman berpirsiyar e.

Babê Şêx cilên spî li xwe dîke û ristê girêdide... (...) guneh e ku Babê Şêx şerabê vexwe. Divê ku berî bibe Babê Şêx bizewice. Ku here ser dilovaniya xwe mezinên êzîdiyan û civata ruhaniyan li hev dicivin û Babê Şêx ji nû ve hildibijêrin. Di rojên taybet û cejn nan de di civata Şêx Fexredîn de li ser secadeyeke pîroz rûdinê.

Şêxê Wezîr:

Ji hoza Şemsaniyan e. Ji malbata Şêx Şemsan e. Loma jî di civata ruhanî ya Şêx Adî de semajenek e.

Pêşîmam:

Ji êla Adaniyan e. Ji malbata Şêx Hesên e.

Şêx:

Peywîra wan birêvebirina merasîmên cenazeyan e û êzîdiyan der heqê pêşketinan de agahdar dîkin. Ligel vê yekê şêx ji berhevkirina zikatê jî berpirsiyar e. Ew jî bo zikata ku dane hev li saziyan belav bikin rêxistinê pêk tînin. Cilên spî li xwe dîkin, kumê reş didin serê xwe şaşıkeke sor didin dora kum. Şêx ji êla Adanî, Şemsanî û Kataniyan tînin hilbijartin. Şêxên ku ji Adaniyan in: Melîk Şêxsin, Şêxmûsê Sor, Şêx Şerefedîn, Şêx Îbrahîm, Şêx Zendîn, Şêxmûsê Enzel... Ji malbata Şêx Adî ne. "Şêxê Çil Şêxa" pileya herî bilind a şêxan e.

Şêxên ku ji Şemsaniyan in: Şemşelâh, Şêx Fexredîn, Şêx Nasirdîn, Şêx Sicadîn, Melîk Amadîn... Ji malbata Şêx Şems in. Bavîkê şêxan ê herî mezin e.

Şêxên ji hoza Kataniyan in: Şêx Abdulkadîr, Şêx Îsmâîl... Ji malbata Şêx Ebûbekir in.

Babê Gavan :



18) Portreya Qasimê Xidir Salih. Ew êzîdiyekî ji çîna feqîran e.
Zomani/Şengal – Adar 2005

19) Sinûn yek ji mucemmhên li bakûrê Çiyayê Şengalê ye. Li herêma Şengalê dozdeh mucemmh hene. Heft jê li bakûr, pênc jî li başûr in. Ji dozdeh getoyan bi tenê dudu li Xanasor û Sinûnê ne. Li van her du getoyan pîrsgirêka avê tune ye. Sinûn/Şengal – Rezber 2005

20) Li Şêx Mendê goristaneke êzîdiyan, bi kêlikê yê ku miriyê ve keziyên jinên ji malbatê hatine daliqandin. Kezî pîranî bi kêlikê gorên kesên ciwan, ên ku ji wan hatiye heskirin û rûmetdar in ve tînin girêdan. Ev adet giraniya êşa ku li dû miriyan tê kişandin û şîna li ser wan nişan dide.

Li gor baweriya êzîdiyan dema mirî dimire teşeyê xwe diguherîne. Ruh piştî mirinê derbasî giyanewereke din dibe. Ev bawerî bingeha xwe jî vê yekê digire. Kesê/a ku dimire ku baş be ruhê wî/wê derbasî tiştêkî/e baş dibe; ku mirî ne baş be ruhê wî/wê derbasî tiştêkî/e ne baş dibe. Li gorî vê baweriyê mirin jî bo mirovan dawîya zayinê ye, lê ne dawîya ruh û jiyane ye.





21



22



23

21) Tazan, dema Beyta Êvarê gava ku roj diçe ava bi qasî pazdeh deqîgeyan beytekê dibêjin. Bi qedandina beytê re fîtilên pêxistin û bixurdankên gerandin. Ji bo ku pîroziya wan deran neyê qirêjîkirin di serî de li Geliyê Lalişê û ciyên ku perstgeh lê ne her kes pêxwas digere.

Başîk - Adar 2005

22) Li herêma Bahzanê li qada pêşberî ziyareta Pîr Bûkê zarok bi futbolê dilizin.

Bahzan - Adar 2005

23) Jineke Êzîdî ji ser ziyareteke ku li Şêxanê ye vedigere. Êzîdî bi piranî roja çarşemê ya ku pîroz dihesibînin diçin ser gor û ziyaretan.

Êsivnê - Adar 2005

Ji binemilê Amadîn e. Di cejnan de li civata Melîk Fexredîn rûdinên. Li gundan digerin, rêzikên olî vedibêjin, şîretan dîkin.

Babê Çawîş :

Cihê wî her tim perestgeha Lalişê ye. Bi karê perestgeha Lalişê re mijûl dibe. Cilên spî li xwe dike. Qet nazewice. Xwe dide xizmeta Şêx Adî û Lalişê.

Pîr:

Di merasîmên olî de alîkarê şêxan in. Rê û rêzanê bi ber êzîdîyan dixin. Ev peywîra wan e. Ji aliyê hurmetê ve piştî şêxan tên. Di şûştina cenazeyan de avê li destê şêxan dîkin.

Qewal:

Bêjeya Qewal Sumerî ye. Awayê resen Kalo ye. Wateya wê mirovê oldar e ango "Zilamê oldarê rûspî" hîna jî di nav êzîdîyan de tê gotin.

Peywîra qewalan; di cejnan de li Lalişê Nûranî ligel amûrên muzîkê gotina beyt û qewlan, gund bi gund gerandina tawus û berhevkirina zikatê. Qewal biçin ku derê bi hurmetên pêşwazîkirin. Her sal li qadên ku diçinê bi kesên ku nikaribûne bîr Lalişê Nûranî re sohbet dîkin. Armanca wan ew e ku bi rêya vê sohbetê bawerîya wan nû û hêzdar bikin. Bi karê defnkirina miriyan re mijûl dibin û şînê digerin. Qewal ji çîna murîdan in. Serekê qewalan ji cimaeta ruhaniyan e. Qewal li gundê Başîka û Bahzanê dijin.

Feqîr :

Xîrçeya reş li xwe dîkin. Şaşıka reş li serê xwe girêdidin. Wextê xwe bi piranî ji dua, îbadet û weazan re vediqetînin. Her tim di nava civakê de digerin û pirs-girêkên civakî yên ku derdikevin çareser dîkin. Feqîrî ji bavan derbasî lawan dibe û her feqîr xir-

qeya pîroz ku li xwe dike heta mirinê dernaxe.

Feqra :

Jina oldar a ku zewac li xwe heram kiribe ye. Li Lalişê diji. Li perestgehê qendîl û tiştên wek fi-tîlên qendîlê çêdikin. Jê re Dayê Kebanî, Dadê tê gotin.

Koçek :

Derwêşekî oldar e. Ev nav ji peyvên "Guh" û "çak" pêk hatiye. Kesekî ku razên olî bi dest xistiye ye. Şîretan li gel dike weazan dide û wan perwerde dike. Ji nav kesên ku ji gelek aliyên Kurdistanê hatine û li Lalişê niştecîh bûne tîl hilbijartin. Koçek ji kesên ku tirba Şêx Adî diparêzin re serokatîyê dikan. Bi qewalan re sembola Melekê Tawus a çarmil a tûncîn û bi meşaleyên ku ji çirayan hatine çêkirin li gundan, li nav gel digerin. Û bi vî awayî gel li dora baweriya êzîdîtiyê dicivînin. Ji bilî vî temamkirina her cure pêdiviyên Lalişa Nûranî jî di nav peywîra koçekan de ye.

Neqîs:

Ji pîrên Hecî Eliyan in.

Xilmetkar :

Tê wateya xizmetkar. Xizmetên perestgehê pêk tîne. Bi paqijî, spîkirina qubeyê û hwd. re mijûl dibin. Bi amadekirina donê olî û pîroz re mijûl dibin. Xilmetkar bêtir ji gundên Başîk û Bahzan tîlên vî xizmetê dikan.

Mîr Hac :

Ji milên Mîran ê jêr e. Bi merasîm û peywîrên olî yê tîkildarî cejna qurbanê re mijûl dibin.

Micêwir :

Ji tîrbên li gundên êzîdîyan û Lalişê berpirsiyar in.

Biryarên tîkildarî civata êzîdîyan meclîsa ji 6 kesên ruhanî Mîr,



24



25

24) Xilmetkarên (xizmetkar) ku ji Başîk û Bahzanê tîl, beriya ku ziyaret dest pê bike perestgeha pîroz a Lalişê paqij dikan.

Laliş – Avrêl 2005

25) Falih Hesen di dawiya hefteyê û mehên ku dibistan girtî ne de ligel darsa olî, îlahî û helbestên ku ji wan re Qewl û Beyt tîl gotin dide zarokan.

Başîk – Gelawêj 2006

26) Tilizer li başûrê Şengalê ji pênc mucemmetan (getto) yek e. Bi qasî sî hezarî êzîdî li Tilizerê dijîn. Li Şengalê jî nivê êzîdîyan zêdetir li mucemmetan dijîn. Rêveberiya Iraqê di sala 1975'an de ji bo ku êzîdîyan kontrol bike yêl ku li çiyayan bûne aniye li mucemmetan bi cih kiriyê.

Tilizer/Şengal – Adar



26

Babê Şêx, Şêx Wezîr, Peşîmam, Babê Gavan û Qewal pêk tê, didin.

BAWERÎ - 1

Rojî:

Rojiyên ku rêberên olî digirin:

Çilê havînê 24'ê pûşperê dest pê dike, 40 rojan tê girtin.

Çilê zivistanê 24'ê berfanbarê dest pê dike, 40 rojan tê girtin.

Rojiyên ku tevahiya êzîdiyan digirin:

Her êzîdî li gorî ocaxa xwe rojiya Xudan digire. Sê roj e.

Sê rojan rojiya Şêşems tê girtin. Ev jî ji bo pîroziya rojê ye.

Sê rojan jî rojiya êzîdiyan tê girtin. Rojiya êzîdiyan jî bo afirandina cîhanê tê girtin.

Ji bo êzîdiyan rojiya hurmetê ya ku girtina wê ne ferz e heye. Ev rojî li gorî daxwazê ji bo Xizir Elyas 3 rojan tê girtin.

Cejn:

Îda Cemai: Ev cejna ku berê di 23'yê meha rezberê de dest pê dikir û heta 30'yê mehê didomiya, paşê di navbera 6 û 13'ê cotmehê de hatiye pîrozkirin. Ji bo bîranîna civata ku yekem car Şêx Adî aniye cem hev tê pîrozkirin.

Êzîdî her sal diçin serdana Lalişa Nûranî ya ku li Geliyê Lalişê, li herêma Şêxan e ku tirba Şêx Adî li wir e û baweriya êzîdîtiyê yekem car li wir hatiye pejiwandin. Li wir peywira xwe ya hecê tînin cî. Di merasîma hecê de lawijên ku pesnê Şêx Adî didin tînin xwendin. Tewaf bi def, bilûr, tef, saz û şîbabê tê pêkanîn. Berendamên hecê beriya hecê paqîjiya xwe dikin, cilên xwe yên spî li xwe dikin û tînin Lalişê. Heciyên ku tînin Lalişê li ber deriyê derve pêlavên xwe derdixin. Êvarê jî ligel meşale û muzîkê îbadetê dikin. Jin bi tilîliyan beşdarî îbadetê dibin.

Di pîrozbahiyên Cemaiyê de her şev semahên ku afirandina cîhanê vedibêjin bi beşdariya rêberên olî tînin gerandin. Alimên ku bi dorê beşdarî semahê dibin ev in: Feqîr, Peşîmam, Mîr Hac, Şêx Wezîr, Şêxê şêx Abdulkadir, Pîrê Sibya û Babê Çawîş. Ev rêberên olî 7 milyaketan temsîl dikin wek: Ezraîl, Cebraîl, Mikail, Dardail, Azazîl, Azaîl, Şimxayîl. Çar çavîyên Çekeltuyê hene di van çavîyan de fitilên ku li donê zeytê xistine tînin pêxistin, li dora wê sê cara dizivirin û semahê dige-

rînin. Çekeltû kâinatê temsîl dike, çar çavîyên çekeltuyê jî ba, ax, av û agir temsîl dikin. Feqîrê ku bi agirê di destê xwe de li ber çekeltuyê disekine jî Adem temsîl dike.

Teswîrên Melekê Tawus nişanê rêberên olî didin û hecê bi dawî dikin. Kesên ne êzîdî bin nikarin derbasî beşa îbadetê ya ku teswîrên Melekê Tawus nişan didin bibin.

Cejna Êzî: Pîrozkirina roja rizgarî û afirandina cîhanê ye. Ev cejn navê xwe jî Ezdayê ku cîhan afirandiye digire. Bi fermana Ezda milyaket roja şemiyê dest pê dikin û roja Yekşemê afirandina cîhanê bi dawî dikin. Roja duşemê milyaket paqîjiyê û amadekariya rojiyê dikin. Roja sêşem, çarşem û pêncşemê rojiyê digirin. Roja îne jî afirandina cîhanê, anga cejna Êzî tê pîrozkirin.

Îda Çilê Havînê: Cejneke ku tenê li Lalişê jî 18'ê tîrmehê heta 21'ê wê, 3 rojan tê pîrozkirin. Ev cejn piştî 40 rojê rojiya havînê ku rêberên olî bi dawî dikin dest pê dike. Ev cejna ku li Lalişê û derdora wê sê rojan tê pîrozkirin li herêma Şengalê rojekê tê pîrozkirin.

Çarşema Serê Nîsanê: Cejna salê ya yekem çarşema nîsanê ya pêşîn tê pîrozkirin, cejna Çarşema Sor (Çarşema Serê Nîsanê) ye. Bi hatina Babê Şêx a Lalişê merasîm dest pê dikin. Beyt û dua tînin xwendin. Hêk tînin kelandin û bi rengên cihê tînin boyaxkirin. Li gorî baweriya êzîdiyan avabûna cîhanê bi hêkê tê ravekirin. "Her aliyê cîhanê av bû, bejayî qet tune bû. Paşê bejayî, paşê jî jiyan çêbû. Hêka ku pêşiyê avîkî ye cîhana beriya jiyanê temsîl dike, hêka tîrbûyî jiyanê û qalik jî hewayê temsîl dike. Û meha nîsanê dema vejîna xwezayê ye, ji ber vê yekê êzîdî hêkan bi rengên ji hev cihê boyax dikin."

Gava ku roj diçe ava fitil tînin pêxistin û mirov bi rêberiya Babê Şêx jî perestgeha bingehîn ligel xwendina beyt, dua û bi tilîliyan ber bi Sûka Merîfetê (qada li ber perestgehê) ve dimeşin. Fitilên ku tînin pêxistin li ser kevîrên vê qadê tînin danîn. Rêberên olî wê şevê ranazên.

Sibehê berî roj hilê xilmetkar kulîlkên beybûnê û qalikê hêkên rengîn bi heriyê bi ser deriyê perestgehê din ên li geliyê pîroz ve dizeliqînin.

Cejna Batizmî: Ji bo Pîr Elî tê pîrozkirin. Ev cejna ku heft rojan didome tenê ji aliyê hoza Çelîkî ve tê pîrozkirin. Duşemê xwe dişon û du rojan rojiyê digirin. Roja çarşemê qurban tê dayîn. Roja pêncşemê roja Şevberatê ye. Roja şemî û yekşemê cejn e. Roja yekşemê xwe dişon û papikên qur-

bana ku roja çarşemê hatiye serjêkirin tê pehtin. Heft rojan nanê birûn ku jê re dibêjin “Sewuk” tê pehtin.

Roja herî girîng a cejna Batizmiyê pêncşem e vê rojê şevberat tê pîrozkirin. Nêzî roj here ava pîrên ji hoza Çêlikî ji bo çend parî ji nanê pîroz ê ku jê re dibêjin “xewra” bigirin li gundê Pîrê herî extiyar dicivin. Pîrê ku ji bo nanê xewra ku dişibe nanê tenûrê diçe, di tûrikê xwe de sewuk, goşt û mewijan dibe. Pîrê ku derbasî odeyê dibe derbasî ciyê ku nanê xewra lê ye dibe û tûrikê xwe vala dike. Nanê xewra datînin nav mewîjan. Piştî ku roj diçe ava merasîm dest pê dike. Bi îşareta Pîrê herî extiyar her kes radibe ser piya. Pîrê extiyar nanê xewra yê di nava mewîjan de derdixe. Bi kêrê hûr dike. Ji wî nanî çend pariyan datînin ser tepsiyê paşê jî berdidin nava tûrik. Paşê jî çend kulm mewîj dixin tûrikan. Pîrê extiyar dema ku kulma xwe dibe mewîjan û dixê tûrikan bi pûtepêdan e. Mewijan di kulma xwe de heta jê tê dijdine. Armanc ew e ku hebên mewîjan ji destê xwe nexer xwarê. Ku hebek mewîj ji kulmê bikeve bi baweriya wan ew sal wê mezinê malê bimire.

Piştî ku nanê xewra dixin tûrikan êdî her Pîr vedigere gundê xwe. Li her gundî odeyeke taybet tê amadekirin, nanê xewra li vê odeyê li ser tepsiya ku mewîj li ser in tê danîn. Êzîdiyên ku ji êla Çêlikî ne diçin mala ku nanê xewra lê ye tewaf dikin. Yê ku dikeve hundir silavê dide civatê û nanê xewra maçî dike, mewîjekê davên devê xwe û hinek pere datînin ser tepsiyê. Civat heta sibehê ranakeve. Yê ku bikaribe heta roja îne roj biçe ava ranekeve û bi vî awayî xêr duqat dibe.

Cejna Xidir Elyas: Her sal di meha sibatê de tê pîrozkirin.

Cejna Qurbanê: Ji bo Xelîl Îbrahîm tê pîrozkirin.

Cejna Bêlinda: Li herêma Şengalê jî vê cejnê re dibêjin cejna “Mêlmelav”. Êla Cuvana û Hêbaba vê cejnê pîroz dikin. Di vê cejna ku du rojan didome de bi şev agir tê pêxistin.

Cejna Feqîran: Li herêma Şengalê hozên Feqîr û Bakîterî pîroz dikin.

Çilê Zivistanê: Di meha berfanbarê de tê pîrozkirin.

Pîrozbahiyên Smatê: Pîrozbahiyên ku di dawiya meha adarê de tên lidarxistin sê rojan didomin. Cejna ku roja çarşemê dest pê dike û roja îne bi dawî dibe ji aliyê Babê şêx ve tê birêvebirin. Roja

pêşîn dara ku jê re dibêjin Qola tê birîn. Darên ku tên birîn ji aliyê komeke ji 30 kesan ve bi duayan ji çiya tên daxistin.

Rojek paşê jî donê zeytûnên ku berê ji aliyê xilmetkaran ve hatine civandin tê derxistin. Zeyta ku tê derxistin dibin perestgeha mezin. Ligel ti-lîlî, dua û pêxistina bixurê dibin. Pîrozbahiyên herî mezin roja sisiyan, roja ku gundên Êsivnê, Başîk û Bahzanê beşdar dibin tên lidarxistin.

Heta ku dawiya pîrozbahiyên Smatê her kes hinek ji nanê ku li malê çêkiriye û aniye datîne odeya perestgehê ya ku jê re dibêjin Xezneya Şêx Adî. Paşê kesên ku hatine serdana perestgehê bi baweriya ku bereketê tîne ji wî nanî hinekî bi xwe re dibin.

Sinet:

Sinet di ola êzîdiyan de ayîneke girîng e. Li gorî adeta ku dibêjin kirîvatî yekî êzîdî dikare zarokê xwe di dawa yekî Misilman de sinet bike. Û bi vî awayî di navbera her duyan de têkiliyeke wek biratiyê heta mirinê dê bidome tê danîn. Xwîna ku di dema sinetê de diherike diniquştin ser egala kirîv. Paşê egal ji aliyê diya zarok ve tê şuştin.

- Ku kirîv êzîdî be zarokê sinetbûyî bi keçeke ji wê hozê re nikare bizewice.

- Ajaleke ku ji aliyê êzîdiyekî nesinetkirî ve hatibe serjêkirin goştê wê nayê xwarin.

Biratiya Axretê:

Têkiliyeke xweser di nava nûhatiyên êzîdiyan de tê danîn. Di dema nûhatiyê de her mirîd, ji bilî malbata şêxê ku ji zaroktiya xwe ve pêve girêdayî ye ji xwe re “Birayekî Axretê” hildibijêre. Kesên ku dibin birayên axretê ji her halê hevdu berpirsiyar in. Birayên axretê nikarin ji hev bizewicin, mecbûr in ku li ser cenazeyê hev amade bin.

Zewac:

Zewac li gorî adetan ji aliyê dê û bavê bûk û zavê ve tên lidarxistin, qelenê ku navê next lê dikin ji aliyê Mîr ve (25 gram zêrê 21 eyar, ji vî 12 ji bûkê re û 13 gram ji bavê bûkê re ye) tê diyar kirin. Merasîma marbirînê ji aliyê Şêx an jî Pîr ve di hizûra birayê axretê de ligel bûk û zavê tê lidarxistin. Paşê ziyafet tên dayîn, govend tê girtin, gule tên berdan.

Li gorî kevneşopiyên êzîdiyan destûra bi yeka/î ne ji ola xwe re zewacê tune ye.

Şêx û Pîr tenê dikarin bi kesên ji çîna xwe re bizewicin, zewaca şêxan tenê bi kesên ji qebîleya xwe hatiye sînorkirin.

Di meha nîsanê de zewac çênabin, ji ber ku sersal e (meha nîsanê bi xwe bûk e).

Meha sibatê meha jinebiyan e; di vê mehê de keçikên ciwan nazewicin.

Mirin

Cenazeyê miriyê êzîdî jî bi rêveberiya şêxê herêmê tê definkirin. Li gorî baweriya êzîdiyan mirin, jî bo mirov dawîya zayînê ye. Lê belê ne dawîya jiyan û ruh e. Lewra êzîdî ji teşeguhertina mirovan bawer dikin. Bingeha baweriya ku rihê mirov piştî mirinê derbasî giyanewerekî/e din dibe jî ev e. Li gor baweriya wan mirovê miriyê ku baş be rihê wî derbasî teşeyekî baş dibe, ku xerab be jî derbasî teşeyekî xerab dibe. Kesê ku di ber sikratê de be divê ku malbata wî, birayê wî yê axretê û şêx li ber serî bin. Û heta ku dimire jî feqîr, lawijên Xweda dixwîne. Piştî mirinê jî şêx ava pîrozkirî diniquştine devê mirî û direşîne ser rûyê wî/wê. Ku şêx an jî birayê axretê li wir ne amade bin, vê peywirê yekî jî malbata pîr tîne ciha. Cilên spî li mirî dikin û dîsa kafen lê dipêçin. Piştî van tiştan jî bo definkirinê bi bilûr, def û şîbabê mirî datînin ser çardarê. Û cemaet bi hev re cenaze dibe gorê.

Definkirina cenaze bi roj pêk tê. Berê gorên ku tîna kolandin didin rojhilat. Dema ku cenaze tê veşartin feqîr lawîja “Serêmergê” dixwînin. Ku mirî jin be kevir datînin hem bin serê wê hem jî bin nigên wê. Ku mirî mêr be kevir tenê datînin bin serê wî.

Kesê/a mirî rêzdar an jî ciwan be merivên wî/ê porê xwe dibirin û bi kêlikê gorê ve dikin.

BAWERÎ - 2

Yekîtiya êzîdîtiyê bi koçkirina ruhan hatiye parastin. Bingeha ola êzîdîtiyê koça ruhan e. Car caran kesekî ezîz bi zanîn an jî ne bi zanîn bi ruhê êzîdiyekî oldar tê dagirtin. Dema ku dor tê ser, ew jî derbasî kesekî din dike. Şêx Adî Bîn Misafîr jî bo koçkirina ruh a pîroz ku derbasî bedeneke din dibe mînakê herî nêz e.

Ola êzîdîtiyê rêzikên sinc û rastiya gerdûnî, rastî û xeletî, dadî, heqîqet, disozî, dilovanî û hezkirinê tîne gel hev. Xerabiya ku perçeyek ji jîyanê ye wek karê heyîneke derxwezayî nayê dîtin.

Îbadet her roj bi awayekî bê kêmasî rojê sê caran

tê pêk anîn. Mirov berê xwe didin roja ku sibehê hiltê, nîvroyê bilind dibe û êvarê diçe ava, duayên taybet dikin û îbadeta xwe pêk tînin.

Êzîdî jî bo îbadetê li cihekî taybet nagerin. Lewre Xwedê li her derê ye. Bi baweriya êzîdiyan roj pîroz e. Û tekane rê ye ku diçe ba Xwedê. Loma jî jî bo îbadetê ku berê xwe bidin rojê bes e. Lewre di navbera Xwedê û evdan de diwar tune ne. Mirov dikare li her cihê ku lê be berê xwe bide rojê û îbadeta xwe bike. Piştî ku li hemberî rojê dua tê kirin, çongên xwe didin erdê û axa pîroz maçî dikin. Dema ku îbadet tîna kirin duayên taybet tîna xwendin.

Her êzîdî mecbûr e ku fanîleyê spî yê bi navê “TOKA” li xwe bike.

(Xwedê bangî Melekê Tawus kir û rêveberiya cîhanê jê re hişt, toka lê kir. Êzîdî jî bo bîranîna wê rojê tokayê li xwe dikin.)

Piştî ku Xwedê cîhan afirand dora girseya li hemberî xwe xêz kir, nîşan da û got; “va ye ev gel ê te ye.” jî ber vê yekê li dora kesekî/e êzîdî xêzek bê xêzkirin, li gora baweriya êzîdiyan ew kes nikare derkeve derveyî xêzê; heta ku kesê/a ku xêz, xêz kiriye li dora wê, xêzeke din xêz bike dikare derkeve. (Mirov êdî rastî baweriya çemberê nayê.)

Mirîdên Şêx Fexredîn kundir naxwin lê ne heram e jî. [Şêx Fexredîn jî dijminan direve dikeve binê darê (dara kufîrê). Dar pelên xwe diweşîne. Destûrê nade ku Şêx xwe veşêre. Şêx dikeve nava kundiran, kundir wî vedişêrin. Ji ber vê yekê mirîdên Şêx Fexredîn kundir naxwin.]

Mirîdên Xatûna Fexriyatê li zeviyên nîskan naxebitin.

(Zarokek jî zarokên Xatûna Fexriyatê li zeviya nîskan miriye.)

Mirîdên Şêx Şemsedîn goştê xezal û masiyan naxwin.

Êzîdî xas (marûl), kelem û gulkelemê naxwin.

LALIŞ

Laliş, li Başûrê Kurdistanê, 10 km li bakurê navçeya Duhokê Êsivê li geliyekî teng e. Gava ku mirov dikeve gelî avahiya ku pêşiyê tê dîtin Pira Siratê ye. Li vê derê hûn mecbûr in ku pêlavên xwe derxin û bi nigên xwas li gelî bigerin. Li vî geliyî her der û her tişt pîroz e.

Li gelî perestgeha ku gora Şêx Adî û perestgehên biçûk ên li dorê, şikeft, çavkaniyên ava pîroz û

turbe hene.

Di perestgeha mezin de gorên Şêx Adî,
Şêxûbekir, Şêx Hesên hene.

Li gelî şeş qube hene û ji wan a herî mezin a Şêx
Adî ye. Qubeya Şêx Ebûberkat, Şêx Hesên,
Kaniya Spî, Şêmşelâh û Şêşims e. Di her
qubeyekê de 24 hene. Di her beşeke saetê
nîşan dide. Ser qubeyê asîman, binê wê jî rûyê
erdê temsîl dike.

Hema li pêşiya perestgeha bingehîn "Sûka
Merîfetê" heye. Qada ku mirov piştî mirinê ji bo
kirinên xwe yên li cihanê tê pirsyarikirin e.

Li perestgehê peywirdarê herî mezin "Babê
Çawîş" e. Ji bilî Babê Çawîş, "Feqra" (rahîbe) kesa
ku qet nezeweciye û xwe daye xizmeta
perestgehê û ji bo paqîjiya perestgehê yek ji
malbata Feqîr li perestgehê dijîn.

Kesek ji malbata Feqîr bi rojavayê re fitîlên ku ji
aliyê Feqrayan ve bi zeytê hatine şilkirin pêdixê û
paşê dibe li 164 ciyên gelî datîne. Her fitilek
kesekî mexin ku ji vê olê re xizmet kiriye temsîl
dike.

Ji ber ku bi baweriya wan Êzda (Xweda) Melekê
Tawus roja çarşemê afirandiye, ew roj wek rojeke
pîroz tê dîtin. Mirov roja çarşemê diçin serdana
Lalişê. Dema ku derbasî perestgehê dibin şêmuğa
derî maçî dikin û hinek pere datînin. Pereyê ku ji
serdana perestgeha mezin tînin ji aliyê malbata
Feqîr ve tê hilanîn. Bi vî pereyî pêdiviyên
serdêran tînin pêkanîn. Li her perestgehê
micêwirek heye. Micêwir xweytiya perestgehê
dikin. Hatina ji serdanan ji micêvîran re ye.

Ayînên din ku roja çarşemê pêk tînin ji aliyê
Qewalan ve lawîja Beyta Êvarê ku li du tirbên li
Başîk û Bahzanê ne tînin xwendin e. Lawîja ku
piştî rojavayê tê xwendin pazdeh deqîqeyan
didome, nêzî xelasbûna lawijê fitil tînin pêxistin,
bixurdank tînin gerandin.

Piştî Lalişê li gorî êzîdiyan cihê herî girîng Bozan,
bi navê dinê Lalişa Biçûk e. Tevahiya turbeyên
ku li Lalişê ne (ji bilî ya Şêx Adî) li vê derê jî
hene.

Kesên herî mezin ên ola êzîdîtiyê Mîr û malbata
wî ne, li Beadreyê dijîn.

Piraniya Qewalan jî li Başîk û Bahzanê dijîn.

Êzîdiyên li herêma Lalişê dijîn, mucemmeh û
gund; Başîk û Bahzan, Bozan, Beadre, Xetar,
Doxat, Mehed, Şêx, Kerranê, Êsivnê Babîr, Şariya,

Xankê, Niseyri, Mamreşan, Bêvan, Cerehî,
Serheçkê, Niferî, Xoşava, Bêdnar, Musekan,
Mehmûdan, Mukublê, Kendalê.

ŞENGAL

Piraniya êzîdiyan li herêma Şengalê dijîn.
Êzîdiyên ku li herêma Şengalê ne ji nîvî zêdetirê
wan li baregehên ku ji wan re dibêjin mucemmeh
dijîn.

Mucemmeh di sala 1975'an de ava bûne.
Armanc, êzîdiyên ku li çiyayan dijîn wan li
herêmên wargehên mezin bigihînin hev û
venêrîna li ser wan hêsan bikin e. Li bakurê
çiyayê Şengalê 7, li başûrê wê 5, bi tevahî 12
mucemmeh hatine avakirin.

Mucemmehên li bakur: Xanasor, Sinun, Dugur,
Dokla, Borik, Gohbel û Zorava ne.

Mucemmehên li başûr: Tilizêr, Sîba Şêx Xidir,
Girzerik, Girêkeçka û Tilkasab.

Ji bilî Xanasor û Sinunê av li tu mucemmehan
tune ye. Li her mucemmehê bi qasî 25-30 hezar
êzîdî dijîn.

Li tu mucemmehan gor tune ne. Êzîdî miriyên
xwe dibin li gundên xwe yên çiya vedişêrin.

Li gorî herêma Lalişê, li herêma Şengalê turbe
nînin. Li herêma Şengalê ji turbeyên herî girîng
yek Turbeya "Çil Mêr"î ya li lûtkeya çiyayê
Şengalê ye û ya din jî turbeya Şerefedîn e ku li
bakurê Şengalê ye (lawê Şêx Hesên ê bêsiûdî ku
di şerê tirkên û mogolan de li gel tirkên şer kiriye
jiyana xwe ji dest daye ye.)

Turbeyên ku li bakurê çiyayê Şengalê ne;
Şerefedîn, Hacalî, Êzî, Şêşims, Şêx Berkat, Şêx
Bilkasim, Xatûna Fexra, Pîrê Ewro.

Turbeyên li başûr jî; Şêxmend, Amadîn, Şehîd.

Herêma Şengalê herêma ku Feqîr herî zêde lê
dijîn e. Feqîr "Şêrik û Kulik" didin serê xwe.
Kirasekî spî, bi ser de jî "Şêxanî" û bi ser wî de jî
xirqe li xwe dikin. Her êzîdiyê ku di cemaetê de
ye milê rastê yê Feqîrê ku ev xirqe li xwe kiriye
maçî dikin. Rengê xirqeya ku rîsîn e ya spî yan jî
reş e. Kesê ku xirqeya reş li xwe bike di nav
Feqîran de di pileya herî bilind de ye. Ji xirqeya
reş re dibêjin xirqeya Şêx Adî. Kesê xwediyê
xirqeya reş dema ku dimire tevî xirqeyê tê
definkirin.

Feqîr piştî ku xirqeyên xwe yên qirêjî dibin dişon
ava wan dirêjin "Silavgah" a ku li meydana gund
e. Xirqeyên xwe yên ku kevn dibin jî datînin

silavgahê û di rojêke diyar de ji wir berhev dikin dibin çiyê û li wê derê vedişêrin. Gava ku xirgayeke bêxwedî dibînin ji wê derê wek silavgahê dipejirînin.

Cilên jinên li herêma Şengalê ji yên herêma Lalişê bi tevahî cudatir in. Li serê jinên herêma Lalişê serpûşa ku bi “Kumik û Reşik” bi nav dikin heye. Kirasên rengîn li xwe dikin û bi ser de jî kemna ku navê “Mêzer” lê dikin girêdidin. Bi çar cureyan mêzer hene. Mêzera Spî, Mêzera Kesk û Qurmiz, Mêzera Feqrayî, Mêzera Kêra. Li piştî xwe jî şelemayê girêdidin. Li herêma Şengalê jî jin kofî û dolbenteke spî ku dirêjiya wê 7 metre ye didin serê xwe. Kirasên rengîn ên ku li herêma Lalişê dihatin lixwekirin li vir tenê spî ne û li vê herêmê mêzer nayê lixwekirin. Ji dêvla wê ve êlekekî reş ê ku jê re dibêjin “Kutik” tê lixwekirin.

Ji bilî hinek gundan ciyekî wek qehwexaneyê ku mêrên êzîdî diçin lê rûdinên heye. Jê re dibêjin “Koç”.

Extiyar bi piranî bi lîstika “Korik”ê dilizin. Li ser texteyekî ku 14 kortik tê de ne û bi 72 keviran tê lîstin.

Tevahiya xaniyên ku li herêma Şengalê ne bi kerpîçan hatine avakirin.

Herêma Şengalê bi tirî û hêjîrên xwe navdar e.

Guldesteyek helbest

Mizgîn Ronak

Bênav

Çivîk tenê bûn
Xeyîdîbû dilopa baranê
Kulîlk tirsîyabûn
Tîrsa xatirxwestina kulîlkan bû
Bêhna payîzê
Ewrên spî lihêfên çivîkên baxçeyan bûn
Min dikuştin, min digot:
“Di berîka min de gul hene”

Çivîkên piştî baranê



Laliş, li Başûrê Kurdistanê, 10 km li bakurê navçeya Duhokê Êsivê li geliyekî teng e. Gava ku mirov dikeve gelî avahiya ku pêşiyê tê dîtîn Pira Siratê ye. Li vê derê hûn mecbûr in ku pêlavên xwe derxin û bi nigên xwas li gelî bigerin. Li vî geliyê her der û her tişt pîroz e. Laleş – Avrêl 2005

Hin çivîk tenê piştî baranê dixwînin
Dibe ewrekî mawî xatirata baranê
Û dizimzime li navbera min û te
Hin ewrên mawî
Tenê li navbera min û te dixumxumîn
Mîmoza pêlên ava spî li hişê me dixin
Dengê qurquroka dibe çîrok
Bêriya riyên dûr dikin piyên me
Ax! Xwendina çivîkên piştî baranê
Çûyîna baranê ye
Ax! Çivîkên piştî baranê
Lehengên bê nav û nîşan
Ax! Çûyîna baranê
Xwendina çivîkan a ji birînê ye!

Baran tenê bû

Baran tik û tenê bû, em tik û tenê
Hin gul tenê li Amedê vedibûn
Xweziya te zaniba ku ez
Çiqas ditirsiyam ji mijê
Çiya derbas çiya derbas
Çiya derbas dibûn ji rûyê min
Ewrên ku efkarên li baxçeyê min direvandin
Tîbûna ku xwe li ber sûretê min ê
Li avê datanî...
Xweziya te zaniba min
Çiqas bêriya moriyên te yên şîn dikir
Baran tik û tenê bû.

Hindik ma

Dê bayê sibê mija şevê bibe
Baran ewrên reş nehêle
Li ser serîkokên me yên bi derd û keser
Hindik ma!
Dê lêvên te bigihîjin kulîlkên
Li rewrewka xezalan
Hindik ma!
Dê siya qulingan bireqise li ser
Bedenên me yên li bexçên payîzê

Gulên êvarê

Gulên êvarê çûn em bê dost man

Pel weşiyar em tazî man, tipîtazi
Wek çivîka ku nişka ve serê xwe
Dirêjî tenêtiya te bike û bixwîne û bêje:
Hatim ez, kanên gulên êvarê?
Çima kes ji baranê bawer nake?

Tu (Bo dilê min)

Omer DILSOZ

“Dilê malxirab bila bi dil be
-hez ke- tûrê parsê bila li mil be”

Ji warê min yê bê ez
Ezekî bê kes...
Tê de tu heyî, tu!
Ji axa wê,
Ji ava wê,
Ji bêhna wê;
Têhna te tê, te!
Tu tê tu...
Di her kitekitê de
Tu vedigezî ser dil
Di her livînê de
Te hîs dike dil!
Te...

Xewn tu yî,
Evîn jî tu

Kul tu yî,
Hêvî jî tu yî!
Tu...

Tu ey strana zîz!
Gula bişkojk...
Stêrka geş,
Ma niha li ku yî, li ku?
Çav te nabînin,
Pêjn te nastînin,
Pa li ku yî tu, li ku?

Tu...
Tenê vebêjek,
Dengek,
Û dîlopek î!
Lê xasma her tiştî bo dilê gêj;
Jiyan,
Giyan
Û neman î tu, neman!

Tu ya di min de bûyî ez,
Bûye vejeng û hêz.
Lê kes "ew tu" jî nîn î;
Ew a di hundirê min de bîvelerz.

Na, naxêr!
Ew tu pir cuda yî
Ji stêrkan vejîyayî,
Di hestên min de ariyayî
Raperîyayî...
Ta ku hilçûyî,
Lew tê de ava bûyî!

Pa çawa te vebêjin peyv?
Peyvên birîndar...
Hindî birîndar in bê hemdê xwe ne,
Ne hayî ji xwe ne,
Lew, ger ku çendî vebêjim
Peyv ne ji lewnê te ne,

Tu, ey stêrka berbanga nû!
Mizgîniya nûbihara vejîyayî...
Li bin perdeya xewnerêşkên rûpêç
Ca xwe bilivîne!
Naxwe dîwarên bi tîlên jengarî rêsayî
Dê bipêçin evîna me ya kûvî,
Bişikênin dilê xwerû hêvî...
Û werin dorhêla min û te,
Wê bizivirin mîna koremarî
Bizivirin li dora m(in)(t)e!

Lê, min tu spartî dilê xwe

Ew dilê ji te re welat,
Bê pejn,
Bê ez
Û bêyî xwe...
Bes tu li wir î!
Tu, ey gulnixwîna çiyayî, tu!

Li wir, li jêr...
Di bin meşa stêran de, tu!
Awirşikestî,
Heçko westiyayî.
Çav pirpiçûyî...
Ëvro (îro) bişkurîna te jî sar e,
Xemgîn û birîndar î qey?

Rast e
Ez dizanim şevexwînên wir;
Sîberên reşûkî,
Dengên olander,
Tirsên biçûkî,
Sehma hezkirinê,
Û reva ji xeyalên xwe...

Ez dizanim,
kengî avis dibe bihar
Kanî dizên,
Dikemilin terazin.
Hingê dîsa gera bîranînan tê serdana te
Tu dibî malovana hestên min,
Weke her car...

Tu sedema cenga min a dijar,
Hêrsa min a har;
Ka bêje;
Pa ez çawa te bînim ziman?
Te derbirînim bi çend biwêjên lawaz,
Hevokên veqetok
Yên bê bireser

Na, nexêr!
Ew nikarin te vebêjin
Tu,
Ango tuya di nava min de dijî
Tuya bersiva hemû vebêjên xweşik
Tuya ji zelaliya ava çiya,
Ji paqîjiya axa kûvî
Û ji bedewiya rojê pêk hatî!

Tenê nepeniya awirên dizok,
Lerizîna peyvên tirsok
Û bişkurîna gezok dikare te vebêjin.

Tu rondika çavan î,

Xwîdana eniyan î
Û xwîna ruhan î!...

Tu û ez

Ayhan ERKMEN

Ez Mem
Tu Zîna min
Ferman daye
 mîrê mîran
Şev û roj yek in
Jiyan zindan e
 bê te (bo) min

Ez Huso
Tu Naza min,
Siyar kirine tu
Roja çûyîna te
 kul û kurmexwarî ye
Ser bedena min
Ya yekî din î
Ev e mirina min

Ez Selîm

Tu Ferîha min
Wan
 Wanê tu bûyî xeyala min
Gîlîdax ne tenê meskenê min
Hesreta min
 Bîrbûna min
Min bihîst tu dane
Ev e binketina şerê min
Tobe be erdê Wanê bê te min

Ez Sîyabendê Silivî
Tu Xeca min
Şîret bûn pezkûvî
Dan pey min
Jiyan valabûna xwarê
Ez vala dibim valabûnê

Ez Cembelî
Tu Binevşa min
Çûyîna te ne bi dilê te ye
Bedena te li wir hişê te li ba min
Li ku derê dinihêrim te dibînim
Tu belav bûyî her dera jiyana min

03.01.2007-Bazarcix

Derman tê ji xaka welat

Sîpan XIZAN

Welat îro birîndar e
Bi birînên şûr û rîman
Birînpêç amadekar e
Derman tê ji xaka welat

Lewra birîndar e welat
Ji destên hevkarên bêbext
Bo birînpêç hêvîdar e
Derman tê ji xaka welat

Dibînin em birînpêçan
Xebatkar in li Kurdistan
Dipêçin ewan birînan
Bi pêçekên xaka welat

Dermanên bo birîndaran
Bi taybetî bo Kurdistan
Hatiye dem bizanin em
Bi dest birînpêçên welat

Çêbûn birînpêç û loqman
Fedakar in bo Kurdistan
Dipêçin ewan birînan
Bi pêçekên xaka welat

Birînpêçên bi kar û bar
Welat bo wan her hevîdar
Dipêçin ewan birînan
Bi pêçekên xaka welat

Xemkêş û dilêş im ez
Ji bo te ra xaka delal
Birîndarên şûr û rîman
Derman bêt ji xaka welat

Birînen li gerdana te
Piştewanya xwefiroşan
Birînpêç dê bînin derman
Dermangehên xaka welat

Xemdar mebe derman bo te
Bi destên birînpêçên te
Derman bike wan birînan
Bi dermanên xaka welat

Birînpêç her dikudîne
Bo birînan derman tîne
Bo birînen şûr û rîman
Dermangehên xaka welat

Şûr û raman birîndar in
Bo birînan ne xemdar in
Lew birînpêç amade ne
Derman tê ji xaka welat

Birînpêç her cefakar e
Bo birînen şûr û rîman
Derman dike bi zanyarî
Bi dermanên xaka welat

Bo birînpêç sipasdar in
Dermangehên Amed Sîpan
Ji bo bindariya welat.

15/11/2008

Gemiya jiyanê

Abdulrahman Seyid Îsa

Şano: 25.01.2001

Wêne: Ebdulxefûr Hisên

Lehengên Şanoyê

Vejîn

Xanê

Mîrzo

Dîno

Hemo

Ciwan

Rênas

(Holek diyar dibe, gemî ye. Vejîn bi stûna wê ve rakirî ye. Li çepê dîreksiyona gemiyê ye. Çar sepet. Dengê ba, bahoz û tavanê kêr dibe, yê vejîn radibe.)

Vejîn: Zincîra dîrokê hev dikişîne, reş û spî, bedewbûn û kirêtî, sar û germ, Ehrîman û Hurmiz, roj û şev... Di terazoyekê de yek yekê dadigerîne, geh bilind dibin, geh dikevin, geh li vir, geh li wir. Di demekê de kêşe dergûşkî diket. Bê deng ma. Niha xwedanê şer pencên xwe, pêlên xwe davêjin pêsîra ronahiyê. Bi kevnîkê wê dorpêç dike û wê di binê deryayan de noq dike, vedişêre.. vedişêre da ku biharê ziwa bike û gemiya we rawestîne di nav pêlên har û tund de we bê hêvî bihêlin.

(Pêl bilind dibin, dikevin, radibin, rast û çep, dengê ne zelal ser qîrên Xanê)

Xanê: Bêlome be, hawar li me û vê tofanê, li me û vê qelanê, li me gidyano gazî kê kin?!
Li me û li perê bazan!

Mîrzo: (Bi nîfret) De bes bes, Xana ser bi rişk. Giş çiftiya te ye, wê talî ev gotinên te serê me bixwin. Haya kê ji me heyê hey lê.

Dîno: Hi... hi ha... haya dîrokê ji me heyê.

Hemo: Ma kê em di vê rewşê re derxistin. Ne gotinên ên wek te dîn û vê dîroka jehr.

Ciwan: Ana ne dema van gotinan e. Hûn nabînin çî dibe, bibin alîkar.

Vejîn: Dîrok mihrebanîyê li bêçaran nake, yên ji êşên xwe çareyê peyda nekin li ber toza dîrokê diçin. Winda dibin, ji bîr dibin.

(Tev destên xwe davêjin dîreksiyonê. Her yek bi rexekê ve dikişîne)

Hemo: Ka ka bi vir de!

Mîrzo: Na lo bi vir de!

Ciwan: Berdin, bela wek Rênas be!

Hemo: Ê na bi vir de!

Mîrzo: Na wele, bi vir de!

(“Bi vir de, bi wir de” çend caran dubare dibe. Mîrzo ji wan diqete)

Mîrzo: Haho we serê me qoqiland! We guhê me bir! Tu bê yek tiştêkî têxe destê mirov, an mirov jê fêr bike tune ye!

Ciwan: Hêdî hêdî birayê Mîrzo, rehmetekê li bavê xwe bîn, bela bîna te fireh be.

Mîrzo: Ma bîna fireh tê de hiştin!

Hemo: Tiştê ez zanim, çî bê serê me ji bindestiya me ye. Hema ji nivê rê ji yek vegere ne poşmanî ye, lê çî fêde?!

Rênas: Heger di mêjiyê mirovekî de valahî hebe gelekî dijwar e. Ev gotinên we pêlan har dikin û kar, meş dilebike. Heger em bi yekdestî li ser yek rîtmê bi hev re li pêlan bidin em ê wan bişikînin.

- Mîrzo: Bavê mino, em westiyan. Ma mêjî maye?! Ne gerek di deh rojan de em gihabûna, va ye bû pazdeh roj. Wextî nan biqede û av nemîne. Em xwe li ber birçîbûnê nagirin îcar çawa li ber bahozên reş û keleşên behran bigirin!!
- Ciwan: *(Destê xwe bi xurtî li keştîyê dide)* Ma dest û lingên me girêdayî ne Mîrzo? Mêjiyê ku ev gemî çêkir wê gemiyê bigihîne peravan, çiqas zor û zehmetî jî hebin.
- Dîno: Tu heyî, tu heyî. Tu tune yî, tu tune yî.
(Hemû bi meyzandîna li dor xwe jî ser sepetê dikutîne)
- Hemo: Batil, batil.. batil. Mala me xera bû û hew. Hema bi telaq bej nemaye law! Çirîskeke çî ye ne xuya ye.
- Xanê: Stara Xwedê, xêrxwaz be. Ê dûre tiştê Xwedê kiriye betal nabe.
- Vejin: Kesê di tariyê de ronahiyê nebîne ne korê jî çav e, korê mêjî ye. Yê ku li benda mirina xwe be, li mirina xwe meyze bike, berê mirî ye. Yê keda xwe neparêze û xwe li ber pêlan negire dibe nêçîra keleşan, para lawiran. Ceng giran e, lê cenga me jî girantir e.
(Pêl careke din har dibin û Rênas cih bernade)
- Hemo: Heyra bi Xwedê veger tenê çare ye ha! Di vê meşê de em ê winda bibin. Hin bi hin pêl girantir dibin.
- Mîrzo: *(Bi qerf)* Te got û em vegeriyan, hi! Ka yê bi ser rê vebe.
- Dîno: Ê mêr carekê tenê dimire. Hema yê tirsonek rojê deh caran dimire. Tu heyî tu heyî. Tu tune yî. tu tune yî.
- Hemo: *(Xwe çen dike ser sepetekê)* Ez bi xwe nema baweriya min bi vê gemiyê tê. Hema girek, kendalek, kevirek, tehtek, lo darekê ez bibînim, ez ê xwe bavêmê.
- Xanê: Eyûb bi sebrê giha Misrê, bila sebra we hebe kurê min. Piştî tengahiyan firehî ne. Xwedê yek e û dergeh hezar in.
- Rênas: Di dîrokê de gelek caran tofanên mezin bi mirovan de rabûne. Lê yên xwe li ber girtin jiyabûn; ew kesên destên hev girtin, bi evînî û bi hêvî li peravan geriyan, bi ser ketin, nameya pêxember Nûh bo me simbol e û di heman ciyê de îro dîsa tofan radibe û va ye Cûdî careke din serê xwe hil dide û kevokên mizgîniyê difirîne.
(Hemo xwe jî ser sepetê davêje)
- Hemo: Yabo yê min bi xatirê we.
- Mîrzo: Çi?! Bi xatirê me?! Bi ku de Hemo?
- Hemo: Wa ye min jî xwe re tehtereşek dît. Ma nexwe wê av bide ser.
- Mîrzo: Kuro xwe ehmeq neke.
- Hemo: Bila sebra Nûh jî Xanê re be. Ê gemiya Nûh jî jî Dîno re be. Ka ku Nûh miribûya, ne em hebûn û ne tofan çêdibû.
- Hemo: *(Ji nav destan xwe davêje)*
- Na!
- Koro na!
- Dîno: Hemooooo *(Digirî bi sazekî bi şîn).*
- Vejin: Dara xurt serê xwe dixwe bahozan û şaxik tenê dihejin û pesnê dara xwe didin, lê dara sîfil li ber bê jî kokê radibe. Xwe bi daran xurt kin bablîsokên giran tên. *(Dengê ba û bahozan bilind dibe. Diyar dibe ku av ketiye gemiyê. Ji livandinên wan diyar dibe ku avê jê davêjin)*
- Mîrzo: Perda gemiyê berdin. Perda wê berdin heyra! Perdê! Perdê!
- Rênas: Di vekirina perdê de niha tehlûke heye, mirin e. Bablîsok li hev dizivire, ji her çar hêlan ve em dorpeç kirine, wê me di nav vê behrê de noq bike.
- Mîrzo: Na, na! Vekirina perdê wê lezê bide meşa me û me jî van gerînekan derxe. Ma perde ji bo çî ne hawara Xwedê?!
- Rênas: Ez ji te re dibêjim: Bahoz ji çar hêlan ve ye. Ku em perdê vekin dibe ku xwe li ber

- bayê negire û gemiyê bi xwe re xewr bike. Çawa di mijê de nêçîr nabe, niha jî ne dema vekirina wê ye. Heta dema wê bê. Tişt di dema xwe de...
- Mîrzo: Tew! Belkî ev ba nema bişikê. Em man wilo?!
- Rênas: Ê kelekvan be bi esrarên behran dizane. Di vê meşa me de me gelek ked da, me heval dan; bûn qurban, ji bo gemî xewr nebe. Çavê te lê ye em dawiya xwe bînin, wek Hemo? Na. Lê ez dibêjim ê pir çûye û ev rewş wilo nadomîne.
- Mîrzo: Hemo bû qurbana nezaniyê. (Û Dîno haş dike) Hemo li ruhê xwe ayil bû. Bê sebir bû. Çû bû dersek. Erê bû dersek.
- Xanê: Hemo ji destpêkê de bê sebir bû.
- Rênas: Rast e. Tehemûl divê, çimkî kes bi hêsanî nagihê peravan. (Hildikişê ser sepetekê) Çend gavên din wê hinekî ba bişikê.
- Mîrzo: *(Bi eşq)* Em perdê berdîn. Em berdîn. Em... em... perdê... perdê...
- Rênas: Wa serê çiyayan xuya dîkin.
- Tev: Hêêêêê!
- Xanê: Şabaş!
- Mîrzo: Em perdê berdîn? Em...
- Rênas: Lê taveke tarî û giran xwe berdide pêşiya me. Bila bîna we fireh be. *(Her yek li ser textê xwe li cî dimîne)*.
- Vejin: Ey ewrên pûç,
Tarî û reş.
Çiqas giran bî.. bilind bî
Dengê te
Rengê te
Çiya venaşêre
Venaşêre çiya.
Wê kevokên spî li ser stûna gemiya jiyanê birêsin... Sîwan bikin
Sinbilan bînin
Mizgîniyê bînin
Çendî sert û ingirî bin,
Pêlên xav
Ziwa û derewîn
Nikarin gemiya jiyanê rawestînin
Wê gemî peravê biramûse
(Di ber vê gotîna Vejin re tev dikevin rêzê li pey Rênas. Û ew dewam dike)
Bi simfoniya jiyanê re,
Di rûpelê dîroka nûjen de
Hêdî hêdî
Di navbera du çeman de
Keziya duwemîn
Ji Cûdî re
Bihûne.
(Bi lîlandîna Xanê re kevokê difirîne û tev bi hev re, bi yek livê û yek rîtmê)
- Tev: Hê him... Hê him... Hê him... hah...
(Wilo deng dom dike, mîna ku gemiyê dajon û pê re dengê tavanê)

(Perde tê girtin)

Ezop (Aisopos)

Amadekirin û wergerandin: Amed Çeko JIYAN

Ezop (620 - 560 B.Z.), bi gotina rast û di cî de, çîrokbêjê herî navdar e li cîhanê. Taybetmendî û navdariya Ezop ji çîrokên wî yên ku lehengên wan ajal in tê.

Tê angaştin ku Ezop beriya zayînê di sedsala 6'ê mîn de hatiye dinyayê. Dîrokzan di mijara cîyê Ezop lê hatiye dinyayê de hê jî li hev nakin. Lê tê angaştin ku Ezop li cîyek ji van cîyan hatiye dinyayê: Afyon, Frîgya, Samos, Sardes, Trakya, Misir. Cîyê Ezop lê hatiye dinyayê ji sedî sed nayê zanîn lê dîroknûs hemfikir in ku Ezop li Yewnanistan û giravên li dorê jiyaye û her wiha li gelek deverên din ên dinyayê jî geriyaye.

Ji ber ku agahiyên der barê jiyana Ezop de tenê angaş in, di gelek çavkaniyan de der barê jiyana Ezop de wekî agahî wiha tê gotin: Ezop B.Z. di sedsala 6'ê mîn de li Trakyayê hatiye dinyayê, demekê li girava Samosê kole bûye, piştî ku hatiye azadkirin, bi keştiyê li gelek deverên dinyayê geriyaye û li Delfiyê bi awayekî xedar, bi kêran hatiye kuştin.

Angaşta herî xurt der barê jiyana Ezop de ew e ku Ezop bi eslê xwe ji Etîyopyayê bû. Lêkolîner wiha didin diyarkirin ku li Yewnanistana berê ji bo kesên reşik peyva 'Etîyopyayî' dihat bikaranîn û bilêvkirina vê peyvê dişîbiya bilêvkirina navê Ezop di yewnaniya berê de. Piraniya ajalên ku lehengên çîrokên Ezop in li Yewnanistanê û Ewropayê najîn. Lê ev ajal li Afrîkayê dijîn û lêkolînan vê yekê wekî îsbateke ku Ezop ji Afrîkayê (Etîyopyayê) ye dipejirînin.

Li gorî hin lêkolîneran dibe ku hin çîrokên Ezop ji serpêhatiyên Hekîmê Loqman hatibin veguhestin.



Heta niha tu pirtûkeke ku Ezop nivîsiye nehatiye dîtin. Jixwe di tu çavkaniyan de jî qala pirtûkeke ku ji hêla Ezop ve hatibe nivîsandin nayê kirin. Lewre ji dêvla peyva "Çîroknûs" ve peyva "Çîrokbêj" çêtir e ku ji bo Ezop bê bikaranîn.

Yekemîn berheva çîrokên Ezop B.Z. di sedsala 4'ê mîn de ji hêla Demetrîosê Falerosî ve hatiye nivîsandin. Ev pirtûka ku ji çîrokên Ezop pêk tê, P.Z. di sedsala 1'ê mîn de ji hêla Phaedros ve bi latînî û ji hêla Babrios ve bi yewnanî ji nû ve hatiye nivîsandin. Hemû pirtûkên Çîrokên Ezop ên heta niha çap bûne, xwe dispêrin van pirtûkên navborî. Her wiha nivîskarê fransî Jean de la Fontaine bi awayekî

berbiçav di bin bandora Ezop de maye.

Taybetmendiya Ezop ew e ku di çîrokên xwe de lawiran dide axaftin û bi vî awayî dersê dide mirovan. Di çîrokên Ezop de vegotin û diyalog basîd lê bibandor in. Meseleya ku Ezop bi çîroka Rovî û Jûjî siyasatmedarekî diz diparêze, Arîstoteles wiha vedibêje: Ezop li dadgehê dibêje; serê roviyekî bi spiyan re ketiye belayê. Dema ku Jûjiyek hatiye cem rovî û jê re gotiye ku dikare wî ji wan spiyan rizgar bike, rovî wiha bersiv dayê, "Na, ev spî ji mêj ve di laşê min de ne û jixwe êdî têr bûne. Heke tu van spiyan ji laşê min derxî, dê hin spiyan ku ji van birçîtir in bikevin laşê min û dê zêdetir xwîna min bimijin" û piştî Ezop berê xwe daye jûriyê û gotiye; "Endamên jûriyê yên rêzdar, heke hûn muwekilê min ceza bikin dê yekî ku bi qasî wî dizî nekiriye û zengîn nebûye bikeve şûna wî û dê zêdetir diziyê bike."

Ezop bi piranî ji bo ku dersên exlaqî bide, di çîrokên xwe de bûyerên ku pêkan e bên serê mirovan, wekî ku di nav ajalan de qewimîbin vedibêje û di dawiya çîrokan de nesîhetekê li mirovan dike.

Gelek çîrokên ku wekî çîroka Kurmorî û Kulî û çîroka Kîvroş û Kûsî ku li ser navê Ezop belav bûne û hatine çapkirin, ji hêla gelek neteweyan ve wekî çîrokên wan ên neteweyî tînin hesibandin.

Desteçîrokek ji Çîrokinê Ezop

Kulî û kurmorî

Rojeke zivistanê kurmorî di hêlîna xwe de rûniştibûn û zadên ku havînê berhev kiribûn bi dilxweşî dixwarin. Kuliyeke jî li derve, di nav berfê de bû. Ji sermaya zivistanê çî mabû kulî biqerise. Kuliyeke perîşan pir birçî bû. Kuliyeke reben î birçî çû ber deriyê hêlîna kurmorîyan û ji wan hinek xwarin xwest. Kurmoriyekî ku derî li kulî vekiribû bi hêrs jê re got, "Çima te havînê qet xwarin berhev nekîr?" Kulî bersivand, "Qet dema min tune bû ku xwarinê berhev bikim. Min rojên xwe

bi stranan derbas dikirin." Piştî kurmorîyan got, "Heke tu ew qas bêaqil î ku havînê bi stranan diqedînî, nexwe divê tu heta dawiya zivistanê di nav livînê xwe de birçî govendê bigerînî."

Kîvroş û kûsî

Kîvroşkê rojekê kenê xwe bi lingên biçûk û meşa hêdî ya kûsiyê kir. Kîvroşkê kire tîqetîq û got: "Heke ku tu wekî bayê lezgîn bî jî ez ê karibim di pêşbaziya bezê de ji te derbas bibim." Kîvroşkê wisa bawer dikir ku ew ê li hemberî kûsiyê teqez bi ser bikeve. Li ser vê yekê jî kîvroşkê xwest ku pê re bikeve pêşbaziye. Her duyan li hev kir ku rovî bibe hakemê wan. Paşê bi hakemiya Rovî her duyan dest bi pêşbaziya bezê kir. Kûsî jî bo çirkeyekê jî ranewestiya, bi gavên hêdî lê qewî û zexm ber bi dawiya riya pêşbaziya bezê ve meşiya.

Kîvroşkê xwe li kêleka rê dirêj kir, paşê çavên wî giran bûn û kete xewê. Dema ku hişyar bû dît ku kûsî rê qedandiye, bi ser ketiye û li dawiya riya pêşbaziya bezê xwe dirêj kiriye û radizê.

Yên hêdî lê zexm di pêşbaziyan de bi ser dikevin.

Aşvan, lawê wî û kera wan

Aşvan û lawê xwe kera xwe ber bi bajêr ve diajotin da ku kerê bi buhayekî baş bifirosîn. Hê pir nemeşiyabûn, leqayî komek jin hatin. Jin li ser bîrekê kom bûbûn, dipeyivîn û dike-niyan. "Hele li wê derê binêre", got jinekê "We qet mirovên wisa dîtine? Kera wan heye ku lê siwar bibin lê her du jî peya ne." Zilamê pîr ev gotin bihîstin, bi lez lawê xwe li kerê siwar kir û ew peya û lawê wî siwar, meşa xwe domandin. Piştî keliyekê li ser rê leqayî komeke zilamên pîr hatin. Zilamên pîr ketibûn nava nîqaşên hûr û kûr. "Li wê derê binêrin", got zilamekî pîr û domand, "Va ye min qala vê yekê dikir; di vê serdemê de tu rûmet û qîmetê nadin mirovên pîr. Binêrin, lawîkê ciwan li kerê siwar e û bavê wî yê pîr peya ye. Ji kerê peya bibe bozîkê qîmetnezan, bila zilamê pîr î bêmecal lê siwar bibe." Li ser vê yekê, zilamê pîr lawê xwe ji kerê peya kir û ew li kerê siwar bû. Bi vî awayî bîpirsgirêk

meşîyan ta ku leqayî komeke parêzvanên mafên jin û zarokan hatin. Ji wan parêzvanan yekî got, "Çima tu wisa dikî, zîlamê pîr î tiral?" û dest bi giriyê kir û domand, "Çawa dilê te radigire ku tu li kerê siwar bibî û lawikê belangaz î şerpeze li dû te bimeşe?" Aşvan qasekê ponijî û piştî lawê xwe li paş xwe, li ser kerê siwar kir. Aşvan û lawê xwe êdî nêzikî bajêr bûbûn. Leqayî zilamekî ku ji bajêr dihat bûn. Dema ku wî zilamî rewşa wan dît, hema hilpekiya, hate cem wan û got, "Tika dikim mîrza, ji min re rastiye bibêje. Ev ker a te ye?" Zilamê pîr bersivand, "Erê, ker a min e." "Wax wax wax!", got zilamê bajarî û domand, "Ma wisa dibe? Li kera reben mêze bike, bêhal ketiye, nikare gavekê bavêje. Ma çima hûn her du bi hev re lê siwar dibin û vê zilmê lê dikin? Wele çi maye ker niha bimire." Li ser van gotinan aşvan û lawê xwe ji kerê peya bûn û ker hildan ser piştî xwe; wiha ker li xwe siwar kirin û heta pira li ber deriyê bajêr meşa xwe domandin. Dema ku ketin bajêr, xelkên di nava bajêr de li wan civiya û kenê xwe bi wan kir. Di nava wê qerebalixê de ker li ser milê bav û kurî liviya û her sê terayî erdê bûn. Dema ku tera bûn, lingê kerê şikest û xwe li erdê gevizand. Bi wî awayî heta kêleka pîrê çû û ket nava cem. Piştî vê bûyerê zilamê pîr û lawê xwe pir li ber xwe ketin, ji ber fedîyan serê xwe çimandin ber xwe û ber bi mala xwe ve meşîyan. Dema ku aşvan û lawê xwe ber bi malê ve dimeşîyan, aşvan têgihîşt dema ku mirov bixwaze dilê her kesî xweş bike, dê dilê tu kesî xweş nebe û ker jî dest here.

Dara zeytûnê û dara hêjîrê

Li derekê dareke zeytûnê û dareke hêjîrê li kêleka hev bûn. Dema ku payîz dihat, belgên dara hêjîrê diweşîyan û heta biharê dara hêjîrê wisa bêbelg, zelût dima. Lê ne payîzê ne jî

zivistanê belgên dara zeytûnê diweşîyan. Ji ber vê yekê dara zeytûnê her tim xwe dipesinand û kenê xwe bi dara hêjîrê dikir.

Salekê di nivê zivistanê de berf pir bariya. Gelek berf li ser belgên dara zeytûnê kom bûbû û giranî dida çiqlên dara zeytûnê. Dara zeytûnê nema li ber giraniya berfê li ber xwe da û çiqlên wê yek bi yek ji ber giraniya berfa li ser belgên wê kom bûye şikestin. Dara hêjîrê berevajî dara zeytûnê rihet bû lewre zivistanê hemû belgên wê weşiyabûn û berfê pir lê danîbû.

Nêçîrvan, kew û dîk

Nêçîrvanek, dema firavînê li malê bi tena serê xwe rûniştibû. Di wê navberê de hevalekî wî ji nişka ve hat mala wî. Diviyabû ji bo mêvanê xwe firavînekê çêke lê tûrikê nêçîrvan vala bû lewre wî nêçîr nekiribû. Diviya ji bo xwarinê keweke ku berê kedî kiribû serjê bike. Hê kew serjê nekiribû, kewê ji bo jiyana xwe bifilitîne kire lavelav û got: "Min serjê neke. Tu yê çawa bêtî min bijî? Beriya ku tu binivî kî dê ji te re xweş xweş bistrê? Kî dê gazî kewên din bike û bixe dafika te?" Li ser van gotinan nêçîrvan dev ji serjêkirina kewê berda û berê xwe da dîkekî xweşik ji bo serjêkirinê. Dema ku dîk girt, dîk xwe dakir bextê nêçîrvan û bi dengêkî ku dilê wî bi halê xwe bişewitîne got: "Ku tu min bikujî kî dê sipêdê bi banga xwe te ji xew hişyar bike da ku tu kar û barên xwe yên rojane bikî?" Nêçîrvan qasekê fikirî û piştî got: "Tu rast dibêjî, heqê te ye. Tu demên rojê bi min didî zanîn. Lê ji min û hevalê min re firavînek divê"

Ji bo birçîyan edalet nîn e

Şivanê gund, pir feqîr û belengaz bû. Lê ji şivaniya pez hez dikir. Him debara

ÊŞ

Berhevkar: Feratê DENGİZÎ

xwe pê fikir him jî bi colê pez re gera çiyê
pir pê xweş bû, ew dilxweş fikir. Di
newalekê de guhereke berfireh î xweş li
biniya zinarekî bilind hebû. Ev der raserî
newalê tev û nêzikî sikurê... Dema piştî
bêriya esirkî, şivan pezê xwe dikişand vê
guherê, serbest berdida çêrê. Li ser zinarê
bilind, tehtekî şayîk î xweşrûnişt hebû. Li
wir li ser tûrikê xwe rûdinişt û dest tavê
bilûrê... Dengê bilûra wî di newalê de zîz
dibû. Tevayê xwezayê bi aramî lê guhdar
dikir. Ji candaran, ji ajalan, ji teyr û
tirûran, ji dar û devîyan bigire, heta bi
kevir û kuçikan hestiyar fikir vê
xweşawazê û ber bi ezmanê bilind ve
belav dibû... Kezeba mirov dişewitand.
Colê pez wiha lê guhdar û di çêrê de...
Kêviyan jî guhên xwe qît dikirin û li vê
bilûra dengşewat î dilsot guhdar dikirin.
Wek ku birîna her kesî, her canlidarî, ya
bêderman û dilkeser dianî bîra wan...

Li nêzî tehtikê şayîk, şikêrek keviran
hebû. Marekî reş jî, qula wî di wê şikêrê
de bû. Wexta ku dengê bilûrê dihat mar,
ji qula xwe derdiket. Xwe fikir kilor û serê
xwe li ser kilora xwe datanî, guhdar fikir
û diket xewn û xeyalên bikeser... Wexta
ku deng ji bilûrê dihat birîn, hêdika diket
qula xwe û zêrekî sor dixist devê xwe,
tanî, datanî ber çoka şivan û bédeng û
bêhes diçû... Wiha, dostaniyek di navbera
wan de ava bû. Dostaniyeke ji dil û
bédeng. Her roj bernameyeke wiha.
Dengê bilûrê û di pê re zêrek. Zêrên şivan
her roj pir dibûn û halê wî jî her wiha
xweş. Mar digot; qet ji kesî re nebêje!

Rojekê şivan nexweş ket. Ket nava
livînan. Nexweşiya wî dom kir, kurê wî ji

dêvla wî şivanî kir.

Şivan bangî kurê xwe kir. Dostaniya
xwe û mar jê re eşkere kir û baş temînî lê
kir; “Nebî, nebî tu vê dostaniyê xera bikî
û xerabiyekê bi mar bikî!”

Kurê wî jî weke bavê xwe domand. Her
êvarî li bilûra xwe xist, silavên bavê xwe
got û zêrekî xwe hilda. Mar jî ev rewş
pejirand. Lê timayî ket dilê wî, ket dilê
kur... Ji xwe re got; “Rojê zêrek hindik e.
Ez ê mar bikujim û gencîneyê tevî
derxim.” Xwest biryara xwe pêk bîne.
Roja dawîn rahişt zêrê xwe û bi keviran
êrişî mar kir. Kevirek li teriya mar xist,
teriya wî qut kir. Lê mar jî bi ber êşa teriyê
û xofa mirinê bi hêrs êriş kir û pê veda,
lawik mir.

Dawiyê, gundiyan termê wî anîn û ew
veşartin.

Demeke dirêj şivan nexweş ma. Di pê
re çê bû û dest bi şivaniya xwe kir. Her
roj dihat cihê berê, bi şewatir li bilûrê
dixist, gazî dostê xwe fikir.

Lê mixabin mar nedihat...

Şivan dev jê berneda. Bilûr lêxistin ne
bes, bi gotinên şêrîn jî li ber mar digeriya
û dixwest derê derve û çend gotinan bi
hev re bikin, dostaniya xwe nû bikin.
Digot, “Min êşa kurê xwe ji zû de ji bîr
kiriye.” Li ser israra şivên, mar hew îdare
kir, rojekê derket derve. Şivan bi dirêjî
peyivî û xwest lê bibore;

“Ez zêran jî naxwazim. Tenê bila
dostaniya me bidome...”

Mar kûr kûr fikirî, paşê serê xwe
hejand û bersiv da;

“Heya ku êşa dilê te hebe, êşa kurê te
bi te re hebe û êşa teriya min jî bi min re
hebe ev dostanî nameşe... Em hew
dikarin bibin dost... Wiha dostanî nabe...”

Û herikî qula xwe.

Herêma Mêrdîn

Ji destpêka salên çilî heta nîveka salên şêstî,
ewrekî reş bi ser Kurdistanê da girt û hemû rê û

Hunermenda stran û nasna- meya qedexe

Aram GERNAS

dirbên pêşketinê li ziman û çanda kurdî hatin girtin. Asîmîlasyona herî giran di vê serdemê da hat meşandin. Zilm û tade, tirs û pêpeskirina gel a herî hovane di vê demê de hatin çespendin. Her dengê, her çirîskek û her hewldanek ku bêhna kurdîtiyê jê dihat, bû hedefa êrîşa rejîma dîktator. Bi kurtî ev serdem, di dîroka me ya nêz de wek serdema herî tarî û asîmîlekar bûye û di mêjiyê me de jî bi wî awayî rûniştiye. Serdema ku gelê kurd ji ber axaftina kurdî him bi diravî him jî bi hepis û êşkence hatiye zêrandin. Lewma jî, her deng û hewldanên ku tarî çirandine, xwedî maneyeke giran in, girîng û hêjayê pesinandinê ne.

Di demên bi zilm û zor, bi tirs û xof de çirîska pêşîn, dengê pêşîn, guleya pêşîn hewldanên lehengiyê, hewldanên bi rûmet û xwedî roleke girîng in. Zû bi zû nayên jibîrkirin. Di salên şêstî de yek ji wan dangan him tirs şikand him jî bû peşkek ava hênîk bo dilên bi kul û kovan. Ev deng di demeke kurt de bû geştêrkek û di dilê gelê kurd de textê xwe danî. Bi deng û awazên xwe hestên mirî, hestên tevizandî ji nû ve vejinand û şahiyek li rûçikên xemgîn, li rûyên sar peyda kir. Vê stêrka geş, stranên qedexe yên neteweyekê dixwend. Lewma jî ez bi hêsanî vî navî lê dikim û dibêjim, ew “hunermenda stran û nasnameya qedexe”, angê keça kurd Eyşe Şan e.

Xwendina stranên neteweyekê ku navê wê qedexe bû, çanda wê qedexe bû, hebûna wê qedexe bû layiqî pesinandina herî mezin û şanaziya herî bilind e. Eger xwediyê wê hewldanê jinek be û barê dengbêjiya kurdî dabe ser milê xwe; eger dengbêja yekem a bakurê Kurdistanê be, rûmet û hêjayiya



wê jî ew qas bilind û giran e. Em bûne şahid û pê dizanin ku jinên Kurd di demên şer de, di şînan de lorandine û destan afirandine. Mora jinên kurd li ser piraniya kilam û stranên evînî, şînî, lorî, stranên xebatê û hwd heye, lê ev mor ji şanoyan dûr e, bê tembûr û bê sentûr e. Taybetmendiya Eyşe Şanê jî di vê sirê de ye. Eyşe Şan him stranên xwe bi zarê xwe yê şîrîn xwend him jî di hunermendiyê de ji bo nasnameya jinan bû awazek. Bêguman di serdema Eyşe Şanê de dengbêj û stranbêjên mîr jî hebûn û bi kurdî dixwendin, lê dengê wan ne xwedî balkêşiyekê bû. Li ser dikên şanoyan û di civateke mîrane de, derketina jineke wêrekî û lehengiyekê bi serê xwe bû. Wek ku mirov singa xwe bide ber topan û paxavê bi kuştinê neke. Wek ku mirov biqîre û bêje, “şêr şêr e, çi jin e çi mîr e”.

Di civata kurd de jin digel saz û tembûran stran nexwendine. Ango tradisyoneke wiha peyda nebûye (heta salên 1970 – 80’yî) û stranbêjî ji bo jinan tabûyeke xwezayî bûye. Çend nimûneyên heyî, wek Meyremxan, Zadinê Şakir, Xana Zezê, Nesrîn Şîrwan yekta ne û ji xeynî Meyremxanê, stranbêjên ku hatine binavkirin kurdên êzîdî ne. Ev tê wê maneyê ku Eyşe Şan di muzîkê de ji bo jinan deriyek şikandiye û vekiriye. Tabû hilweşandine, bûye sembola hunermendî ya jinên kurd. Balkêş e ku di demeke kurt de, civata kurd Eyşe Şan qebûl kiriye, jê hez kiriye. Sedemê vê hezkirinê, xweşbînî û pejirandinê çi ye gelo? Bersiva vê pirsê li dora du peyvên digere: **zimanê kurdî...**

Qet ji bîra min naçe, di dawiya salên şêstî de dengê Eyşe Şanê hat bihîstin. Ev deng di demek kurt de, ba û bahozek rakir û li seranserê Kurdistanê navê wê vîzand. Di wan salan de rojekê xeberek wek qumbele li bajarê me teqiya. Di navbera jinên ser kaniyan, zilamên qehwexaneyan û zarokên kolanan de mijarek ketibû ser zar û zimanan. Eyşe Şan û konsera wê!.. Bal û meraq gelek mezin bû. Gel bi çar çavan li benda wê rojê bû. Kesên ku di jiyana xwe de qet hay ji averûya 'konser' tune bûn jî, ketibûn ber bayê dengê Eyşe Şanê. Di vê atmosferê de, bi temenê xwe yê biçûk ez jî ketibûm ber wî bayî. Bi vê bandorê, min ji qehwegerê cîranê me pirsî: *"Apo, Eyşe Şan kî ye? Çima her kes qala wê dike?"* Qehweger bi şêweyê şanaz got: *"Eyşe Şan, dengbêjeke bi nav û deng e. Bi kurmancî kilaman dibêje. Dengê wê gelek xweş e û bi ser de jî jin e. Loma xelk jê hez dike û behsa wê dike"*.

Ew roja ku gel bi çar çavan li bendê bû, hat. Konser wê li sînemayeke havîne çêbibûya. Sînema bi dirêjî çargoşe bû. Ji sê alîyan ve bi dîwarên xaniyan rapêçayî bû û li aliyekî jî bi pîrîketan dîwarek bilind î emanetî hatibû lêkirin. Li ser vî dîwarê bilind perda sînemayê û li pêşberî wê jî dîkek ji bo konser û şanogeriye hatibû bicihkirin. Ew sînemaya xirbe, tu car ew qas temaşevanan nedibû. Ber derê wê bûbû wek mahşerê. Xelk ji bo bidestxistina bilêtekê ketibû lecê, pêl bi pêl bi ser hev de dihatin ecîqandin. Bi temenê xwe yê zarotî ez jî ketibûm nav wê lecê. Min bi çî kul û halî xwe gihand pêşberî bilêtfiroş. Pereyên bilête yên ku min bi rojan, ji xerca xwe civandibû ser hev dirêjî bilêtfiroş kir. Bilêtfiroş bi çavênîyeke bi tinaz li bejn û bala min nihêrt û bi ken got: Xwe bide aliyekî! Pereyê xwe bike cêba xwe û berê xwe bide malê!.. Ez gelek aciz bûm û min bi sîtemkarî pirsî: Çima bilête didî herkesî û nadî min? Ma pereyê min ne pere ye? Hêrs û bişirîna bilêtfiroş li hev qelibîbû. Bi wî rûyê hêrsbişirî û balkêşî got: Xwarzê min, îşev ji bo zilaman e ne ji bo zarokan. Kengê emrê te bû hejdeh, tu jî karî werî konseran û li nav zilaman rûnêyî. Her wiha ji bo çûna min bala min kişand û zilamên dorê jî bi milên min girtin ji wê derê dûr xistin. Wê kêliyê daxwazek wiha di dilê min de derbas bû, xwezî ez hejdeh salî bûma!.. Lê divê ez pênc salên din jî rawestiyama da ku bihatima konserekê. Min ji bo neçûnê hinek di ber xwe da lê feyde nekir. Te digot qey satilek

ava qerisandî bi serê min de rêtine û bi şanaziya min leyîstine. Bi hêrs ji wê derê dûr ketim. Te kêr li min xista dilopek xwîn ji min nediherikî. Bi gef û gurr û qirçeqirçe diranan, girîn ji min kêr bû. Wê hingê çend hevalên min, dora min zêft kirin û pîrsa bilête kirin. Gotin bi zarê min neket û min bersiva wan neda. Hest û daxwaziya ketina hundir li hemû ezayê laşê min aliyabû. Diviyabû min û hevalan rêyek bidîta û biketina hundir. Piştî bîstekê, hevalekî min devê xwe kir guhê min û plana xwe ya şeytanî got. Plan ketibû serê min. Bi wê hêviyê rûyê min kenîya.

Konserê dest pê kir û di navê de niv saet derbas bû. Derûdor kerr bûbû û tariya şevê banga çespandina plana me dikir. Ez û hevalên xwe hatin bin dîwarê xirbe û pê ve hilkişîyan. Em êdî li hundir bûn lê şahiya ketina hundir û tîrsa ji sînemayê avêtin li nav hev qelibîbûn. Ji ber vê yekê me xwe li qunceki telandibû da ku karkerê sînemayê me nebînin. Du sê temaşevan hay ji ketina me ya hundir çêbûn lê dengê xwe nekirin û çav li me girtin. Dema ku em ketin hundir, muzîkeke oriyental lê diket û li ser dikê dansozek direqisî. Ji bilî çend serxweşan kesî ku biqîrîya tune bû. Piraniya temaşevanan li benda Eyşe Şanê bûn...

Dema ku navê Eyşe Şan û derketina wê ya ser dikê hat bangkirin, bi dengê çepik, fîkîn û qîreqîrê zelzeleyek çêbû, dê weledê xwe davêt. Ev hêwirze ne tenê di nav temaşevanan de, her wisa di nav jin, zarok û xelkên li ser xaniyên dora sînemayê jî wek qumbele teqiya. Pêşiyê li ser dikê meqamek dilsotî hat pêşkêşkirin û bi kilama **"Qederê"** keça kurd Eyşe Şan derket ser dikê. Tê gotin ku ev kilam ji aliyê Eyşe Şanê ve hatiye çêkirin û li ser xwe gotiye.

Eyşe Şan bedeweke xas î Diyarbekirî bû. Serû sincê wê yê gilover, bejna wê ya bilind, lihevhatî û dagirtî, şana li ser hinaroka rûyê wê qet ji bîra min naçe. Di destpêkê de di hişê min de wisa rûniştibû ku xelk ji bo temaşekirina bedewî û dengê wê yê xweş hatibû konserê. Lê piştî têgihîştin ku xelk ne ji bo bejn û bala wê, bedewiya wê yan jî temaşekirina jineke tazî hatibû. Keramet di stranên wê yên kurdî de bû, sêr û sir di zimanê kurdî de bû. Tevî ku xelkê wê hingê ji siyasetê fam jî nedikir, bi baldarî û rûmeteke mezin guhdariya Eyşe Şanê dikir.

Stranên ku Eyşe Şanê dixwend, xwedî taybetmendiyêke siyasî nîn bûn û ez di wê baweriyê de me ku wê bi xwe jî, bi armanca meseleke siyasî nedixwend. Stranên folklorî û klasîkên kevneşopî yên dengbêjan dixwend. Bêguman mebesta min ne ew e ku bi vê yekê hunermendiya Eyşe Şanê biçûk bixînim. Bervajiyê wê, stran û kilamên wê yên folklorî rola xwe baş dileyîstin û bêhemdê xwe be jî hestên kurdîtiyê yên tevizandî û bêdeng şiyar dibûn. Qet şik tune ye ku Eyşe Şanê, bi zanebûn strandina bi zimanê kurdî hîlbijartibû û ji bo wê têkoşiyabû.

Stêrkek bêkes û jibîrkirî

Bi hukmê eskerî yê 12'ê Adara 1971'an, şiyarî û vejîna gel careke din, ji bo demeke kurt be jî, hat birîn. Jibîrkirina Eyşe Şanê jî, wê demê dest pê kir. Di nîveka salên heftêyî de, bi bandora atmosfera siyasî, di muzîka kurdî de stîl û şeweyêke nû dest pê kir. Êdî di muzîkê de tiştên balkêş diruşmên siyasî bûn, bangên şoreşgerî û hestên neteweyî bûn. Êdî hunerê meyla xwe dabû ser gotinên stranan.

Her yek ji wan stran û kilamên bav û kalan wêneyê bûyerekê, şeweya jiyanekê, bermahiya çandekê, serboriya evîneke rasteqîn bûn. Heta salên heftêyî kêrînsan qîmeta wan gewheran têdigihîşt. Di atmosfera siyasî û îdeolojîk a salên heftêyî de, wek ku min got, muzîkek nû hatibû afirandin û mebest ji stranan mesajên siyasî bûn. Lê ew muzîk, muzîkên demî bûn û buhayekî wan ê hunermendiyê tune bû. Di bin vê bandorê de, hunermend û dengbêjên wek Eyşe Şanê bi tena serê xwe û bêxwedî man.

Di şîna wê û verêkirina wê de bi hezaran kurd beşdar nebûn. Ji bo wê panel, program, şevên bîranînê, xeber, nivîsar û hwd nehatin nivîsandin û çêkirin. Mixabin ku piştî mirina wê em vediciniqîn û bi derneqî be jî dest davên pênivîsê û dinivîsin. Mirina Eyşe Şanê deynekî mezin di stûyê me de hişt. Em deyndarê wê ne û bi derengî be jî, divê em ji binê wî deynî derên û wîjdanên xwe rihet bikin.

Hewldaneke dawîn

Di destpêka salên nodî de, wek ku ji gelê xwe xatiran bixwaze, gotin û awazên xwe yên dawîn di kasetekê de xwend û ji nav me çû. Xuya ye ku îro jî, piraniya me hay ji wê kasetê nîn in û helbestên kurdîtiyê yên Eyşe Şanê nizanin. Wek mînak, "Werin werin pêşmerge ne", "Şivano" û hinekên din. Eyşe Şan li dû xwe nêzî dused stran û kilam hişt. Layiqî pesinandinê ye ku Enstîtuya Kelepûra Kurd a li Duhokê, hemû berhemên Eyşe Şanê di



12 CD'yan de çap kirine û li ser jiyana wê nivîsîne.

EYŞE ŞAN (1938 – 18.12.1996)

Eyşe Şan di 1938'an de li bajarê Diyarbekirê hatiye dinê. Li taxa Erebaşê û Erbedaşê mezin bûye. Navê bavê wê Osman, diya wê jî Elîfe. Bavê wê ji eşîra cibriyan e û bi eslê xwe ji Bingolê ye. Diya wê ji malbata Hecî Mistefa Begê Erzuromî ye. Li gor agahiyên esehî, bavê Eyşe Şanê dengbêjekî navdar bûye. Gelek caran li mala wan diwanên dengbêjan hatine gerandin. Bavê Eyşe Şanê mirovekî oldar bûye û ew daye ber xwendina Quranê. Di serdema xwendina Quranê de, bi xwendina mewlûdê xweşbûna dengê wê tê kifşkirin û nav û dengê wê belav dibe. Ew di vê serdemê de dixwaze ku dengê wê li ser sêlikan bête tomarkirin. Piştî ku nav û dengê wê belav dibe, malbata wê bar dike û diçe Dêrikê. Li ser daxwaziya bavê wê, ew bi xortekî Dêrikî re dizewice. Lê nav û dengê wê nerihetiyê dide malbata lawikê û bi ser de jî malbat ne razî ye ku yeke xerîb bikeve nav mala wan. Zorê didin mêrê wê da ku ew ji malbatê bi yekê re bizewice. Di encamê de hêwî tê serê. Eyşe Şan bi vê yekê razî nabe û ji mêrê xwe vediqete. Dema jê vediqete keçikek wan jî hebûye. Lê mixabin ku bavê wê riya mala xwe jê re digire û Eyşe Şan ji neçarî berê xwe dide Diyarbekirê. Li vê derê heta demekê jiyanekê belengazî didomîne û piştî ji neçarî berê xwe dide Entabê.

Li Entabê ji bo debara xwe suxre û paqîjiya malan dike. Piştî demekê, bi alîkariya Naîl Baysu li radyoya Entabê dest bi stranbêjiyê dike. Du salan li vê radyoyê stranên tirkî dixwîne û di vê navberê de li gazînoyan distrê.

Stranbêjiya tirkî ne bi dilê wê ye û ew ne bi dilekî lê bi heft dilan dixwaze bi kurdî bistrê. Lewma jî berê xwe dide Stenbolê. Li vê derê bi alîkariya cihûyekî bi navê Albert Mîşel, di sala 1968'an de stranên kurdî û tirkî tomar dike. Piraniya stranên wê serboriyên wê bixwe ne. Wek mînak, "Yar Qederê", "Derdê Hêwiyê", "Were Bêmal" û hwd. Her wiha bi vê sêlikê dengê wê li seranserî welat belav dibe û digihîje mexseda dilê xwe. Bi vî nav û dengî, bi gelek hunermendên kurd

û tirk ên navdar re dertê konseran. Lê mixabin şirketên ku sêlikên wê tomar dikin û konseran li dar dixin pereyên wê nadin û wê diêşînin. Bi ser de jî dewleta tirk ji ber stranên kurdî zextên giran dide ser û di 1972'yan de wê mecbûrî çûndina Almanyayê dike. Li bajarê Munîhê bi cih dibe û sê salan li wê derê dimîne. Li Almanyayê 6 albumên wê derdiçin. Keça wê ya bi navê Şehnaz dimire û bi wê keserê cardin berê xwe dide Tirkîyeyê û demeke dirêj ji muzîkê dûr dimîne.

Di sala 1978'an de bi alîkariya hin dostan diçe Bexdayê û di radyoya Bexdayê, beşa kurdî de stranan dibêje. Her di wê serdemê de di televîzyona Kerkûkê de jî kilam û stranan tomar dike. Dema ku Başûrê Kurdistanê, li Bexdayê û Kerkûkê kar dike bi gelek stranbêjên navdar ên kurd re tîkiliyên wê çêdibin. Bi hunermendên wek M. Arîfê Cizrawî, Îsa Berwarî, Tehsîn Taha, Gulbihar re stranan dibêje û gelek kurdên navdar dinase. Bêguman li Iraqê jî debar nabe û rejîma Seddam rê nade wê ku ew li Başûr bi cih bibe. Cardin vedigere welat lê tehdîda dewletê wê neçar dike ku here Îzmîrê. Li Îzmîrê bi alîkariya hunerdostekî kurd, li postexaneyê dest bi kar dike û ji tîkiliyan dûr, dikeve nav bédengiyekê. Di sala 1991'an de, him ji ber koçberiya kurdan him jî koçberiya karesata Helepçeyê albumeke bi navê "Werîn werîn pêşmerge ne" derdixe.

Jiyana Eyşe Şanê bi êş û rencan, bi keser û hesretan derbas dibe û di 18'ê Kanûna 1996'an de bi nexweşîna pençeşêrê, li Îzmîrê diçe ser dîlovaniya xwe. Li wê derê tê gorkirin. Bêguman wesiya wê ew bûye ku li Kurdistanê, li welatê bav û kalan bê veşartin. Hin hunerdost û kurdên xêrxwaz hewl didin ku gora wê biguhêzin û wê bînin li Diyarbekirê ji nû ve veşêrin lê ji ber nexwestina malbata wê ev yek pêk nayê.

Evdilkerîmê Şemo di sala 1947'an de li bajarê Amedê nehiya Mermerê li gundê Bindanê hatiye dinê. Dibistan nexwendîye. Bavê wî ji navçeya Licê ji gundê Celikê hatiye

Dengbêjek û Stranek:

Evdilkerîmê Şemo^(*)

Amadekar: Hîlmî AKYOL

Bindanê. Kurmanc in. 15 salan li Bindanê dimînin. Ji Bindanê diçin gundê Şêxelîlka du sê salan li Şêxelîlka dimînin. Diçin gundê Tembela. Di sala 1967'an de di bîst saliya xwe de li Tembela dizewice. Li Tembela karê kirîn û firotina pez û dewaran dike. Bazirganiyeke piçûk dike. Piştî çend salan di sala 1978'an de mala xwe dibe bajarê Amedê. Li Amedê dîsa diçe bazara heywanan. Paşê dikeve karekî dewletê, malnişîn dibe. 2 keç û 6 kurên wî hene.

BINDAN

Bindan bi nehiya Mermerê ya bajarê Amedê ve girêdayî ye. Li aliyê rastê yê papûra Amed û Licê dikeve. Gund 65km dûrî Amedê ye. 15/ 16km dûrî papûrê ye. Erdê gund 12 hezar elb e. Gund ê malbatekê ye. Gundî bi nîvekarî erd diajon. Di gund de nêzî 60 malbatî hene. Gundî cotkariyê dikin. Pez û dewaran xwedî dikin. Gundê deştê ye. Riya gund di nehiya Mermerê re ji papûrê vediqete. Elektrîka gund heye. Ava gund heye. Baxçeyên gundiyan hene. Riya gund sêlak û xîçik e. Mizgefta gund heye. Dibistan heye. Dan û standina gundiyan bi Amedê re ye. Sibehê diçin bajêr êvarê vedigerin gund. Keyatî li gund e. Li aliyê rojhilatê gund, gundê Mîraxura heye, li aliyê rojavayê gund, gundê Mermerê heye, li aliyê başûrê gund, gundê Bindana jêr (Xirabe) heye, li aliyê bakurê gund, gundê Şêxelîlka heye.



^(*) Ev hevdiştin rûbirû bi dengbêj re hatiye çêkirin. Ev agahî ji devê dengbêj hatine nivîsandin.

DELÎL YADÊ

Dere delîl yadê delîl yadê delîl yadê lê delîl yadê
Delîl yadê delîl yadê delîl yadê lê delîl yadê
Mi xanimê, mi xatûnê mi feqîrê lê bêmîradê,
Bawerîya we çêbibe heta dilê xesiyê zava negre lo lo qîzê nadê,


Dere delîl yadê delîl yadê delîl yadê lê delîl yadê
Keçkê digo lolo lawkê delal ku tu çûyî binê xetê tu were lo mi bibîne,
Kuro tu çûyî binê xetê tu were lo mi bibîne,
Tu yê ji mi ra hebki kirasê meles, cotkî guwar hebki bazin lo ji'm ra bîne
Wele wez ê li xu kim herim serê dilan û daweta,
Xelqê bêje keçê lêlê weviya çi ye, gidî wele wez ê bêjim haya we ji bavê felekê lo qe tunîn e,
Lawikê min ê malê hatiye misafirê me ye, belê wele şîraniya mi xwar, nîşanîka lo mi datîne,
Delîl yadê delîl yadê delîl yadê lê delîl yadê

Dere delîl yadê delîl yadê delîl yadê lê delîl yadê
Delîl yadê delîl yadê delîl yadê lê delîl yadê
Mi xanimê, mi xatûnê mi feqîrê lê bêmîradê,
Yeqîniya we çêbibe heta dilê xesiyê zava negre lo lo qîzê nadê,

Keçkê digo lolo lawkê delal wele wez ê çûbûm Bedena Diyarbekir lo lo bi kevirê birî
Wez ê çûbûm Bedena Diyarbekir lo lo bi kevirê birî
Gidî wele min ê bala xwe didanê tava sibê hate siya êvarê lo lê dihêwirî,
Lolo malneketo wele cota memikê mi bîna sêvê Xelatê di şûna xu da lo hoyê dikemilî
Malneketo mew û nîv payiz here de wele bîna tiriyê Mezrûmî ax bi mêwê va lo dixemilî,
Malneketo te çawa terka çavê reş û belek kirî,
Tu yê ketî nava êlê koçera te berê xu dabû welatê jorîn, kuro ma ti li qayîşa lo reş hasilî,
Delîl yadê delîl yadê delîl yadê lê delîl yadê ax.




Arjen ARÎ, "Çil Çarîn" Kurdî (Alfabe Latînî-Erebî) -Helbest, 80 Rûpel,
Weş: Enstîtuya Kurdî ya Amedê



Komîsyon, "Hînger"
Kurdî -Hîndekarî, 112 Rûpel,
Weş: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê



Mikaîl BILBIL-Bahoz BARAN, "Rêzimana Kurmancî" Kurdî -Rêziman, 128 Rûpel,
Weş: Enstîtuya Kurdî ya Amedê



Omer DILSOZ "Neynika Dilî"
Kurdî -Helbest, 240 Rûpel,
Weş: Aram




Sempozyûma Ehmedê Xanî ya Navneteweyî
Kurdî/Tirkî -Sempozyûm, 416 Rûpel,
Weş: Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê



Aram GERNAS "Baxçeyê Zarokan"
Kurdî -Muzîk, 128 Rûpel,
Weş: Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê



M. Emin YALÇINKAYA
"Mala Dînan - Mala Extiyaran"
Kurdî - Şano, 128 Rûpel,
Weş: Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê



Zubeyde KIRMIZI "Amid-i Nur"
Tirkî -Biyografi, 240 Rûpel,
Weş: Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê

Sêv jî Me Dikujin
Mizgîn Ronak



MIZGÎN RONAĞ, "Sêv jî Me Dikujin"
Kurdî-Helbest, 112 Rûpel, Weş: LÎS

Şev û Deng
Jan Dêran



JAN DÊRAN, "Şev û Deng"
Kurdî-Helbest, 80 Rûpel, Weş: LÎS

Sî Bi Rojê Xweşik e
Welat Dilken



WELAT DILKEN, "Sî Bi Rojê Xweşik e"
Kurdî-Helbest, 64 Rûpel, Weş: LÎS



ŞEYHMUS DÎKEN, "Zewalsiz Ömrün
Sürgünü Mehmed Uzun"
Tirkî-Portre, 570 Rûpel, Weş: LÎS

